NRLS

# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN Hejmara (17) - Havîn – 2025



- BER BI ASOYEKE CÎHANÎ JI BO RAMANÊN OCALANÎ VE
- REHENDA STRATÎCÎ YA ZANÎNEGEHAN LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYAYÊ
- PERGALA DEWLETA NETEWEYÎ YA "TUNDREW" LI SÛRIYAYÊ
- EZMÛNÊN NÛJEN ÊN CÎHANÎ YÊN JI BO TÊKOŞÎNA LI DIJÎ DIYARDEYA QRIÊJÎYÊ Û ASTA GENGAZÎYA PÊKANÎNA WÊ DI WARÊ XWECIHÎ DE

Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

nrls.rojava
nrls_rojava
nrlsrojava
nrlsrojava
www.nrls.net
nrls@nrlsrojava.com
00963993822054

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (17) - Havîn – 2025**

## NAVEROK

**GOTINA HEJMARÊ........................................................................ 4**

**BER BI ASOYEKE CÎHANÎ JI BO RAMANÊN OCALANÎ VE ........................... 5**

Ehmed Pîrhat

**REHENDA STRATÎCÎ YA ZANÎNEGEHAN LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYAYÊ31**

D. Eşref Rifet Mehmûd

**PERGALA DEWLETA NETEWEYÎ YA "TUNDREW" LI SÛRIYAYÊ ................ 53**

Dilşad Murad

**EZMÛNÊN NÛJEN ÊN CÎHANÎ YÊN JI BO TÊKOŞÎNA LI DIJÎ DIYARDEYA QRIÊJÎYÊ Û ASTA GENGAZÎYA PÊKANÎNA WÊ DI WARÊ XWECIHÎ DE ....... 67**

Amadekarî: Endezyara çandinîyê Îman Xelîl

# GOTINA HEJMARÊ

## Xwendevanên hêja:

Bi guherînên sereke yên xwecehî, herêmî û cîhanî de, êdî amûrên xebat û tekoşînê ji bo pêkanîna armancên xwe, divê ew jî werin guhertin, bi derbasbûne cîhanê ber bi şerê sêyem de û pê re guherîna rewşa kurdî ji tekoşîna hebûn û tunebûne ber bi hêzeke cîhanê ku qonaxa nû bê wê nayê hizrandin, êdî birêz Ebdela Ocelan pêşxerîya aştîyê li Tirkîyayê ragihan, êdî zemîna derketina vê pêşxerîyê, bandora wê, lîstikvan pêkanînê, encamên wê û berdeka gel, partî û cîhanî li wê, kêkolîna ″**Ber Bi Asoyeke Cîhanî Ji Bo Ramanên Ocalanî Ve**″ van xalan zelal dike.

Dahurandina rola zanîngehan di avakirina şiyan û karînên xwecihî û pêkanîna aramîya siyasî û civakî de, Rewşa heyî û astengîyên ku zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî wan tên, dahurandina rewşa fêrkirinê li bakur û rojhilatê sûrîyê, hevsengîya rewşa heyî bi felsefeya neteweya demokratîk re, stratîcîyên pêşinyarkirî ji bo xurtkirina rola stratîcî a zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, hevkarîyên akademî ên xwecihî û navneteweyî û ncam û qewîtîyên vê lêkolînê, ev xal di beşa duyem a lêkolîna ″ **Rehenda Stratîcî Ya Zanînegehan Li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê**″ de têne şirovekirin.

Jixwe pêşxerîya birêz Ocelan bêtir çareserîya ″Civaka Demokratî″ wek berdêleke ji ″netewe-dewletê″ re ku ev şêwe hate xitimandin û ji bilî qirkirin, bobelat  û şer neafiran, êdî di lêkolîna ″ **Lêkolîneke Sereta Der Barê Pergala Dewleta Neteweyî Ya Tundrew Li Sûriyayê Binkeftin û Berdêleke Demokrat″** de, vê pêşxerîyê li ser asta Sûrîyayê gotûbêj dike.

Di dawîyê de jî, lêkolîna ″**Ezmûnên Nûjen Ên Cîhanî Yên Ji Bo Têkoşîna Li Dijî Diyardeya Qriêjîyê Û Asta Gengazîya Pêkanîna Wê Di Warê Xwecihî De″,** mijarên wek dahurandina berztirîn ezmûnên cîhanî yên nûjen ên ji bo rêgirtina li ber qirêjîya jîngehî, lêkolînkirina rewşa jîngehî ya heyî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û desnîşankirina cûre û sedemên qirêjîyên berbelav, nirxandina asta guncavbûna ezmûnên cîhanî ji bo pêkanîna wan di çarçoveyeke xwecihî de, pêşkêşkirina qewîtîyin zanistî yên dikarin werin pêk werin; ku xwe dispêrin ezmûnên hevrûkirî û bi armanca xurtkirina domdarîya jîngehî li herêmê, lêkolîn dike.

**Sernivîser**

# BER BI ASOYEKE CÎHANÎ JI BO RAMANÊN OCALANÎ VE

**Ehmed Pîrhat**

## Xwendineke dahurîner – pêşbînîker ji daxuyanîya Partîya Karkerên Kurdistanê re û çarçoveyên piştî têkoşîna çekdarî

**Pêşgotineke dahurîner:**

Kongreya duwazdehem a Partîya Karkerên Kurdistanê, di dîroka tevgera kurdî ya hemdem de qonaxeke movikî ye. An ku; ne tenê civîneke asayî ya rêxistinî bû, lê belê wiha derket holê ku veguherîna kokî ya di stratejîya yek ji berztirîn tevgerên şoreşgerî yên li Rojhilata Navîn de, ragihîne.

Di çarçoveya daxuyanîya partîyê de ya ku tê de biryara bidawîkirina têkoşîna çekdarî dide, her wiha hevdemî daxuyanîya Ebdullah Ocalan a di 27ê sibata 2025an de, bi zelalî diyar dibe ku tişta rûdide, ne tenê veguherîneke tektîkî ya demkî ye; lê belê jinûvedanîneke stratejîk e; ku ravedana serxwextbûneke ramanî û siyasî û qonaxeke felsefî ya ber bi nimûneyeke têkoşînê ya nûjen ve ku li ser bingeha aştî û nenevaendîya demokratîk û civakê ava dibe, dike.

Di vê çarçoveyê de; ev lêkolîn wiha girîngîya xwe distîne ku hewl dide vê guherînê di nava toreke bandorbûnên têkildarî hev de rave dike. An ku; di navbera ramanên Ocalanî û rasteqînîya siyasî, derbirînên sembolîk ên rêbertîyê û bertekên gelêrî û rûbirûbûyînên xwecihî, herêmî û navneteweyî yên ku xwe li ser tevgera kurdî ya di dema me ya îro de disepînin de.

Her wiha lêkolîn xwe dispêre dahurandineke kûr a ji bo sosyolojîya biryara siyasî û danîna felsefeya "Neteweya Demokrat" ku weke çarçoveyeke berdêl ji têgeha dewleta neteweyî re ye. Bi vê yekê hewl dide bersiva pisyarîyên çarenivîsî yên der barê siberoja dîtaneya Ocalanî, çarenivîsa doza kurdî û bijardeyên vejîna hevbendîyin rizgarxwazî yên herêmî û cîhanî di siberojê de, bide.

**Pirsgirêka lêkolînê:**

Gelo kongreya duwazdehem a Partîya Karkerên Kurdistanê qutbûyîneke stratejîk a bi têkoşîna çekdarî re û guherîneke pratîk a ber bi nimûneyeke rizgarxwazî ve ku ji felsefeya Neteweya Demokrat vejîn bûye, ye? Ev veguherîn di çarçoveya derbirînên sembolîk ên rêbertîyê, helwestên gelerî û çarçoveya herêmî û navneteweyî ya derdor de, çawa dikare were têgihiştin? Heyanî çi radeyê ev biryar di cih de ye û bandorîyên wê yên li ser projeya Ocalanî û herêmê hene?

**Pirsên têne kirin:**

1. Nîşaneyên ramanî û siyasî yên daxuyanîya Partîya Karkerên Kurdistanê bo bidawîkirina têkoşîna çekdarî, çi ne?
2. Ev daxuyanî çawa bi daxuyanîya Ebdullah Ocalan re ya 27ê sibata 2025an temam dibe?
3. Bertekên gelêrî yên di nava civaka kurd a hundir û derve de, ji bo vê veguherînê, çawa ne?
4. Derbirînên fermandarên partîyê di kongreyê de, ji alîyê sembolîk û derûnî ve çawa dikarin werin derbirîn?
5. Bandorên herêmî û navneteweyî yên rasterast û ne rasterast ên vê biryarê, nemaze li ser Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê, çi ne?
6. Gelo em dikarin vê veguherînê weke destpêka rêbazeke têkoşînê ya nû di nava Tevgera Azadîya Kurdistanî de bibînin?
7. Ev veguherîn çawa li ser siberoja ramanên Ocalanî û rêgeha avakirina Neteweya Demokrat, ravedide?

**Pênaseyeke hêsan ji bo hinek têgînên bingehîn ên di lêkolînê de:**

**Têkoşîna çekdarî:** Têkoşîna çekdarî wiha tê pênasekirin:

Rêbazeke têkoşînê ye ku PKKê ji sala 1984an ve daye meşandin. Ew jî; piştî ku rê li pêşîya xebata wê ya siyasî û ramanî ya bi armanca bidestxistina mafên gelê kurd û çareserkirina doza kurdî ya dadmend, hat girtin. An ku; neçar ma ku li dijî dewleta tirk tundîyê bi kar bîne û gelê xwe biparêze, her wiha ji bo ku siyaseta

mandelekirin û tunekirinê ya di mafê gelê kurd de dihat meşandin bişkîne, têkoşîna çekdarî li kêleka karê siyasî û ramanî yê partîyê da meşandin.

**Veguherîna stratejîk:** Wateya zelaltir a vê têgeha siaysî ev e:

Veguhastineke kûr a di nêrîna rêxistinî, ramanî û siyasî de ye. Carinan jî bi rêya veguherîna ji xebatên çekdarî ber bi xebatên siyasî û civakî ve weke nêrîn û stratejîya rasteqîn û şoreşger jî pêk tê.

**Neteweya Demokrat:** Têgeheke ku serokê Partîya Karkerên Kurdistanê, di paradîgmaya xwe de li pêş xistiye û xwe dispêre moderniteya demokrat, her wiha berdêla dewleta neteweyî ye. Xwe li ser pirrengî, nenavendîya demokrat, dadmendîya civakî, pîşesazîya jîngehparêz (Ekolojî) û azadîya zayendî dide avakirin. Ocalan vê Neteweyê di berga pêncem a Manîfestoya Şaristanîya Demokrat de, di rûpela 438 de wiha pênase dike: "Netewe bi hişmendî û bawerîyê tê derbirandin. Her wiha komeke mirovan e ku di nava hev de cîhaneke wan a hişmendî ya hevbeş heye. Tişta ku rengê xwe li ser Neteweya Demokrat vedide, zanîna azadîyê û hevgirtin e". (1)

**Civaka sincî-siyasî (exlaq-polîtîk):** Du peyvên ku bi hev re tên û bingeh û cewhera ramana ramanwer Ebdullah Ocalan e. Civaka sincî-siyasî yek ji hêmanên bungehîn ên moderniteya demokrat a Ebdullah Ocalan e ku di berga xwe ya sêyem de aniye zimên. Li gor wê; ew ji beriya bajarvanîyê û civakên dijberî wê ve heye, her wiha rewşeke hebûnî ya xwezaya civakî ye. Bi vê ramanê hewl dide dewleta neteweyî derbas bike; ew jî bi rêya avakirina civakeke birêxistinbûyî û sazkirina toreke nirxan ku li ser bingeha hevbeşî û wekkehvîyê ava bûye. Li gor wê Ocalan sê erkên bingehîn ji vê civakê re, wiha destnîşan dike:

"Xwezaya civakî di bingeha xwe de sazûmanîyeke sincî û siyasî ye. Madem civak bi hebûna xwe berdewam in; nexwe hebûna wê ya sincî û siyasî jî berdewam e. Civakên ku hebûna wê ya sincî û siyasî winda ye, li serê belavbûn, jihevketin û tunebûn hatine hukimkirin"

**Rêbertîya sembolîk:** Li vir behsa kadroyên partîyê yan jî tevgerê yên pêşeng dike; ku ravedana arasteyên mezin ên partîyê û guherînan dike; ku pêdivîya wê pê heye, da ku pê berdewamîyê bike. Bi vê yekê neynika xeta xwe ya siyasî û ramanî û mîrateya xwe ya dodmar datîne.

**Rewabûna têkoşerî:** Tê wateya yek ji diyarbûnên wê yên asta pejirandina rêzikan û cemawerên partîyê û civaka wê ji veguherînên ramanî û stratejîk re, ew jî li gorî dîroka wê ya têkoşînê ya demdirêj, ku li ser bingehin asê ava dibe.

**Derbasgeha lêkolînê:**

Veguherînên nû yên di rêwîtîya Partîya Karkerên Kurdistanê de, rûbereke navendî ya gotûbêjên ramanî û siyasî yên kurdî, Rojhilata Navînî û cîhanî, bi dest xistiye.

Veguhastina ji têkoşîna çekdarî ber bi têkoşîna demokratîk ve ya ku hatiye ragihandin, ne tenê xwe dispêre rehenda zanistî. Lê belê; di nava tayên xwe de wergereke nû ya nasnameya şoreşgerî, siberoja tevgera kurdistanî û ramanên Ebdullahn Ocalan bi xwe, radike.

Girêdayîna vê veguherînê bi ramanên Ocalan ve, nemaze felsefeya Neteweya Demokrat û civaka demokrat (sincî-siyasî), pêdivîya wê bi xwendineke pêkhatî heye ku danûstandina sembolîk û gelêrî, dîtaneyî û pratîkî û xwecihî, herêmî û cîhanî heye.

Ev veguherîn heyanî ku venegerin ezmûnên cîhanî yên ku di heman veguherînan re derbas bûne, nayê têghiştin; (Zabatîsa, Şîn, Fîn, Îta, Fark…) ku tundî derbas kir û ber bi projeyên siyasî yên berdêl ve çûn û cewhera xwe ya rizgarxwazî diparêze lê alavan ji nû ve saz dike. (Dê lêkolîneke min der barê vê de hebe).

**Paşxaneya dîrokî û ramanî ya veguherînê di nava Partîya Karkerên Kurdistanê de:**

Veguherîna dawîyê ya di rêwîtîya Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) de ne tenê kêlîyeke movikî di dîroka wê ya têkoşînê de ye, lê belê di rêgeha Tevgera Azadîya Kurdî û Rojhilata Navîn bi tevayî de ye.

Biryara bidawîkirina têkoşîna çekdarî ya ku di kongreya duwazdehem de, ya ku di gulana 2025an de hat lidarxistin, ne gaveke veder an jî zîvirîneke ji nişka ve bû, lê belê xelatkirina rêgeheke dirêj a lêvegerînên ramanî û siyasî ye ku ji sala 1993yan ve dest pê bûye û bi revandin û girtina Ebdullah Ocalan re ya sala 1999an kûrtir bûye û piştre dirêj bûye heyanî ku projeya Ocalanî weke felsefeyeke temambûyî ya ji bo çareserîya demokrat di her pênc bergên wî de yên di salên 2009-2010an de, derketin pêş.

Partîya Karkerên Kurdistanê di 27.11.1978an de, di demekê de ku çewisandina neteweyî li dijî gelê kurd li Tirkiyayê di lutkeyê de bû, hat damezirandin. Damezirandina wê hevdemî derketina pêla çepgira tundrew a li Rojhilata Navîn derket.

Partî ji destpêka xwe ve, têkeleke ji sosyalîzma şoreşgerî û rêya rizgarî ya neteweyî, girt dest; ku bi marksî-lênînî-mawîyê bandor bûbû. Her wiha; dît ku rizgarbûna Kurdistanê ji şoreşa sosyalîzm a li Tirkiyayê û herêmê ne veqetandî ye.

Ji sala 1984an ve partîyê têkoşîna çekdarî ragihandiye ku ew bi "Pêngava 15ê Tebaxê" da binavkirin. Bi vê yekê xwe spart şerê gerîlatî li dijî dewleta tirk, bicihbûna meydanî ya li çiyayên Kurdistanê, pêkanîna operasyonên leşkerî li Kurdistanê û tevaya Tirkiyayê û avakirina serbazgehên perwerdehîyê li herêmên Qendîlê li herêma Kurdistanê. Lê belê; salên notî yên sedsala borî bû xaleke zehmet a veguherînê. Li gor wê; fişarên navneteweyî pir bûn, partî daket lîsta terorê û pê re jî revandin û girtina rêberê partîyê Ebdullah Ocalan pêk hat. Vê yekê bi dest xwe re zehmetî û veguherîneke mezin çêkir, ku pêdivîya wê bi lêvegereke ji kokê ve der barê bangeşe û rêbaza wê de hebû.

Ji nava girtîgeha xwe ya li Îmralîyê, Ocalan dest bi dahurandina bingehên ku partî li serê ava bûye, kir. Bi vê yekê rexneyên tund li navendîya neteweyî û nimûneya dewletî ya desthilatdar girtin. Li şûna wê pêşnûmayeke berdêl anî holê ku bi projeya "Neteweya Demokrat" tê nasîn. Ev pêşnûma nêrîneke wiha ye: Li ser avakirina civakeke sincî-siyasî ava dibe; ku bi awayekî xweser bi rêya komîn û meclisan, ji derveyî hişmendîya dewleta neteweyî û dûrî hişmendîya şoreşgertîya tund a klasîk xwe bi rê ve dibe. Her wiha li şûna şerê demdirêj, rêgeza parastina rewa da pêş.

Gav bi gav; êdî qada têkoşînê nema bû çiya, lê belê bû civak bi xwe; ku ew bi xwe ya guherînê ye û armanceke wê ye jî. Bi rêya nivîsarên Ocalan, nemaze her pênc parêznameyên "Manîfestoya Şaristanîya Demokrat" êdî rexne ne tenê li ser rêjîma tirkî tên girtin, lê belê li tevaya binyada modernîteya sermayedar ku ew hilberînera zordestîyê ye û wateya civakî ya ji siyasetê re vala derdixe, dide ber rexneyan.

Li ser bingeha vê felsefeyê; partîyê dest pê kir û lêvegereke gelemper pêk anî ku rêxistinbûyîn, rêbaz û têkilîyên bi civakê re girtin nava xwe. Her wiha xwe

weke tevgereke civakî ya prrehend da avakirin; ku xwe dispêre têkoşîna siyasî - weke Ocalan wê bi "Qada Sêyem" bi nav dike- û çalakkirina jinê, her wiha xwespartina li ser binyada civakî dîrokî ya Rojhiata Navîn.

Ev lêveger bi awayekî zelaltir piştî sala 2005an teşe girtiye. An ku; gava Koma Civakên Kurdistanê (KCK) dest bi sazbûnê kir û ramanên wê di ezmûna Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhikatê Sûriyayê de sala 2014an hatin pêkanîn, êdî teşeyeke pratîk ku ravedana nêrîna Ocalan a felsefeya wî ya "Biratîya gelan û pêkvejiyana hevbeş" dike, girt dest.

Li vir; êdî çek nema bû alava tekane yan jî navendî, lê belê xwebirêxistinkirin, perwerde û avakirina sazîyên sivîl bûn alavên têkoşînê yên çalak. Ev yek di hewldanên partîyê yên li pey hev de ku ji bo rawestandina şer kirin, her wiha pêşkêşkirina destpêşxerîyên aştîyê yên di navbera salên 2008-2009, sala 2013an û sala 2015an de, diyar dibe. Her çi qasî ji ber serhişkîya dewleta tirk li bin ketin jî, lê belê dîsa jî ev yek derbasdar e.

Di vê çarçoveyê de; kongreya duwazdehem a partîyê wiha derket pêş ku bidawîkirina têkoşîna çekdarî weke bijareyeke stratejîk a navendî rave dike, ragihand. Her wiha tekez dike ku ew derbasî "Pêvajoyeke nû ya têkoşîna civakî ya demokrat" dibe. Li gor wê jî di daxuyanîyê de wiha dide diyarkirin: "Bi rêveberî û bicihanîna ji alîyê Rêber Ocalan ve, partîyê biryar daye ku binyadsazîya partîyê ya rêxistinî fesix bike û rêbaza têkoşîna çekdarî bi daweî bike. Di encamê de xebatên ku bi navê partîyê têne meşandin, têne rawestandin" (3)

Daxuyanîya ku hatiye derxistin, ne tenê weke belgenameyeke siyasî ye, lê belê weke ragihandina manîfestoyeke nû raber dike; ku ji nû ve rola partîyê, têkilîyên wê bi civakê re û têgehên dewlet û rizgarîyê pêsane dike.

## Dahurandina wateyên di daxuyanîya Partîya Karkerên Kurdistanê de:

Bê guman; di hewldana dahurandina daxuyanîya dawîyê ya kongreya duwazdehem a Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) de, tê xwestin ku xwendineke kûr û pirrenhendî were kirin, ku çarçoveyên demî û cihî, karîgerên bingehîn di mebestên wê de, paşxaneyên ramanî û siyasî û nîşaneyên bawerî û propaganayî, her wiha nirxandina wateyên daxuyanîyê li ser zemîneke

rasteqînîya siyasî ya heyî û tişta ku li cîhanê û herêmê rûdide bi hemû ziravîyên wê, di ber çavan re werin derbaskirin.

**Yek: Karîgerên dem û cihî:**

**Dem:** Kongreya duwazdehem a Partîya Karkerên Kurdistanê di navbera 5-7ê gulanê de, an ku di çarçoveyeke tevlihev a herêmî û navneteweyî de, hat lidarxistin; ku di van xalan de tê nimînendekirin:

- Berdewambûna artêşa tirkî bo operasyonên leşkerî yên li dijî hêzên Partîya Karkerên Kurdistanê li çiyayên Kurdistanê, her wiha dorpêça ku ji alîyê hêzên Partî Demokratî Kurdistan (PDK) ve li ser "Herêmên parastina rewa". Li gor wê daxuyanî wiha diyar dike:

"Kongreya me di rewşeke zehmet de hat lidarxistin. Pevçûn, êrîşên hewayî û bejahî û dorpêça li ser herêmên me hîn berdewam in. Her wiha sizayên ji alîyê Partî Demokratî Kurdistan (PDK) ve hîn berdewam in. Lê belê; bi awayekî ewle hat lidarxistin"

- Tecrîda li ser Ocalan ji salan ve, bêyî ku tu têkilîyeke rasterast pê re hebe, berdewam e (Hinek hevdîtin piştî banga Bahçelî ji cotmeha 2024an ve pê re çêbûn).
- Mezinbûna alîgirîya navneteweyî ji doza kurdî re (Bi awayekî zelal bi rêya helwest û daxuyanîyên ku piştî daxuyanîya Ocalan a 27ê sibatê hat raberkirin).
- Guherînên di wêneyê hundirîn ê tirkî de, an ku; bi pêşbînîyên ji bo jinûverêzkirina dîmenê siyasî ji hundir ve û hevdemî pêşketinên ku li herêma Rojhilata Navîn rûdidin.

**Cih:** Daxuyanî amaje pê dike ku kongre li "du cihên cihêreng di heman demê de" hatiye lidarxistin". (5)

Cih bi tekûzî nehatiye zelalkirin. Ev tê wê wateyê ku:

Pêkarên ewlekarî yên asê û di nava veşartîyeke tekûz de kongre ku li ser daxwaza rêberê wê pêk hatiye, hat lidarxistin. Ew jî ji ber bombebarana bênavber a tirkan li ser herêmên şervanan (Gerîla). Çi ku Tirkiya tevaya teknîka leşkerî ya pêşketî ji bo armancgirtina fermandar û şervanên partîyê, bi kar tîne. Ev yek ravedana asta tevdîrê ya pêşketî ku di encama serborîyeke dirêj a pevçûnê bi dewleta tirk re, dike.

**Têkildarên bingehîn di daxuyanîyê de kî ne?**

1. **Rêber Ebdullah Ocalan:** Di daxuyanîyê de, bi tevî ku ji berîya 26 salan ve hatiye girtin, wke kesayeteke karîzma û rêberekî dîrokî tê derdixe pêş. Her wiha weke tewereya navendî ya birêvebirina pêvajoyê berz dibe "Rêvebirin û bicihanîna pêvajoyê ji alîyê Rêber Ocalan ve". (6)

Her wiha weke rêberekî stratejîk û "çavdêrê qonaxa nû" tê dîtin. Ev yek xûyeke bawermendî ya sivik dide daxuyanîyê, lê belê hevgirtî ye û girêdana candar a di navbera ramanê û çavkanîyê de, diparêze. Li vir tê têgihiştin ku daxuyanî tekez dike ku dê veguhastin bi serpereştîya Rêber Ocalan, ne bi rêya navendên leşkerî yên klasîk pêk were. Ev tê wateya pabendîyeke asê ya bi perspektîfên Ocalan (Disiplîn, derbirîna pratîkî û bawerîya mezin a di navbera sazkarê partîyê û fermandasr û şervanên wê de. Êdî ev encam, weke nameyeke kûr tê dîtin).

2. **Partîya Karkerên Kurdistanê:** Weke statuyeke rêxistinî ya çekdar, piştî 47 salên xebatên têkoşerî yên befireh û pirreng, xwe fesix dike û ber bi qonaxeke nû ya têkoşîna demokratîk ve, vediguhere. Bi tevî ku hûrgilîyên vê yekê di daxuyanîyê de nehatine zelalkirin. Di daxuyanîyê de wiha hatiye diyarkirin: "Kongreyê biryar da ku binyadsazîya rêxistinî ya partîyê fesix bike û rêbaza têkoşîna çekdarî bi dawî bike". (7)

3. **Gelê kurd:** Berpirsiyarîya rahiştina ala pêvajoya bê ya piştî xwefesixkirina partîyê, bi xwerêxistinkirina çalak û avakirina civaka demokrat weke bicihanîneke pratîkî ya manîfestoya "Aştî û civaka demokrat" ku di 27ê sibata 2025an de hat xwendin, dide dest wî: "Têkoşîna partîyê siyasetên mandelekirin û qirkirinê yên li dijî gelê me têk birin û doza kurdî gihand xala çareserîya bi rêya siyaseta demokrat. Bi vê yekê partîyê erka xwe ya dîrokî bi cih anî". (8)

Li gor daxuyanîyê; êdî gel nema wergirê perspektîfan e, lê belê xwedîyê ramanê ye û jê tê xwestin ku şiyanên xwe yên di qadên çand, ziman, rêxistina aborî, parastin û siyasetê de çalak bike.

4. **Jin û ciwan û rehenda parastinê:** Xwînerê pirtûkên Ebdullah Ocalan û yên ku di nava raman û paradîgmaya wî de kûr bûne, dizanin ku ew bi awayekî bingehîn xwe dispêrin şiyanên temirandî û xwebûyînên çalak ên jin û ciwanan. Her wiha boçûnên wan, di nava nêrîneke rizgarî ya civakî ku weke motika

cewherî ya siberoja projeya ji alîyê Ocalan ve pêşniyarkirî, tê dîtin, dê di qonaxa nû de xwedî roleke tewereyî bin. Di daxuyanîyê de wiha hatiye: "Divê gelê me, bi pêşengtîya jin û ciwanan, rêxistinên xwe di hemû biwarên jiyanê de ava bike û li ser bingeha xwebesîya bi ziman, nasname û çanda xwe bi rêxistin bike. Her wiha divê bikare li dijî hemû êrîşan xwe biparêze û bi rihê seferberîyê civaka demokrat a komînal ava bike". (9)

**5. Partîyên siyasî yên kurdî û tirkî, tevgerên çepgir û alîyên navneteweyî:** Daxuyanî bang li partîyên siyasî yên kurdî û tirkî, tevgerên çepgir û alîyên navnetweyî dike ku berpirsiyarîyên xwe der barê pêvajoya aştîyê de, ragirin. Li gor wê di daxuyanî de wiha diyar dike: "Bi vê bingehê; em bawer in ku dê partîyên siyasî yên kurdî, rêxistinên demokratîxwaz û xwedîyên derbirînê, dê berpirsiyarîyên xwe yên ji bo pêşxistina demokrasîya kurdî û pêkanîna Neteweya Demokrat a kurdî, bi cih bînin". (10)

Ev hemû xalên ku hatin zimên tekez dikin ku erkeke mezin di qonaxa bê de heye ku di hemû alîyan de tê xwestin. Ew jî bi rêya avakirina enî û çarçoveyên ramanî, siyasî û civakî û xebitîna bi hev re di qonaxa bê de, an ku bi rihê armancan û berjewendîyên civakî yên hevbeş ku daxuyanî doza wan dike.

**Rêgezên Bîrdozî yên Daxuyanîyê:**

Daxuyanî vegoherîneke cewherî ji nerîna bîrdozî û ramyarî ya partîyê diteyisîne, ew jî ji Hevbşîtîya (Sozyalîzm) Rastbînî (pêkhatî) ber bi Hevbeşîtîya Civaka Demokratî ya ku cewherê dîtaneya Nûjenîya Demokrat dinimîne, jixwe ew jî Nûjenîya Neteweya Demokrat a ku Ocelan di bergeya xwe ya pêncan de diyar kiriye, dinimîne, ew jî bi tekezîya li ser ku Hevbeşîya Rastbînî (bi şêweya partîtîya navendî û bawerîyeke şoreşger a kilasîkî ya ku dihewîne); li Yekîtîya Sovêtê xwe kuşt, wek ku rêberê şoreşa Kûbî di dema hilweşîna Yekîtîya Sovêtê anî zimên ku ew nema bi kêr tê û li gelek welatan pêkanîna wê têk çû, êdî daxuyanîyê wilo got:

"Partî di despêka damezrandina xwe de, bi Hevbeşîtîya Rastbînî, bandor bû ku rêgeza mafê gelan a diyarkirina çarenûsa xwe bijart û xebateke rewa û dadwer li ser stratîcîya xebata çekdarî, pêk anî, jixwe partî di reşên pilanên qirkirin, komkujî û qirkirina çandî hat damezrandin"."**11**"

Êdî li beramberî vê xebata kurdan û PKK, dewleta Tirk ev bersiv dan: Valakirin û şewtandina hezarên gundan, kuştina hezaran bi rêbaza kujerê nenas, girtin û derbiderkirina milyonên kurdan û bi dehhezaran hatin işkincekirin û avêtin zindanan.

Partî gihaşte wê bawerîyê ku pêwîst e wek pêdivîyeke dîrokî û rastîyeke nakok, li gor qonaxê pêşve biçe ku berdêl jî Nimûneya"Civaka Demokratî, Jîngehî û ji zayenperestîyê azad e". **(12)**

**Li Dewleta Netyeweperest Rexnekirin:**

Di daxuyanîyê de tê diyarkirin ku koka arîşe û pirsgirêkan ji navendîya neteweyî tên ku ji peymana Lozanê û destûra 1924 çêbû, êdî divê bi avakirina Civaka Demkratî were derbaskirin, jixwe daxuyanîyê wilo got:

"Rêber Ocelan, xwe spart dema berî peymana Lozanê û destûra 1924 ên ku bûn sedema pirsgirêka têkilîyên Kurdî-Tirkî ku bawerîya welatê hevbeş bijart"**.(13)**

**Neteweya Demokratî:**

Daxuyanîyê "Neteweya Demokratî" wek berdêleke bîrdozî ji rikberîyên nasname û dewleta navendî re pêşkêş dike, ew jî bi rêya çarçûveyeke cikbûyîneke bevbeş (jixwe ev dîtane bêtirî bîst salan hat pêşkêşkirin), jixwe daxuyanîyê amaje kir ku:

"Gelên me yên jar û kedkar, hemû tîreyên olî, jin û ciwan, karker û çotkar û hemû beşên ku ji hêla desthilatê ve hatine dûrxistin, dê mafên xwe bi pêngava aştîyê û avakirina Civaka Demokratî de biparêzin, her wiha dê jiyaneke hevbeş di jîngeheke demokratî û dadmend de; pêş ve bixin". **(14)**

**Rêgezên Ramyarî yên Daxuyanîyê:**

**Jevketina Partîyê:**

Biryara jevketina avanîya rêxistinî ya PKK, du xalan diteyîsîne:

1- Ragihandina bidawîkirina qonaxa "şerê demdirj" wek stratîcî û hiştina rêgez û rehenda Parastina Rewa.

2- Hewildaneke wêrek e ji partîyê ku di qada Tirkî-Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê de, wek bandorkereke ramyarî, civakî û neleşkerî; xwe ji nû ve bi cih bike, ew jî tevî xwebicihkirina li gor taybetîya gerdûnî ya Xweparastin û Parastina Rewa.

Êdî daxuyanî ji veguherîna ber bi xebata ramyarî ya demokratî, nîşaneyeke pir giring e, ev jî têgihiştineke nû ya partîyê diteyîsîne ku şer nema dikare çareserîyê bîne, êdî dem hat ku ramyarî di warê Civaka Demokratî de were avakirin û ji nû ve têkilîyên kurdî-Tirkî werin sazkirin.

Di daxuyanîyê de tê pêşniyarkirin ku li nimûneya "welatê hevbeş" û hemwelatîya wekhev di çarçûveya komareke demokrat de, were vegerandin.

**Rêgezên Îdyolocî yên Daxuyanîyê:**

**Ew jî di sê xalan de diyar dibe:**

1- Daxuyanî kesayeta Rêber Ocelan wek navenda rewanî û dîrok pêşkêş dike ku li ser rola wî her dem tekez dike, êdî daxuyanî bi aweyeke nêzîdîyolocî tê diyarkirin (jixwe ev yek jî PKK ji tevgerên din ên îdyolocî cûda dike).

2- Daxuyanî amaje dike ku wateya pakrewanîyê ya partîyê, asta herî pabendîyê ye, ew jî bi amaje bi pakrewanên mzin (Elî Heyder Kaytan û Rida Altûn), ev jî li ser berdewamîya nîşaneya canfîdayî û qurbanîyê ta di veguhestina ber bi aştîyê ve, tekez dike, ev jî nameyek bû ku giha gelekan.

3- xwerêxistina wek partî bi "Rêxistina Civakî" tê guhertin, anku îdyolocî bi giştî nehate hilanîn (wek ku hinkan xwest belav bikin), lê ji nû ne hate amojkirin.

**Xaftina Ramyarî ya Daxuyanîyê:**

Di daxuyanîyê de zimanekî hêmayî (simbolî) û xurt hate bikaranîn, ew jî bi rêya danîna têgeh û wateyên wek: "Azadî, Civaka Demokratî, Rêbertî, Pakrewanî, Alîgirî û Neteweya Demokratî "**(15)**, ev hemû jî têgehên ku hestan gur dikin û ji nû ve nasnameya xebatî saz dike.

Her wiha daxuyanîyê, pala xwe da dîrok wek nîşaneya rewatîyê, ew jî bi rêya pêşkêşkirina dîroka partî û xebata kurdî wek lêvegereke rewa ji hemû veguherînan re.

Êdî tevî veguherîna aştyane jî, lê di axaftinê de, peyvên wek (dewlet-netewe, pilanên mandelkirinê û komploya navneteweyî), hebûn.**(16)**

Ev yek jî mehnedana giringîya hayjixwebûn û xwerêxistinkirinê ji bo derbaskirina pilanên ku veguherîna xebatê ya nû, armanc digirin, dide.

**Rastbînîya Ramyarîyê ya Daxuyanîyê:**

Li gor ku daxuyanîyê diyar kiriye, biryara destpêkirina nû, xwendineke stratîcî ya rastbînî û vacî ya hevbazî û rikberîya dijwar a piroje û rojevên cihreng û cûda yên hêzên mezin û serdest li cîhan bi giştî û li Rojhilata Navîn bi taybet, diteyisîne, ev jî tê wê wateya giringîya peydabûna hevsengîya hin hêzên nû; piştî hemû pêşekên ku berî û piştî şerê tevgera Hemas, Hizbûlah û Hûsîyan bi Israîlê re û astenkirina asê ya di rêya çareserkirina doza kurdî de.

Ev yek wek karîger hiştin ku serkêşîya partîyê li kokê vegerin, êdî pêşî bi Manîfstoya Ocelan dest pê kir ku di 27. 2. 2025 hate xwendin, êdî tevî ku hinkan ew dîtin wek rêyekê tektîkî ji bo ji nû ve belavkirina ramyarî an jî dergeheke ya şêweyeke hevdîtinê ya neyekser jî; lê hineke din tê de ”rastbînîya şoreşgerî” bixwe dîtin, jixwe daxuyanîyê amaje pê kir ku tenê bi xebata leşkerî nema tê domandin û aşîtî merceke ji bo mabûn û domandina ramanê ye.

**Li gor dahûrandina me ji hûrgilîyên daxuyanîya partîyê kir, em encamdigirin ku:**

- Partî dê bimîne lê bi navine nû?
- Tevî jevketina partîyê, lê daxuyanî jevketina ”tevgerê” naniye zimên, lê bi rêya civakê, dê ji nû ve wê saz bike.

**Wate û Bandorên Daxuyanîyê**

Em dikarin wek bidawîkirina qonaxekê û vekirina rûpeleke nû ji qonaxa ”partî - şer” ber bi ”civakbûyîn – siyayeta demokratî, derbaskirina tekoşîna leşkerî wek rêbazeke navendî ya pêkanîna armancan, sazkirina veguherîneke bîrdozî-ramyarî û li gor nakokîya pêşveçûna dîrokî meşandin ku bi rêya wê lêgerîna li çareyeke damend û giştgir ji doza kurdî û hemû pirsgirêkên bêçare yên herêmê û cîhanê; vê daxuyanîyê bigirin dest.

Daxuyanî wek pêkanîna erkeke dîrokî û veguhestina ber bi yek din ve; tê pêşkêşkirin, her wiha daxuyanî di vê demê de wek hewildaneke darîştina

vegotina serketinê ne têkçûnê; tê hesibandin, ew jî ji bo derketina ji warê leşkerî ber bi xebateke nû ya kûrtir û berfirehtir û sazkirina çarçûveyeke rewa ya nû ya kurdî ku di hundirê Tirkîyayê de bi bandoe be (yekbûna bi dewletê re), ew jî bikaranîna axaftina ”welatê hevbeş” ku di qonaxên bê de zemînekê ji awayên nû yên hevdîtina ramyarî were amadekirin, ew jî bi armanca gihiştina çareyên aştyane û domdar.

Êdî di dawîyê de, em jibîr nekin ku rengê navneteweyî li ser rêya nû hate dan, ew jî bi rêya bangkirina li hêzên navneteweyî û çepgira cîhanî ku tevlî nimûneya ”Nûjenîya Demokratî” bibin û ji beşdarbûneke leşkerî ya eşkere ber bi xebateke ramyarî-civakî ya belav û nenavendî bibin.

Anku daxuyanî ji nû ve koka cewherê xebatê pênase dike.

Êdî awaya rêxistinî ya partîyê hate jev xistin, lê bêyî jevketina tevgerê an jî dev ji ramane sereke were berdan, lê awaya lêşkerî bi wateya ”Rêxistina Civakî” hate guhertin, ew jî bi awayekî ku bawerî nehat tune kirin, lê ji bo rajeya pirojeya Neteweya Demokratî bike, ji nû ve tê amojgarîkirin.

Jixwe ev wate li partîyê nanere wek amûrekê ji bo pêkanîna pilanên navendî, lê belê wî wek kesayeteke bibandor digire dest ku dikare civakeke azad, cihreng, xewbesbûn û bi awayeke komî parastina hebûna xwe dike.

**Bandorên Daxuyanîya Dawî ya Kongireya Diwazdem a PKK:**

Daxuyanîya dawî ya kongireya diwazdem a PKK a gulana 2025, di dîroka tevfera kurdî ya nûjen de; xaleke veguhertinê ya stratîcî ye ku partî jevketina xwe û devjiçekberdanê ragihand, ew jî wek bersivdayîna banga rêberê wî Ebdela Ocelan (wek ku derbasbû), êdî ev veguherîn, veguhestina ji tekoşîna leşkerî ber bi xebata ramyarî û civakî diteyîsîne ku bandorê li hemû qadan (kurdî, herêmî û navneteweyî) dike.

**Berdekên Gel**:

Helewestên gel ji ragihandina dîrokî cûda bûn, êdî tevî ku gelek ji alîgirên partî yên kilasîk, hestên xemgînî û matbûnê diyar kirin, lê beşeke mezin ji ciwan û jinan ev veguherîn têgihiştin û piştgir kirin, tevî wilo jî tê naskirin ku ”partî dev jî xebatê bernedaye lê ji nû ve pênase dike”.

Biryarê tê dîtin wek gaveke bi berpirs e ku zanîneke bi hevsengîya hêzan û rawestandina wêrankirinê ye, ew jî tevî tirsa ku piroje; karîgera bergirîyê ya ku partîyê ew di dîrokê de dinimand, ji dest bide.

**Bandorên Biryarên Kongireya Partîyê Li Ser Qadên Têkildar**

**1- Hundirê Tirkî – Kurdistanê û hêzên kurdî yên din**

- **Derfeteke ya partiyên kurdî yên ramyarî:** Jevketina partîyê derfetê dide partîyê kurdî yên ramyarî û rêxistinên civaka sivîl li Tirkîyayê wek partîya ″DEM Partî″ ku şêweyê xwe yê ramyarî-sivîlî destnîşan bike û ramana girêdana bi PKK re ji holê rabe**,** her wiha defta bicihkirina ramyarî, berfirehkirina bingeha xwe ya gelerî ber bi cemawereke kurdî-tirkî li dij şer û piştgirîya rêxistinên ku banga aştîyê dikin; bi dest dixe.
- **Berdeka hêlîna kilasîk:** Bersivdayîna vê beşê tevlihe e, ew jî ji ber ku li ser axaftinên tekoşîna çekdarî, bi partî ve wek perçeyeke ji laş ve girêdayî ne û pîrozûna pakrewanan, rabûye.

  Êdî dibe ku hin ji wan bibînin ku dev ji partî berdin, tê wateya ku dev ji wateya xebatê berdin, lê dibe ku veguherînê wek pêwîstîyeke dîrokî ji ber rastbînîya herêmî ya niha, bibînin.
- **Nifşê Ciwan û Teknolocya:** Hat dîtin ku piranîyê ciwanên kurd ên li bajarên Tirkî, biryarên kongireyê pejirandin, ew jî yên ku xebata sivîlî û demokratî ji karê leşkerî bêtir dixwazin, bi taybet piştî salên stemkarîya li ser kurdan, êdî dibe ku bibînin daxuyanî wek gaveke ber bi ramyarî û hemwelatîyê de be ku derfetekê dide wan ku bêtir tevlî xebata giştî bibion bêyî ku navê ″girêdana bi partîya qedexe″ li wan were kirin.
- **Bihêzkirina Behaneyên Ramyarî:** Her dem dewleta Tirk, sûcê girêdana DEM Partî bi PKK re, wek bihaneyekê ji bo stemkarîyê bi kar tanî, êdî ev daxuyanî belgeyeke ramyarî ye ku derfetê dide van partîyan ku ji nû ve gotûbêjê li ser çarekirina doza kurdî bixwazin, ew jî bi bihaneya ku ″gef nema″.
- **Nakokîyên Di Hundirê Partîyên Kurdî De:** Partîyên kurdî yên sivîl, wê nakokîyên bîrdozî û stratîcî ji bo ku helwesta xwe ji ramana Ocelanî bi rengê xwe yê nû, rû bi rû bimîne, jixwe dibe ku rikberîyeke veşartî di navbera alîyên pir ″rasbînya ramyarî″ û alîyên ″Ocelanîya pabend″ bi awayeke rêjeyî derkeve.

- **Berdeka Dewleta Tirk:** Dibe ku Tirkî daxuyanîyê wek ”ragihandina têkçûnê” şerove bike ku desthilat wê bi kar bîne ji bo ku bêyî tu berdêleke ramyarî bide, hin jidestdayan bixwaze, ev jî zanebûneke ji hêla serkêşên kurdî ve tê xwestin, ew jî ji bo ku daxuyanîyê bike fişareke ramyarî li ser derve.

**2- Bandora li ser Herêma Kurdistana Iraqê:**

Li Kurdistana Iraqê, pêşwazîya dauyanîyê cûda bû:

Alîgirên ramanên dibistana Ocelanîyê, dibînin ku daxuyanî berdewamîya pirojeya civakbûyîna li dij bîrokrasî û êlîperestîyê ye, ji hêleke din ve, hin alîgirên PDK daxuyanîyê wek nîşaneya ”têkçûna” pirojeya partî dibînin, lê axaftinên erênî yên serkêşên Herêmê, ev nerîn sivik kirin.

**3- Bandora li Koçbergeh û Belawelageha Kurdî:**

Li Ewrûpayê, berbijêrkên kurdî û navneteweyî yên ku bi ramana ”Neteweya Demokratî” bawerin, bi daxuyanîyê kêfxweş bûn ku ew wek veguherîneke têghiştî ji ”dema çekê” ber bi ”dema ramanê” dîtin, her wiha daxuyanîyê bêrîkirin li ba koçberên kevin ên bi partîyê girêdayî çêkir ku dibe niha dikaribin vegerin welêt û bê astengî çalakîyên xwe yên ramyarî û civakî bikin.

**4- Bandora Li ser Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhelatê Sûrîyê:**

Nimûneya Rêveberîya Xweser a Demokratî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, nimoneyeke giring a pêkhatî li ser veguherîna PKK ji tekoşîna çekdarî ber bi avakirina civakbûyênê, bi taybet piştî ku Rêberê partî Manîfistoya Nûjenîya Demokratî bi 5 bergeyan (2009 - 2010); wek berdlekî ji netew-dewletê re, dinimîne, êdî bi destpêkirina ”Şoreşa Rojava” di 2012 de, vê Rêberîyê ramanên Ocelan bigeh girtin, wek:

- ❖ Rêveberîya Xweser a Demokratî, êdî paşê ramana tevlîbûna bi dewleta Sûrî re, hate pêşkêşkirin.
- ❖ Azadîya jinê wek bingeha veguherîna civakî, jixwe mafên wê di Peymana Civakî de hate nivsîn.
- ❖ Aborîya civakî ya ku xwe dispêre kompiratîfan.
- ❖ Xweparastin – Ev pirojeye rêxistineke civakî ne keşkerî ye.

Jixwe wê daxuyanî rewabûna nimûneya civakî ya ku li ser ramanên Ocelan avane xurt bike û wê tewanbarîyên girêdana bi PKK re yên ji hêla fişarê dewleta Tirk ve kêm bike, êdî daxuyanî dixwaze hêzan di awayên sivîlî de wek encûmen û komînan kom bike, ev jî wê nimûneya demokratîyê xurt bike û awanîya rêxistinan nû bike.

Bê guman daxuyanîya dawî ya kongireya dozdem a PKK, di rêya tevgera kurdî de, veguherîneke dîrokî ye, ew jî tevî banorên di gelek astan de li ser qadên xwecihî, herêmî û navneteweyî, êdî tevî parastina cewherê ramanî ya xebata kurdî û tevî astengîyan, ew derfetên nû li ber xebata ramyarî û civakî veke.

**Li gor Dirûvên Rûyên Fermandarên Partîyê, rûxserên Demeke Dîrokî tê xuyakirin**

Li gor wêne û vîdyoyên ku li ser navgînên peywendîya civakî, malper, kenal û telvzyonên xwecehî û cîhanî tên belavkirin piştî ku PKK bidawîkirina tekoşîna çekdarî di kongreyê xwe yê dozdem de ragihand, li ser rûyên fermandarên navdar wek Cemîl Bayiq, Murad Qereyilan, Duran Kalkan, Sebrî Ok û fermandarê jin, derûvên tevlihev ji xemgînî, rijdî, hizirîn, aramî û hêvî, dihatin xuyakirin.

Li gor zanebûna min, bawer im ku ev dirûv di heman demê de, bîrbûneke bi giranbûna biryara simbolî û xebatî û şikestineke simbolî li ser çekê ne li ser xebatê, dinimîne.

Êdî bêdengîya ku li ser dirûvên wan xuya dike, dibe ku weke nîşaneyeke pîrozbûna vê gêlîyê were xwendin, her wiha giranîya veguhestina ji ”encama çekê” ber bi ”bandor û rola raman û rêxistina civakî” dihewîne, ew jî ji bo çarekirina doza kurdî û dozên demokratîyê li Rojhilata Navîn û cîhanê.

**Cemîl Bayik, Hervserokê Koma Civakên Kurdistanê (KCK):**

Bi dirûvên jidil û pojinîn xuya bû ku xwesteka wî ya parastina pêmaya partîyê di vê qonqxq nabvberî de; dinimîne, jixwe wî di axaftina xwe de bi hemû tiştên ku Ocelan ji pêşeroja gelan re daniye û meşa li ser rêya wî; pabendî xwe nû kir.

**Murad Qereyîlan, Fermandarê Navenda Parastina Gel (NPG):**

Li ser dirûvên xemgînî û pojinîn xuya bûn, ew jî ji ber dîroka wî ya xebata demdirêj wek fermandarekî leşkerî ku kesayeta wî bibandor li ser Girêlayan

heye, êdî dema axaftin li ser pêşxerîya Ocelan û çareserîya ramyarî û aştiyane û li gor rewşa heyî meşandin, dirûvên wî hêvînîşan dikirin.

**Duran Kalkan, Endamê Encûmena Serokatîya KCK:**

Dirûvên rûyê wî nîşana tengezarî û bendewarîyê li ser pêjeroja ramyarî û rêxistinî ya partîyê; dida, lê paşê pêbendîya xwe bi tiştê ku Rêberê wî danîye da (wek ramngerekî îdolocî yê partîyê ye û ji bandorkerên li ser tevgerên çepgira Tirkîyê bi hemû beşên xwe yên ramanî û îdîyolocî ye).

**Sebrî Ok, Endamê Encûmena Serokatîya KCK:**

Dirûvên wî bendewarî, jidilî û tekezîya li ser rêveberkirina veguhertina nû; nîşan didan, jixwe ew bi rêkarî xwe ya pabend û nasîna wî bi hemû hûrgilî û razên hevdîtinê yên di dîroka partîyê de bi dewleta Tirk re; navdar e.

**Fremandarên Jin:**

Her kesê ku wêne û vîdyo dîtin û bala wan kişya dirûvên wan, dîtin çawa rûyên wan, hem xemgînî li ser bidawîbûna xebata wa ya tekoşîna leşkerî û hem jî hêvîya qonaxeke xebatê ya nû ku xwe dispêre ramyarî û rêxistina civakî; nîşan didan.

**Bandorên Erênî û Nerênî yên Biryarên Kongireyê ya Veguherîna ji Çekê Ber Bi Ramyarîyê ve:**

Biryara kongireya dozdem a PKK ya ku biryar bi dawîkirina tekoşîna çekdarî û jevketina partîyê da, veguherîneke bîrdozî û stratîcî ya giring dinimîne ku wateyên wî sînorên rêxistinî ber bi warên civakî û herêmî yên kûr derbas dike, ji ber ku ew ne tenê şêweyeke xebatê tune dike, lê belê ew nakokîyeke berfireh li ser dibetîyên xebatên ramyarî yên kurdî, sînorên gengaz di rewşa bingeheke herêmî ya asteng de û rikberîyên kûr li ser nasname û desthilatê, dest pê dike.

**Yekem- Erênî û derfetên vebûna bi ser alîyên din de û veguhertina avaker:**

**1. veguhestina ber bi stratejîyeke bêtir nerm û şaristanî ve:**

Rawestandina têkoşîna çekdarî ji bo pêkanîna armancan derfeteke fereh dide tevgerê ku projeya xwe ji nû ve û li gor alavine durist darêje da ku rê li ber hevbeşîyeke berferehtir veke; çi bi hêzên siyasî yên kurdî yên din re çi bi tevgerên çepgir, demokratîk, jin û jîngeha Tirkîya ya hundir û derve re be.

Êdî têkoşîn ne tenê girêdayî tifingê ye lê belê êdî girêdayî hevpeymanan, bendora sivîlane û avakirina nimûneyên civakî ye ku projeya ramanî ya tevgerê dinimînin.

**2. Vekirina kenalên danûstandinê yên nû bi alîyên bikêr ên herêmî û navdewletî re:**

Bi vê biryarê li şûna ku partî weke ``gefeke ewlekarîyê`` were dîtin, dibe alîyekî siyasî yê bikêr ku êdî bi awayekî diplomatîk danûstandin pê re dibe (ev yek piştî derketina daxuyanîya dawî ya partîyê hat xuyakirin).

Ev guhertin dê rê li pêşberî ji nû ve destpêkirina diyalogan û veguhestina ber bi danûstandinê bi dewleta Tirkîyayê re veke. Ev yek dê ne li gor hêza leşkerî lê belê li gor rewatîya gelêrî û nerîna ramanî dê dest pê bike. Dibe ku ev yek hin hêzên navdewletî (bi taybet welatên rojavayî) han bide ku nêzîkatîya wan bi doza kurdî re li gor guhertinên siyasetên navdewletî baştir bibe.

**3. Başkirina wêneyê partîyê ji alîyê navdewletî ve:**

Her tim navê ``terorê`` mîna kelemekê li pêşberî başkirina têkilîyên partîyê bi civaka navdewletî re bû. Dema partî têkoşîna ramanî-siyasî-civakî li xwe bigire, ew xwe dixe cihekî exlaqî û zagonî yên nû de ku bi nirxên maf, azadî û aştîyê re bigunce. Dibe ku bi rêya vê yekê hin bend li ser werin rakirin û piştgirîya madî û siyasî ji hêla sazîyên navdewletî ve ji bo wê werin zêdekirin.

**4. Ew dê bibe nimûne ji bo tevgerên azadîyê yên cîhanî:**

Dibe ku ev biryar bibe nimûne ji bo şoreş û partîyên li Amerîkaya latînî, Asiya û Aferîkayê yên ku gihaştine rewşeke aloz mîna ya partîyê û nikarîbûn hêza çekdar bixin birêveberîyeke dadmend. Rewşa kurdî îro danasîna têkoşînê ji nû ve pênase dike ku ew ne şer û nakokiyek li ser desthilatê ye lê belê ew avakera civakê û azadkirina wê ji hundir ve ye. Ev yek mîna şêweyekî nû yê ``yûtûbîya ocelanî`` ye.

**5. Xurtkirina amadebûna xwecihî û civakî:**

Bi dûrketina wê ji alîyê leşkerî, partî dê bêtir karibe di nav civakê de kar bike, sazîyên fêrkirin, jin, çandî û jîngehî ava bike û nimûneya rêveberîya xweser a demokratîk weke alaveke avakirina aştîyê ji binî ve xurt bike. Ev yek hedarîyê li herêmên kurdî xurt dike û siyastê bi pêdivîyên milet ên rojane ve girê dide.

**Duyem- neyînî û rûbirûyên rewşa niha û metirsîyên jirêderketinê:**

**1. Nakokîya ramanî û hişmedî di hundirê partîyê de:**

Em nikarin mandele bikin ku beşek ji bingeh û alîgirên partîyê (nemaze yên ku ezmûna çiya û çekan jiyan kirine) dê vê biryarê weke paşveçûn û tawîzê bibînin çimkî çûna ji çekan ber bi siyasetê ve ne tenê tê wateya guhertina tektîkê -weke ku tê nasîn- lê belê guhertina hişmendîyê bi giştî jî. Pêwîstîya vê yekê bi demeke dirêj û xebateke ramanî û rêxistinkirineke himbiz heye. Ev gav bi qasî gava guhertinê girîng e.

**2. Berdewamîya dijminatîyê ji hêla sîstemên herêmî:**

Tevî şêweyê aştîyane yê daxuyanîyê lê dibe ku Tirkîya û hin dewletên derdorê weke fêlbazîyeke tektîkî li vê gavê binihêrin yan jî weke ji nû xwebirêxistinkirina leşerî bibînin bêyî ku nihteke rastîn a guhertinê hebe. Dibe ku ev yek jî çewsandinê li dijî herêmên kurdî zêde bike û tecrîda ku li ser birêz Ocelan hatîye sepandin zêdetir û kûrtir bike, nemaze ku gotara neteweperest a tirkî ya li dijî hemû şêweyê pirrengî û danpêdanê, hê berdewam e û gihaştîye qonaxa faşîstê.

**3. Metirsîya paşguhkirina siyasî û ragihadinî:**

Dibe ku hin alî vê biryarê weke ragihandina binkeftin û têkçûneke nerim bibînin loma di encamê de daxwazên partîyê paşguh bikin û rola wê ya siyasî biçûk derxînin. Ji alîyekî din ve tunebûna karê çekdarî -weke alaveke fişarê- dibe ku karîna danûstandinê lawaz bike, nexasim ku rêxistineke gelêrî ya berfereh û fişareke sivîlî ji hundir û derve ve ya ku pişta wê bigire, tune be.

**4. Jihevxistina bingeha berevanîyê di demekê de ku berdêl tune ne:**

Pêwîstîya çûna ber bi aştîyê ve bi garantoyan heye, lê di herêmê bi giştî de ev yek tune ye.

Eger partî xwe ji çiyayan vekişîne û bi awekî bêserûber hebûna xwe ya leşkerî kêm bike, dibe ku valahîyên ewlekarîyê çêbin û hêzên dijmin vê yekê bi kar bînin û di encamê de tevlîhevî li herêmê vegere, nemaze ku komên tundrew û berjewendîyên herêmê hene (vekişîna şervanên partîyê ji herêmekê dibe ku valahîyekê pêk bîne ku alîyek ji alîyên ku aştîyên naxwazin, wê bi kar bînin. Jixwe ez bawer dikin ku partî ji vî alî ve ne xafil e û helbet berdêlên veşartî li ba wê hene).

**Daxuyanîya gulana 2025 û pirsa ka em çi bikin?**

Dahurandina naveroka vê daxuyanîyê ji alîyê sosyolojîk ve hejmarek alîyên wê hene ku mirov dikare bi rêya van tewereyên jêrîn behsa wan bike:

1. **Guhertineke gewherî di alavên têkoşînê de:** Veugertina ji têkoşîna çekdar ber bi têkoşîna civakî-sivîlî ve li gel parastina avahîsazîya demokratîk a bingeha civakî, dê nasnameya têkoşîna kurdî dûrî bijarteya leşkerî ji nû ve saz bike.

2. **Bipêşketina ramana ocelanî:** Êdî ramana ocelanî ne tenê girêdayî partîyê ye lê belê bûye çarçoveya lêveger a felsefeya azadîya civakî. Ev yek jî rewatîya nimûneya siyasî li herêmên mîna herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê xurt dike.

3. **Ji nû ve aktîvkirina diplomasîyê:** Daxuyanî nîşaneyeke zelal a ji nû ve berdewamkirina diyalogê bi Tirkîyayê re dihewîne, lê ev yek girêdayî hebûna vîneke siyasî û navdewletî ya piştgir e lê di heman demê de tê tekezkirin ku rêya danûstandinê dê ne li ser hesabê destkeftîyên siyasî û çandî yên tevgerê be.

4. **Lêvegereke hundirîn a giştî:** Daxuyanî bangê li hêzên kurdistanî li tevahî xaknîgarîya Kurdistanê dike (Tirkîya, Sûrîya, Iraq, Îran û li derveyî welat) ku tiştên xwe yên girîng ên stratejîk li gor guhertinên herêmî û navdewletî ji nû ve binirxînin.

5. **Ji nû ve danasîna hevgirtina navneteweyî**: Daxuyanî nimûneya ``neteweya demokratîk`` weke çarçoveyekê ku hemû tevgerên azadîyê yên cîhanî dihewîne, pêşkêş dike; di heman demê de li ser xalên hevbeş ên di navbera tevgerên jin, jîngeh û yên dijberî sermayedarîyê de tekez dike.

**Dibistana ocelanî û rehendên guhertina stratejîk:**

Bi rêya çar rehendên sereke bipêşketina ramana siyasî ya ocelanî di daxuyanîyê de dixuye:

1. **Civaka piştî dewletê:** Li ser birêxistinkirina civakî ya xweser li şûna nimûneya dewleta neteweyî tê tekezkirin, li gel xurtkirina mekanîzmeyên demokrasîya hevbeş û aborîya sincî.

2. **Xwerizgarkirina ji baviksalarîyê weke sîstem:** Rexnekirina baviksalarîyê weke dergehê jihevxistina hemû şêweyên desteserîyê tê hesibandin, li gel dîtina wekhevîya zayendî mîna pîvana sereke ya projeya azadîyê.

3. **Ji nû ve hilberandina rêxistinê li gor bingehên nû:** Guhertina bingeha leşkerî ya pîramîd ber bi şêweyekî rêxistinî yê asoyî yê ku xwe dispêre meclisên xwecihî (komîn) û hevpeymanên sivîlane ve, li gel parastina hevgirtina ramanî.

4. **Hevgirtina cîhanî:** Berferehkirina çarçoveya hevpeymanan da ku tevgerên civakî yên cîhanî bihewîne, li gel tekezkirina li ser têkoşîna kurdî weke beşekê ji şerekî berferehtir li dijî sîstemên ku ji alîyê darayî, jîngehî û zayendî ve desteser in.

**Çarçoveya zagonî ya dîtina partîyê weke partîyeke terorîst:**

Dabeşkirina PKKê weke rêxistineke terorîst xwe dispêre çalakîyên wê yên çekdar ên nîva dawîn a salên 80yî û despêka salên 90î yên sedsala borî. Ev yek ji ber gelek sedeman û di encama  fişarên tirkî de bû.

Lê belê Dadgeha Giştî ya Yekîtîya Ewropî di sala 2018an de biryar da ku dîtina PKKê di navbera salên 2014-2017 de weke rêxistineke terorîst, ne zagonî ye(18).

Xwejihevxistina partîyê û paşê rakirina navê wê ji nav lîsteya terorê dê bi roleke girîng û pêşwext a berdewamkirina tecrubeya Rêveberîya Xweser a Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de bilîze. Rêveberîya Xweser nimûneyeke pratîkî ya ramana neteweya demokratîk e. Bi rêya wê komîn û meclisên jinê û yên jîngehî li derveyî mentiqê dewleta neteweyî hatin avakirin û xwe dispêre xwebirêvebirina civakê. Dibe ku di encamê de derfeta danpêdana navdewletî bi vê tecrubeyê xurttir bibe û piştgirîya mirovî û siyasî hêsantir bibe û nimûneyên weke wê bêtir werin handan. Di encamê de ev yek dê alîkarîyê di derxistina partîyê ji nav lîsteya terorê de bike û ramanên ocelanî bi awayekî cîhanî belav bibin; ew jî bi van rêyên li jêr:

1. Derixstina partîyê ji navê terorê yê ku lê hatîye barkirin (çimkî ji hêla hin dewletan ve ji ber sedemên siyasî û berjewendî ve nav lê hatîye kirin), dê bihêle hevpeymanên navdewletî yên berfereh pê re werin girêdan bêyî ku tu kelemên siyaî û zagonî hebin.

2. Dê alîkarîyê di rewatîya rêxistinî de bike û derfetê bide çalakvanan ku  di rêxistinên fermî û yên eşkere de kar bikin.

3. Dê alîkarîya akademîk û çandî fereh bike û dê derfetê bide zanîngeh û navendên lêkolînê ji bo ku ramanên ocelanî bi azadî û cidîyet bixwînin.

Partî û tevgerên ku rêbazê ocelanî ji xwe re kirine rêbaz, dikarin piştî rakirina navê terorê li ser partîyê, bi rola xwe bi awayekî zelaltir bilîzin; ew jî bi rêya van gavan:

1. Avakirina torên jîn û jîngehî û sazkirina hevpyemanên cîhanî yên netewe-derbas. Jixwe pêwîstîya wan bi ramanekê heye ku bi roleke şoreşgerane ya hilberîner bilîze.
2. Pêwendî û piştgirîya tevgerên gelên resen û piştgirîya dozên niştecihên resen û çalakkirina wan li gor bingehine ramanî yên birêxistinkirî û pêşketî ku karibin li gor qonaxê bin da ku mafên xwe bi awayekî giştî bistînin.
3. Karkirina bi civakên berdêl re (Ewropa û Amerîka) û xebitîna ji bo belavbûna nimûneya ``konfedralîya demokratîk`` li şûna pergalên ku li hin dewletan hene.
4. Xebitîna di biwarê diplomasîya sivîlî-civakî de; ew jî bi rêya beşdarîya di kongirên aştîyê û yên mafên mirovan û mafên jîngehê de.

Ev jî tê wê wateyê ku eger navê terorê li ser PKKê were rakirin dê ev yek gaveke girîng ji bo danpêdana bi guhertina wê be.

Tecrubeyên navdewletî tekez dikin ku tevgerên çekdar ên borî dikarin bi rêya guhertina ramanî û rêxistinî bibin hevkarên avakirina aştîya hundirîn û berferehbûna wê ber bi çarçoveya herêmî û navdewletî ve jî.

**Astengî û aso di puxteya daxuyanîyê de:**

Tevî şêweyê dîrokî yên daxuyanîyê lê pêwîstîya pêkanîna wê bi van xalên li jêr heye:

1. Gerek e mekanîzmeyên parastina civakî werin avakirin da ku destkeftîyan ji binpêkirinên ewlekarî biparêzin.
2. Bipêşxistina alavên siyasî yên ku dikarin bandorê li muadeleyên herêmî bikin.
3. Dariştina gotareke pêwendîyê ku naveroka guhertina bingehên têkoşînê (gel) û nerîna giştî ya cîhanî, şîrove bike.

Ev guhertin dê ne dawîya têkoşînê be lê belê ew veguhestina ber bi qonaxeke bêtir aloz ve ye ku şer ji meydana şer ber bi meydanên raman, siyaset û civakê ve dibin.

**Xwendina analîzî û gewherî ya vê daxuyanîyê vê yekê nîşan dide:**

Bêyî fêmkirina çarçoveya giştî ya nakokîyên herêmî û cîhanî yên diyar, mirov nikare biryara jihevxistina partîyê û bidawîkirina têkoşîna çekdarî fêm bike (jixwe ev taybetmendîyeke PKKê û serwerê wê yê dîrokî birêz Ocelan e). Bi rêya vê biryarê kelemên siyasî hatin rakirin, careserî ji bo alozîya ramanî ya ku li ser asta herêmî û navdewletî tên jiyankirin, hatin dîtin û binkeftinek ji zêdebûna faşîzma tirkî re hat dîtin ku ev faşîzm ji ber siyaseta olîgarşî (kêmîneya desthilatdar li Tirkîyê) encam daye. Her wiha ev biryara partîyê tê wateya fêmkirina encamên rola israîlî û amerîkî di babetên herêmê yên cûr bi cûr de û zêdebûna xeta nakokî û levkirina erebî-tirkî û zêdebûna fişara leşkerî bi ser PKKê de li herêmên hebûna wê li Başûrê Kurdistanê (Çiyayên Qindîlê) bêyî ku Tirkîya tu serkeftineke berbiçav li hember wê pêk bîne. Jixwe em nikarin babeta kêmkirina fişarê li Rêveberîya Xweser paşguh bikin, her wiha girîngîya çareserkirina doza kurdî di vê qonaxa girîng a temenê herêmê de.

Ev nakokî tev asta lehengîya avêtina vê gavê û kûrahîya wateya wê nîşan didin. Ev gav nîşan dide ku ew ne vekişîn e lê belê ji nû ve xwebirêxistinkirina stratejîk e ku bipêşketina ramanî li hember şer dide pêş.

Guhertina ji tifingê ber bi siyasetê ve şer bi dawî nake lê belê wî ji nû ve pênase dike, ew tê wateya jidayîkbûna wateyê ji xwezaya cîhanî, xwezayî û mirovî. Ev guhertin dê pêk neyê bêyî ku PKKê karibe peyvên daxuyanîyê û hevokên wê bike rastîyeke berbiçav, çandeke komî û sazîne ku dikarin destkeftîyên ramanî û civakî biparêzin.

**Puxteyeke himbiz a lêkolînê:**

Kongira 12mîn a PKKê ne tenê ragihandina rawestîna şer bû lê belê ew qonaxa guhertina zanînî û stratejîk a di dîroka têkoşîna kurdistanî de bû.

Ew guhertinek ber bi avakirina civaka sincî û siyasî ve bû ku xwe dispêre demokrasîya civakî, wekhevî û dadmendîya jîngehî.

Lê biserkeftina vê projeyê xwe dispêre karînên xwexurtkirina di nav civakê de û peydabûna vîneke navdewletî ku ji dîlbûna hisabên ewlekarî rizgar bibe.

Wê hingê ev guhertin dê ne tenê biryareke partîtî be lê belê destpêka qonaxeke nû li Rojhilata Navîn be: Qonaxeke ku siyasetê ji nû ve pênase bike û mirov weke bikerekî sincî yê azad bibîne ne tenê mijareke desteserîyê be.

Daxuyanîya kongira 12mîn ne tenê ragihandina bidawîbûnê bû lê belê ew ragihandina vejîneke nû bû. Dibe ku pênaseya herî baş ji bo vê qonaxê ev be: ``Derketina ji guleyê ber bi ramanê ve û ji şoreşa çekdarî ber bi ya civakî ve``.

Dibe ku ev rê ne hêsan be lê ya ku PKKê cuda dike, karîna wê ya guncavbûn û ji nû ve afirandina alavên têkoşînê bi awayekî ku gewherê doza kurdî biparêze û wê ber bi asoyên rizgarî û azadîya neteweyî ve bibe.

Di kêliyeke cuda ya dîroka Rojhilata Navîn de Ebdela Ocelan ji tecrîda xwe ya dirêj daxuyanîyek di 27ê reşemîya 2025an de da. Ev daxuyanî di demekê de hat ku guhertina dîrokî ya PKKê di kongira wê ya dozdehemîn de hat ragihandin.

Hevdemîya her du daxuyanîyan ne nişkivîn bû lê belê ew encama girêdaneke fîzîkî di navbera tevger û ramanê de û di navbera teorî û pratîkê de û di navbera tişta ku di zindanê de tê nivîsîn û tişta ku li ser çiyayan û di nav gund û civakan de tê nivîsîn bû.

**Daxuyanîya Ocelan bi awayekî hat ku ji qewîtîyeke siyasî dûrtir be:**

Vê daxuyanîyê rê li ber guhertineke kûr der barê sêwirandina têkoşîna kurdî de vekir. Wê mîna ku ``manîfistoya piştî şer`` pêşkêş kir; ne tenê li ser asta tektîkê lê belê li ser asta bingeha zanînî û asoîyên şaristanî.

Êdî rêveberî ne tenê di çarçoveya standina biryara leşkerî yan siyasî de ye lê belê êdî ew bûye hemdema nerîna ji nû ve avakirina nirxan û sazkirina çanda civakî ya berdêl.

Bi vê wateyê ocelanî piştî reşemîya 2025 êdî ne tenê mejîyekî navendî di hundirê partîyê de ye lê belê ew bû dibistaneke bîrdozî ya vekirî ku xîtaba tevgerên civakî li Rojhilata Navîn û cîhanê dike û nimûneyekî azadîyê pêşkêş dike ku sînorên neteweyî, navdewletî û îdyolojîk ên girtî derbas dike.

Ramana ocelan îro ne bi hejmara baregehên leşkerî û pêkanîna wê ji operasyonên cuda re yan jî hejmara gundên rizgarkirî tê pîvandin lê belê bi qasîya karîna wê ya ji nû ve danasîna siyasetê weke hunereke avakirina jiyaneke hevbeş, ne tenê teknîkeke desthilat û desteserîyê tê pîvandin.

Li gor min tişta ku li benda vê dibistanê ye, ne hêsan e çimkî afirandina nimûneyeke nû ya civakî di bin sîwana şer, birçîkirin, tecrîd û armancgirtinê, ne peywireke hêsan e lê belê gelekî mezin e.

Lê belê rûbirûbûna rastîn ne tenê di mayînê de ye lê belê di hilberîna ``çanda jiyanê`` de ye (19) (weke ku Ocelan di pargîna xwe ya çarem de nav lê kirîye). Çanda karîna xweragirtinê ya ne bi tifingê lê belê ya bi wateyê, ya ne bi hêzê lê belê bi nirxan e.

Çûna ji birêvebirina tifingê ber bi birêvebirina nerînê, nayê wateya destberdana ji têkoşînê lê belê zêdekirin û kûrkirina asta wê bi rêya zêdekirina asta avakirina mirov, sazî, nimûne û pêşerojê.

Ev guhertina stratejîk a PKKê xaleke girîng û cihê di têkoşîna gelê kurd de ye, çimkî çûna ber bi karê siyasî û civakî ve dikare rewatîya partîyê li ser asta xwecihî û herêmî jî xurttir bike û asoyên sazkirina nimûneyeke kurdî-rojhilatanavînî ya demokratîk veke ku êdî li herêmê kurtir û berferehtir bibe.

Ragihandina bidawîbûna têkoşîna çekdarî ne biryareke teknîkî û tektîkî tenê bû lê belê ew encama nerîneke ramanî ya kûr e ku xwe dispêre felsefeya Ebdela Ocelan û ji çarçoveya xwecihî ber bi cîhanîyê ve û ber bi asoyên têkoşînê yên nû ev çû.

Ev felsefe dibîne ku avakirina civaka exlaqî-siyasî, rêbazekî rizgarîya ji tundîyê ye û dê herêmê ber bi sazkirina enîyeke demokratîk li Rojhilata Navîn ve bibe û dê kurdan weke pêşengên şoreşeke demokratîk a cîhanî li şûna şoreşên çekdar bi cih bike.

Rêya çûna ji şer ber bi aştîyê ve û ji karê çekdarî ber bi karê siyasî yên cîhanî ve gelek hêvîyan dihewîne lê di heman demê de gelek metirsî jî di wê rêyê de hene.

Hêvî di têgihiştina tevgerê û bipêşketina gotara wê û berferehbûna nerîna wê de ye lê tirs jî di serhişkîya dewletê û tunebûna vîna siyasî ya çeksazîyê de ye.

Lê tevî wê jî derfeta dîrokî îro pêkan e ku civakeke demokratîk li Tirkîya, Sûrîya, Iraq û Îranê ava bibe. Ew civak xwe bispêre têgihiştineke nû ku girêdanên teng derbas dike û neteweyê ji nû ve weke asîmanekî demokratîk û sivîlî yê pirreng pênase dike ku her kesê cihekî xwe di dewleta neteweyî ya nû de nedît, dihewîne

Serkeftina vê qonaxê ne tenê girêdayî çarenûsa gelê kurd an jî PKKê ye lê belê girêdayî çarenûsa herêmê bi giştî ye çimkî pêwîstîya herêmê bi ji nû ve xwenaskirinê heye; ew jî bi rêya têgehên demokratîk ên civakî, hevbeş û tekûzîya di navbera mirov û xwezayê de (weke ku nûjenîya demokratîk ew pêşkêş kirîye).

Îro cîhan li hemberî wan kesan vekirîye ku dikarin dilê xwe vekin (ya ku PKKê ji tevgerên şoreşgerane yên din cuda dike ev yek e) û babeta nasnameyan a teng derbas bikin. Lê kesên ku li ser mana di çarçoveyên neteweyî, çînî û olî de rijd in, ew ê di dîrokê de bi bin bikevin.

Biryara PKKê ya bidawîkirina têkoşîna çekdar kêlîyeke dîrokî ya pir mezin e ku li hember wê gelek rûbirûyên girêdayî ji nû ve hilberîna nasnameya têkoşînî û avakirina nirxine nû ku di wan de sembol weke parastin û çek nebin bijarteya yekem, dihewîne.

Pêwîstîya qonaxa bê bi têgihiştineke gelêrî ya kûr û vîneke rêxistinî heye ku karibe veguhestinê bi rê ve bibe bêyî ku armancên azadîyê ji dest bide.

Di encamê de peywira dibistana ocelanî ev e:

Ji ramanekê di serê rêveber û ramangerekî de ber bi çandekê di laşê civakê de were veguhestin û ji deqekê ku di girtîgehan de tê xwendin ber bi pêkanîna wê li gund, bajar û kolanan ve were birin. ``kîyotobîyaya ayniştanîya sedsala 21ê.

---------------------------------------------

***Jêder û çavkanîyên lêkolînê:***


*1-مانيفستو الحضارة الديمقراطية المجلد الخامس - عبد الله اوجلان - الطبعة الخامسة*

*2- مانيفستو الحضارة الديمقراطية المجلد الثالث - عبد الله اوجلان الطبعة الخامسة*

1. *Daxuyanîya kongira  PKKê ya ku ji bo erebî hatîye wergerandin- ANFê (3-16).*
2. *Wêne û vîdyoyên ku li ser kenal û malperên cûr bi cûr û yên nêzî partîyê hatine weşandin (17).*
3. *Biryara Dadgeha Giştî ya Yekîtîya Ewropa ya ku di sala 2018 de hatîye standin, Yoronews-erebî (18).*
4. *6- 19مانيفستو الحضارة الديمقراطية -المجلد الرابع -عبد الله اوجلان -الطبعة الثالثة.*

# REHENDA STRATÎCÎ YA ZANÎNEGEHAN LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYAYÊ

**(2 ji 2)**

**D. Eşref Rifet Mehmûd**[1]

**Dahurandina Rola Zanîngehan Di Avakirina Şiyan û Karînên Xwecihî û Pêkanîna Aramîya Siyasî û Civakî De:**

**1. Hînkirin û perwerdekirina pîşeyî:**

Zanîngeh ji pêşxistina perwerde û fêrkirina pîşesazî, bi roleke sereke dilîzin. Jixwe pîşesazî ji bo pêdivîyên bazara kar a xwecihî pêwîst e. Bi rêya pêşkêşkirina bernameyên fêrkirinê yên pispor û perwerdeyên kirdarî, zanîngeh dikarin hejmara xebatkarên xwe yên pispor zêde bike da ku alîkarîyê di xurtkirina aborîya xwecihî û pêkanîna aramîya civakî de bikin[2].

**2. Lêkolîn û pêşxistin:**

Lêkolîna zanistî û pêşxistin, navgînên herî girîng in ku zanîngeh wan di dahurandina kêşeyên xwecihî û pêşkêşkirina çareserîyên pêşwext de bi kar diînin. Li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê zanîngeh dikarin berê xwe bidin lêkolînên girêdayî binesazî, tenduristî, çandinî û wizeyê da ku jiyan baştir bibe û geşepêdana domdar were pêkanîn.

**3. Hevkarîyên civakî û navneteweyî:**

Hevkarîyên bi sazîyên xwecihî û navneteweyî re, bi roleke girîng di xurtkirina karîna zanîngehan a xwegirtina li hember astengîyan de dilîzin. Bi rêya hevkarîya bi rêxistinên civaka sivîl, desthilatî û hekarîyên navneteweyî zanîngeh

---

[1] Doktora Di Rêvebirina Karan De – Rêvberîya Karîgêrî

[2] Anderson, A. (2013). Conflict, Education and Society in a Divided State: The Case of Northern Ireland. Routledge

dikarin piştgirîya diravî û teknîkî ya pêwîst ji bo xurtkirina bernameya xwe ya fêrkirin û lêkolînkirinê bi dest bixe.[3]

**4. Xurtkitina rêvebirina akademî:**

Dema rêvebirina akademî were xurtkitin, karîna zanîngehan a standina biryarên stratîcî yên ku bi armancên niştimanî û geşepêdanî re diguncin, xurttir dibe. Bi rêya pêkanîna rêgezên zelal û durist û pêkanîna lêpirsînê, zanîngeh dikarin navdarîyeke xurt bi dest bixin ku alîkarîyê di xurtkirina aramîya civakî û siyasî de dikin.[4]

Lêkoler dibîne ku xwendina bilind li herêmên şer û nakokîyê ne tenê pêvajoyeke fêkirinê ye lê belê ew pêvajoyeke giştî ye ku alîkarîyê di avakirina karînên xwecihî û xurtkirina aramîya siyasî û civakî de dike. Bi rêya xurtkirina lêkolîna zanistî, veguhestina zanînê û avakirina hevkarîyên civakî, zanîngeh dikarin bi roleke sereke di pêkanîna geşepêdana domdar û avakirina civakên ku ziyan di şer de gihaştîye wan de, bilîzin. Girîngîya xwendina bilind li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ew e ku ev perwerde navgîneke sereke ya pêkanîna hedarî û bipêşketinê ye; ji ber wê jî piştgirî û pêşxistina zanîngehan li van herêman ji bo pêkanîna pêşerojeke baştir, tiştekî gelekî girîng e.

**Beşa Duyem:**

**Bira Yekem: Pêşxistina xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

Xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê yek ji bingehên sereke yên pêkanîna geşepêdanê ye. Zanîngeh rastî hin astengîyan tên ku girêdayî perepêdan, binesazî û bandorên siyasî ne, lê bi rêya nûjenkirina akademî, hevkarîya navneteweyî û derbaskirina teknelojîyayê di fêkirinê de, zanîngeh dikarin xwe bi pêş bixin.

**A- Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

1- <u>Zanîngeha Kobanîyê li bajarê Kobanîyê:</u>

Ew di 2017 de hat avakirin da ku pêdivîya civakê ya bi sazîyên fêrkirinê dabîn bike ku rajeya niştecihên herêma Kobanî û derdora wê bike, bernameyeke

[3] الزهراني، خالد. "الشراكات الدولية للجامعات السعودية لتحقيق الاستدامة التعليمية." مجلة العلوم الإنسانية والاجتماعية التطبيقية، المجلد 3، العدد 5، 2021، ص. 112.

[4] Bryson, J. M. (2018). Strategic Planning for Public and Nonprofit Organizations: A Guide to Strengthening and Sustaining Organizational Achievement (5th ed.). John Wiley & Sons.

akademî a ku bi pêdivîyên bazara kar re bigunce peyda bike, biranşên xwe yên akademî bi pêş bixe û lêkolîna zanistî xurt bike. Tevî astengîyên locistîk û aborî yên ku zanîngeh rastî wan tê û tevî binpêkirinên ku ji hêla dagirkerîya Tirk ve pêk tên jî, zanîngeh hewil dide van xalên navborî pêk bîne.

2- <u>Zanîngeha Şeriq a li bajarê Reqayê:</u>

Armanca vê zanîngeha nûhatî ew e ku beşa fêrkirinê li herêmên Reqa û Tebqayê piştî çend salan ji bêyî xwendina bilind, ew jî ji ber desteserîya rêxistina Daişê li ser deverê; ji nû ve were avakirin.

Zanîngeh hewil dide fêrkirineke akademî a baş peyda bike û li ser biranşên piratîkî (karekî) yên ku rajeya ji nû ve avakirin û geşepêdana aborî dikin tekez dike. Zanîngeh rastî hin astengîyên girêdayî ji nû ve avakirina binesazîê û dabînkirina perepêdana pêwîst ji bo ferehkirina çarçoveya bernameya xwe ya akademî tê.

3- <u>Zanîngeha Rojava li bajarê Qamişlo:</u>

Mezintirîn zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ye. Di 2016 de hat damezirandin û hejmarek fakulteyên cihêreng dihewîne. Ew bi roleke sereke di pêşxistina lêkolîna zanistî û pêşxistina fêrkirina bi zimanê kurdî û erebî dilîze. Ev jî alîkarîyê di cihêrengîya çandî û zanînî de dike. Zanîngeh, tevî astengîyên darayî û kargêrî, hewil dide pîvanên başbûna akademî û pêşxistina bernameyên xwendina bilind pêk bîne.

Fakulteyên zanistên siyasî, endezyarîya çandinîyê, petrol û petrokîmya, endezyarî û avakirina jîngehî, hunerên bedew, bijîşkî û zagonî hatin sazkirin.

Her wiha ev peymangeh jî hatine damezirandin: Peymangeha Endezyarîya bajarî, Peymangeha Bilind a komboter, Peymangeha Bilind a Zanistên Karîgêrî û Darayî.

Di van biranşên xwendinê de jî hat berferehkirin: Hin alîyên fêrkirinê yên nû ku bi pêdivîyên civaka xwecihî re diguncin hatin derbaskirin, her wek biranşên zanistên mirovî û civakî yên ku piştgirîyê didin civakê.

Jixwe bi rêya Encûmena karîgêr, encûmena zanîngehê, encûmena jinê û encûmena xwendekaran; biryarên girêdayî zanîngeh û xwendekaran tên standin.

Hin zanîngehên navneteweyî ku pêwendîya wan bi zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re hene, ev in: Zanîngeha parêzgeha Waşintonê, Peymangeha Kalîfornîya ya lêkolînên hevtekûz, Zanîngeha Zanistên pêkanînî ya Imdinê, Zanîngeha Birîmin li Almanya, Zanîngeha Barma li Îtalyayê, Peymangeha navneteweyî ya Çanda Kurdî li Romayê (Îtlaya) û Zanîngeha Libnanî-Fransî li Hewlêrê.

**B- Bandora rewşên siyasî û ewlekarî li ser xwendina bilind:**

Rewşên siyasî û ewlekarî, astengîyên pir mezin li pêşberî zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê derxistine; ew jî ji ber rageşîyên leşkerî û aborî ku ji ber rewşa nearamîyê ya ku li Kobanî û Qamişlo derket, zanîngehên Rojava û Kobanîyê zehmetî di peydakirina zemîneke xwendinê ya guncav didîtin. Lê tevî rewşa zehmet jî xwendina bilind li herêmê karê xwe domand.

**Bandorên ewlekarî:** Gelek zanîngeh rastî gefan hatin; her wek topbarandina dewleta Tirk a bi ser avahîyên zanîngehan de ku hin caran bû sedema rawestandina çalakîyên akademî. Ji alîyekî din ve nepydabûna ewlekarîyê hişt ku gelek xwendekar dev ji zanîngehan berdin da ku cihekî biewle ji xwe re peyda bikin.

**Bendên aborî:** Ji ber rewşa aborî ya jevketî li Sûrîyê, zanîngehan astengî ji ber kêmbûna perepêdanê kişand, êdî vê jî bandor li karîna wan a peydakirina pêdivî û alavên xwendinê yên pêşketî û xebatkarên koma fêrkirinê ya pispor kir.

**Hevkarîya herêmî:** Bi zêdebûna rageşî û nakokîyan, zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi guhertinên ku di têkilîyên siyasî yên bi welatên derdorê re ( her wek Ewrûpa û Iraq) pêk hatin, bi bandor bûn. Hin zanîngehan hewil da têkilîyan bi sazîyên akademî ên li derve re çêkin, her wek zanîngehên başûrê Kurdistanê da ku bi rêya mamsoteyên wan bernameyên xwendina bilind bi rêya onlaynê bidin.

Piştî aramî û hedarîya hin herêmên Rêveberîya Xweser, her sê zanîngehan dest bi roleke sereke ya avakirina civaka xwecihî kir. Êdî zanîngehan hewil da ku fêrkirineke herî baş peyda bikin da ku alîkarîyê di avakirina civaka xwecihî de bike, hin xebat ew bûn ku ciwan li ser hin jêhatîyên nû werin perwerdekirin û li herêmên binakok, pêşxistina civakî û aborî were xurtkirin.

**Pilansazîyên pêşerojê yên xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

Bi pêşketina rewşa ewlekarî û siyasî li herêmên Rêveberîya Xweser, xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê her tim bi pêş dikeve. Di pêşerojê de tê pêşbînîkirin ku dê hejmara zanîngehan zêde bibe û têkilîyên wan ên navneteweyî û bernameyên wan ên akademî cihêreng bibin, dibe ku ev zanîngeh di warên lêkolîna zanistî yên girêdayî geşepêdana domdar, hevjiyana aştîyane û ji nû ve avakirinê de, xwe berfereh bikin. Ev jî dê alîkarîyê di avakirina civakeke bêtir aram û nerm de bike.

Em dikarin bibêjin ku xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, dibe ku ji ber rewşên siyasî û ewlekarî yên zehmet, rastî guhertinên mezin werin, lê tevî zehmetî û astengîyan jî zanîngehên vê herêmê wek navgîneke sereke ya avakirina karînên xwecihî û pêkanîna hedarîya siyasî û civakî tên hesibandin. Îcar rola wê di avakirina civakê û bilindkirina asta wê bi rêya fêrkirin û lêkolîna zanistî di çarçoveya pêşeroja mayînde ya herêmê de nayên paşguhkirin.

Pergala fêrkirinê û biranşên di hundirên zanîngehê de her tim bi pêş dikevin û xwe dispêre rêbazê perwerdeyên li gor nûjentirîn navgîn û rêbazên zanistî da ku bi pêşketina zanistî re bimeşe û nifşekî biafirîne ku karibe bi pêşketina zanistî ya cîhanê re be. Zanîngeh her tim hewil dide ku hevrêzîyê bi piranîya zanîngehên cîhanê re bike da ku sûdê ji wan wergire.[5]

**Bira Duyem:**

**Rewşa heyî û astengîyên ku zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî wan tên:**

Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî hejmareke astengî û zehmetîyan tên, ew jî ji ber rewşên siyasî, aborî û civakî li herêmê. Ev rewş jî bi çend karîgerên sereke bi bandor dibin:

**1. Rewşa siyasî û ewlekarî:**

Herêm astengîyan ji ber şerekî demdirêj û nehedarîyeke siyasî dikişîne. Ev şer û nehedarî di encama nakokîyên domdar di navbera hêzên cihêreng de peyda dibin. Ev şer û nakokî bandorê li karîna zanîngehan û pêşkêşkirina rajeên

[5] https://www.nescivildiplomacy.com/ar/2023/02/02

fêrkirinê yên baş dike çimkî binesazî tê hilweşandin û rajeên sereke tên bipaşxistin.

**Astengîyên ewlekarîyê:** Hebûna nakokî û şer astengîyên ewlekarî zêdetir dike. Dibe ku ji ber pêvajoyên leşkerî zanîngeh her tim rastî êrîş û girtina demkî were. Rageşîyên siyasî metirsîya koçberbûn û penaberbûnê zêdetir dike. Ev jî hedarî û aramîya xwendekar û mamostayan kêm dike.

**2. Kêmbûna perepêdan û binesazîê:**

Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî astengîyên mezin ji alîyê perepêdanê ve tên. Alozîya aborî ya niştimanî û herêmî rê li ber veberhênanê di alîyê xwendina bilind de digire. Tunebûna perepêdanê dihêle alavên fêrkirinê jî kêm bibin; her wek pirtûk, alavên teknelojîk, teqîgeh…

**Binesazîa hevketî:** Gelek zanîngeh rastî rûxandin û ziyanan hatin; ew jî ji ber binpêkirinên dewleta tirk a dagirker. Ev ziyan rê li ber pêşketina fêrbûnê bi awayekî bi rêk û pêk digirin û bandorê li cûreya fêrkirina pêşketî dikin. Eger avahî peyda bibin jî binesazîên mîna kehrebe, enternet û avê ne her tim peyda ne.

Kêmpeydabûna alavên fêrkirinê: Zanîngeh astengîyan ji ber kêmbûna pirtûkên nûjen, alavên zanistî û teknelojîk ên pêwîst da ku piştgirîya lêkolîna zanistî û fêrkirina nûjen bikin, dikişînin. Ev yek jî bi awayekî yekser bandorê li başbûna fêrkirina pêşketî dike.

**3. Kêmbûnakadroyên fêrkirinê yên pispor:**

Binpêkirinên dewleta Tirk û alozîya aborî û kêmbûna mûçeyan hişt ku gelek kesên pispor û akademî ji herêmê koç bikin. Vê jî hişt ku zanîngeh astengîyan ji ber kêmbûna mamosteyên pispor û lêkoler bikişîne. Ev yek jî van encaman bi xwe re tîne:

- **Lawazîya başbûna fêrkirinê:** Kêmbûna kadroyên pispor dihêle zehmetî bikeve bernameya fêrkirina pêşketî û dana biranşên nûjen. Di encamê de hin zanîngeh xwe dispêrin kesên ne gelekî pispor ku nikarin fêrkirina zanîngehê baş bidin.

- **Zehmetkêşîyên akademî:** Gelek mamostayên meyî jî ji ber fişara kar a zêde astengîyan dikişînin. Ew ji ber kêmbûna kadroyên baş radihêjin barekî zêde.

**4. Astengîyên civakî û aborî yên li pêşberî xwendekaran:**

Xwendekar li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî gelek zehmetîyên civakî û aborî tên ku bandorê li karîna wan a domandina fêrkirina li zanîngehê dike.

- **Rewşa aborî ya zehmet:** Zêdebûna rêjeya xizanî û bêkarîyê dihêle xwendekar nikaribin lêçûnên xwendina xwe ya li zanîngehê dabîn bikin. Hin xwendekar neçar in dewameke giştî yan beşkî kar bikin da ku pêdivîyên xwe yên sereke peyda bikin. Ev jî bandorê li asta wan a akademî dixe.

- **Koçberî û penaberî:** Gelek xwendekar bi koçberî û penaberîyê bi bandor bûn. Vê jî bandor li aramîya wan a derûnî û civakî kir û hin caran hişt ku ji xwendinê qut jî bibin.

**4. Sînordarîya hevkarîya navneteweyî:**

Tevî hemû xebatên hin zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê da ku hevkarîya navneteweyî bi hin sazîyên fêrkirinê yên cîhanî re bi pêş bixin lê ev xebat rastî gelek astengîyan tên; her wek qutbûyîna siyasî û aborî ya ku li herêmê peyda bûye.

- **lawazîya hevkarîya akademî a navneteweyî:** Şerê siyasî dihêle li ser zanîngehên herêmê zehmet be ku hevkarîya akademî û lêkolînî bi zanîngehên navneteweyî re pêk bîne. Ev dihêle derfetên gihaştina li dahat û piştgirîya teknîkî ya derveyîn kêm bibe.

**Lêkolîna zanistî û geşepêdan:**

Lêkolînên zanistî li zanîngehên xwecihî gelekî sînordar in, ew jî ji ber kêmbûna perepêdanê, lawazîya binesazîê û kêmbûna ekîpê pispor. Ev dê bihêle:

- **Lêkolînên karekî (piratîkî) kêm bibin:** Herêm ji ber kêmbûna lêkolînên ku li ser dîtina çareserîyên xwecihî ji bo astengîyên heyî tekez dikin, astengîyan dikişîne; her wek pêşxistina çandinîyê yan jî rêvebirina dahatên xwezayî.

- **Alîkarîya di geşepêdana xwecihî de kêm dibe:** Bêyî lêkolîneke zanistî ya pêşketî, zanîngeh dê nikaribin çareserîyên rastîn ji bo astengîyên civakî û aborî li herêmê pêşkêş bikin. Ev jî rola wê ya pêkanîna geşepêdana domdar kêm bike.

**7. Astengîyên çandî:**

Hejmarek cihêwazîyên çandî û civakî di navbera pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de hene. Dibe ku ev yek hin rageşîyan bi xwe re bîne ku bandorê li jîngeha zanîngehan bike.

- **Cihêrengîya nijadî û olî:** Pêwîstîya zanîngehan li vê herêmê bi mekanîzemeyên bikêr heye da ku hevjiyan û levkirin di navbera hemû kategorîyên civakê de xurt bibe lê şer û nakokîyên domdar dibe ku rageşîyan zêdetir bikin.

Lêkoler dibîne ku zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê rastî gelek astengîyên mezin ên girêdayî binesazî, perepêdan, kêmbûna ekîpê pispor, jîngeha siyasî û civakî hene lê tevî van astengîyan rola zanîngehan her geş dimîne, nexasim di xurtkirina aramîyê û ji nû ve avakirina civakên xwecihî. Pêwîstîya zanîngehan bi piştgirîya domdar a civaka navneteweyî û rêxistinên ne fermodî heye da ku xwendina bilind xurt bibe û karibe astengîyên li pêşberî xwe derbas bike û geşepêdana domdar pêk bîne.

**Bira sêyem:**

**Dahurandina rewşa fêrkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê û bandora wê li ser civakê:**

Pergala fêrkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê yek ji karîgerên sereke yên avakirina civakê û xurtkirina nasnameya çandî û siyasî di bin sîwana pergala Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de ye. Lê xuya ye ku dûrbûneke zelal di navbera felsefeya ``neteweya demokratîk`` a ku Rêveberîya Xweser li xwe girtîye û mekanîzmeyên bikaranîna sîstema fêrkirinê li ser erdê de heye. Ev cudahî bi awayekî yekser bandorê li asta fêrkirinê, başbûna encamên fêrkirinê û rola fêrkirinê di avakirina kesayeta xwendekar û pêşxistina karînên wî yên afrînerî û ramanî de dike.

Ev dahurandin hewil dide reşwa heyî ya pergala fêrkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê pêşan bide, sedemên vê rewşê dahurîne û bandora wê li ser civakê bipîve û pê re jî hevsengîyê di navbera vê rewşê û felsefeya perwerdehîyê ya neteweya demokratîk de pêşkêş bike. Her wiha dê ji danasîna pergala fêrkirinê di jîngeha

xwendinê de were piştraskirin û pê re jî nimûneya herî giştgir a ku dikare hevsengîyê di navbera nirxandina nivîskî û behreyên din de pêk bîne.

**Yekem: Dahurandina rewşa fêrkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

**1. Danasîna pergala fêrkirinê ya niha:**

Pergala fêrkirinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê xwe dispêre nirxandina ezmûnî ya kilasîkî. Ezmûnên nivîskî pîvana sereke ya nirxandina asta xwendekar e. Di qonaxa xwendinê ya yekem de %30 ji bo nirxandina xwendekar di hundirê refê de ye û %70 ji bo ezmûna nivîskî ye (ev li gor pergala heyî). Di pergala xwendina bilind de %40 xwe dispêre ezmûna nivîskî û %60 ji bo nirxandina piratîkî ye; her wek çalakîyên refê, lêkolîn, afrînerî û aktîvbûna di refê de.

Ev yek tê wê wateyê ku pergala fêrkirinê di qonaxa zanîngehê de bêtir xwe dispêre karînên akademî ên nivîskî li ser hesabê behreyên din ên mîna hizirîna nirxandinî, afrînerî, karê komî û derbirîna kesayetî. Emzûnên nivîskî bi awayekî wekhev li ser asta sazîyên fêrkirinê tên çêkirin û berî û di dema ezmûnê de dewam tê rawestandin; ev jî hizra pergala fêrkirinê ya ku xwe dispêre rêbaza kilasîkî ya ku xwe dispêre ezmûnan, ne nirxandina domdar, xurt dike.

2. **Sedemên vê rewşê:** Mirov dikare vê rewşê bi çend karîgeran ve girê bide:

- Mîrata sîstema fêrkirinê ya sûrî ya navendî ku xwe di diyarkirina asta xwendekaran de dispart nirxandina ezmûnî ya kilasîkî.
- Tunebûna mekanîzmene zelal bo nirxandina afrînerî û behreyên fêrkirinê. Dîzayna pergala heyî xwe dispêre bidestxistina akademî bêtir ji behreyên kesayetî û civakî.
- Perwerde û pisporkirina ekîpên mamosteyan li ser pêkanîna rêbazên nirxandinê yên nûjen û cihêreng kêm e.
- Alavên nirxandina giştî tune ne (her wek piroje, karê civakî, nîqaşên vekirî û xwenirxandin). Ev jî dihêle xwespartina li ezmûna nivîskî rêya herî hêsan a nirxandinê be.

**3. Bandora vê rewşê li ser civaka Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:**

Pergala fêrkirinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ya heyî bandorine yekser li ser kesayeta xwendekar û civakê dihêle. Hin ji wan bandoran ev in:

- **Lawazîya behreyên hizirîna rexnegerî û afrînerîyê:** Xwespartina li nirxandina nivîskî dihêle xwendekar bêtir berê xwe bidin ezberkirin û pêşwazîkirê li şûna analîzkirin û hizirîna serbixwe.
- **Sînordarkirina afrînerîya kesayetî:** Sîstema heyî pêşxistina behreyên hizirîna afrînerî û karê civakî han nade; ev jî bandorê li karîna derçûyan a guncavbûna bi jîngehên kar ên nû re dike.
- **Tunebûna dadmendîyê di nirxandinê de:** Nirxandina xwendekaran li gor yek pîvanê (ezmûna nivîskî) cudahîyên takeksî yên di navbera xwendekaran de di ber çavan re nagire.
- **Kêmbûna handanê li ba xwendekaran:** Tunebşna guhdana bi çalakîyên piratîkî û behreyên kesayetî dihêle dilê xwendekaran ji beşdarbûna di çalakîyên refê û lêkolînan de sar bibe.

**Duyem: Hevsengîya rewşa heyî bi felsefeya neteweya demokratîk re:**

**1. Rêgezên felsefeya neteweya demokratîk di fêrkirinê de:**

Felsefeya neteweya demokratîk a ku Rêveberîya Xweser ew li xwe girtîye van tiştan han dide:

- **Fêrkirina civakî:** Beşdarkirina civakê di avakirina pergala fêrkirinê û dariştina biranşan de.
- **Fêrkirina tekûz:** Pêşxistina karînên xwendekar ên ramanî, piratîkî û afrînerî (hemûyan bi hev re).
- **Cihêrengî û dadmendî:** Cudahîyên takekesî di navbera xwendekaran de di ber çavan re tên girtin û derfetên wekhev ji bo hemûyan tên peydakirin.
- **Fêrkirina ku xwe dispêre diyalogê:** Xurtkirina hizirîna rexnegerî û fêrkirina bi rêya diyalog û gotûbêjê.

**2. Valahîya di navbera rewşa heyî û felsefeya Rêveberîya Xweser a Demokratîk de:**

Pergala fêrkirinê ya niha li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi awayekî giştî rêgezên felsefeya neteweya demokratîk nanimîne; ew jî ji ber van sedemên li jêr:

- **Tunebûna hevsengîyê di navbera pîvanên nirxandinê:** Nirxandina nivîskî pîvana nirxandinê ya sereke ye; ev jî berovajî rêgeza geşepêdana behreyên giştî ye.
- **Navendbûyîna sîstema nirxandinê:** Yekkirina ezmûnan li ser asta sazîyan, rêbaza navendbûyînê dinimîne lê felsefeya neteweyên demokratîk doza nermbûneke bêtir di nirxandinê de dike.
- **Kêmbûna guhdana bi afrînerî û hizirîna rexnegerî:** Pergala niha derfeteke baş ji bo nirxandina afrînerî û karê komî nade; ev jî berovajî felsefeya neteweya demokratîk e.

**Sêyem: Piştrastbûna ji danasîna pergala fêrkirinê:**

**1. Danasîna pergalê di jîngeha xwendinê de ne hûrgul e:**

Dema pergala fêrkirinê di jîngeha xwendinê de wek ``pergaleke nirandinê`` tenê were danasîn, ev yek ne hûrgul e çimkî pergal amajeyê bi sîstema ezmûnên kilasîkî dike ku xwe dispêrin ezmûna nivîskî wek pîvaneke sereke ya nirxandinê.

Ji bo ku mirov ji danasîna pergalê piştrast bibe, mirov dikare xwe bispêre van xalên li jêr:

- Çêkirina dîdaran bi rayedarên fêrkirinê û serpereştên fêrkirinê re.
- Analîzkirina siyaset û lîsteyên ku ji kordînasyona zanîngehên Rêveberîya Xweser derdikevin.
- Şopandina pêvajoya fêrkirinê di hundirê refê de da ku xwezaya nirxandinê were naskirin ka çiqasî xwe dispêre çalakî, beşdarî, afrînerî û lêkolînê.

**2. Danasîna hûrgultir a pergalê:**

Pergala niha li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, pergala nirxandina ezmûnî ye ku xwe dispêre ezmûnên nivîskî wek pîvaneke sereke lê bi rêya çalakîyên refî û lêkolînan hinekî xwe dispêre nirxandina piratîkî.

Divê danasîna pergala xwendinê were sererastkirin da ku vê rewşê bêtir binimîne û pê re jî nimûneyeke bêtir giştgir were pêşinyazkirin ku ew xwe bispêre van tiştan:

Belavkirina nirxandinê bi rêjeyeke wekhev di navbera ezmûnên nivîskî de, çalakîyên refî, afirandin, lêkolîn û beşdarî.

Lêkoler dibîne ku dahurandina rewşa fêrkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, qasîya durahîyê di navbera pergala heyî û felsefeya neteweya demokratîk û Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê de diyar dike. Ji nû ve dîzaynkirina pergala nirxandinê da ku bêtir giştgir û cihêreng be, gaveke pêwîst ji bo pêkanîna dadmendîya fêrkirinê û xurtkirina behreyên hizirîna rexneger û afirandinê li ba xwendekaran e.

**Beşa sêyem:**

**Bira yekem:**

**Stratîcîyên pêşinyarkirî ji bo xurtkirina rola stratîcî a zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê (dubarekirina lêkolîna yekem).**

Ji bo pêkanîna roleke stratîcî a bikêr ji bo zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê pêwîstîya rewşa heyî bi danîna stratîcîyên giştî heye ku bi rêya wan astengîyên heyî werin derbaskirin û derfetên fêrkirin û lêkolînê werin xurtkirin. Hin stratîcîyên başkirina rola zanîngehan li herêmê ev in:

**1. Başkirina binesazîa fêrkirinê:**

**a) Ji nû ve amadekirina binesazîê:**

- Ji nû ve avakirin û pêşxistina avahîyên zanîngehan ên ku ziyan ji ber şer dîtine; di nav de amadekirina fêrgeh û teqîgehan li gor pîvanên nûjen. Her wiha gerek e her tim rajeên mîna av, kehrebe û enternetê dabîn bin.
- Damezirandina qadeke zanîngehê ya biewle ku jîngeheke fêrkirinê ya aram ji bo xwendekar û mamosteyan dabîn bike û di heman demê de rewşa ewlehî û gefên pêşbînîkirî jî di ber çavan re digire.

**b) Nûjenkirina alavên teknelojîk:**

- Gerek e alavên teknelojîk ên nûjen û ezmûngehên ku ji bo pêşxistina lêkolîna zanistî û fêrkirinê di hermû biwaran de (her weî endezyarî, bijîşkî û zanistên karekî) werin peydakirin.
- Xurtkirina fêrkirina eleketronîk: Ew jî bi rêya bernameyên fêrkirina ji dûr ve (zom û ji bilî wê) da ku xwendekar tevî zehmetîyên ewlehî û xaknîgarî jî karibin xwendina xwe bidomînin.

**2. Pêşxistina ekîbên akademî:**

**a) Anîna kesên pispor:**

- Divê bernameyên anîna mamoste û lêkolerên sûrî û biyanî yên ku koçî welat kirine yan jî li derve dixebitin, were danîn; ew jî bi rêya handerên darayî, hêsankirina rewşên kar û misogerkirina jîngeha kar a aram û biewle.

**b) Perwerdekirin û pêşxistina domdar:**

- Pêwîst e perwerdeyên dimdar ji bo mamosteyên heyî werin pêşkêşkirin da ku karîna wan a fêrkirin û lêkolînê werin başkirin; ew jî bi rêya hevkarîya bi zanîngehên navneteweyî û sazîyên fêrkirinê yên lipêş.
- Handana şandeyên derveyîn ji bo xwendekar û mamosteyan da ku biçin zanîngehên navneteweyî û behre û pisporîyên nûjen bi dest bixin da ku karibin wan di zanîngehên xwecihî de bi kar bînin.

**3. xurtkirina lêkolîna karekî (piratîkî):**

**a) Piştgirîya lêkolînên karekî:**

- Terxandina perepêdanên xwecihî û navneteweyî ji bo piştgirîya lêkolînên zanistî yên ku astengîyên xwecihî di gelek biwaran de çareser dikin; her wek çandinî, tenduristî û rêvebirina dahatên xwezayî û wizeya nûbûyî.

**b) Avakirina navendên lêkolînê yên pisporane:**

- Avakirina navendên lêkolînê yên pisporane di hundirê zanîngehan de da ku çareserîyên piratîkî ji bo astengîyên ku herêm rastî wan tê, pêşkêş bike; her wek navendên lêkolînê yên çandinîya domdar û mavendên lêkolînên aştîyane û ji nû avakirinê..

**c) Handana hevkarîyên lêkolînî:**

- Xurtkirina hevkarîyê bi zanîngeh û rêxistinên navneteweyî da ku pişta projeyên hevbeş ên lêkolînê bikin û pê re jî zanîn û pisporyan bidin hev û çareserîyan ji bo astengîyên xwecihî û herêmî pêşkêş bikin.

**4. Pêşxistina branşên fêrkirinê:**

**a) Nûjenkirina branşan:**

- Pêkanîna lêvegerînê ji bo branşên fêrkirinê da ku bi pîvanên navneteweyî re yeksan bin û li gor pêdivîyên bazara kar a xwecihî û herêmî bin. Di heman demê de gerek e li ser biwarên mîna teknelojîya, birêveberî û zanînên karekî were tekezkirin.

**b) Tekezkirina li ser fêrkirina teknîkî:**

- Xurtkitina bernameyên fêrkirina teknîkî li zanîngehan da ku ciwan bi behreyên piratîkî yên pêwîst werin perwerdekirin da ku karibin derbasî bazara kar a xwecihî bibin; her wek endezyarîya teknîkî û çandinîyê û pîşesazîyên biçûk

**5. Xurtkirina hevkarîya civakî û navneteweyî:**

**a) Avakirina têkilîyan bi sazîyên xwecihî re:**

- Avakirina hevkarîyeke xurt bi sazîyên ferwerîyî û civaka sivîl re da ku hevkarî di navbera zanîngeh û civaka xwecihî de di pirojeyên geşepêdan û ji nû ve avakirinê de xurt bibe.

**b) hevkarîya bi rêxistinên navneteweyî re:**

- Tevlîbûna li gel rêxistinên navneteweyî de, her wek Yonisko û penka navneteweyî da ku piştgirîya darayî û teknîkî were bidestxistin û bernameya fêrkirinê ya hevbeş a ku fêrkirina bilind li herêmê xurt dike, were pêşxistin .

**c) bernameyên pevguherîna xwendekar û tiştên akademî were pêkanîn:**

- Gerek e kar ji bo pêkanîna bernameyên pevguherîna xwendekar û tiştên akademî bi zanîngehên navneteweyî re were kirin da li xwendekar û mamosta karibin sûdê ji tecrubeyên fêrkirinê û lêkolînên navneteweyî wergirin.

**6. Piştgirîya pêşdarîya karan û geşepêdana aborî:**

**a) Avakirina hembêzeke karên zanîngehî:**

- Pêwîst e hembêzeke karan di hundirê zanîngehê de werin sazkirin da ku pişta xwendekar û derçûyan were girtin da ku karibin projeyên xwe yên pêşdarî bi pêş bixin û alîkarîyê di peydakirina derfetên kar ên nû li herêmê de bikin.

**b) Handana afrînerîyê:**

- Xurtkirina çanda hilberînê û pêşdarîya karan bi rêya bernameyên perwerde û pêşbazîyên zanîngehî. Ev yek jî pişta aborîya xwecihî digire û alîkarîyê di kêmkirina bêkarîyê û pêkanîna hedarîya aborî de dike.

**7. Xurtkirina ferwerîya akademî:**

**a) Zelalî û lêpirsîn:**

- Divê pergaleke ferwerî ya akademî û zelal werin pêkanîn da ku zalalî di standina biryaran û rêvebirina dahatan de hebe. Her wiha gerek e li ser

beşdarîya bikêr a xwendekar û mamosteyan were tekezkirin da ku tiştên girîng û stratîcî ji bo zanîngehê diyar bikin.

**c) Serxwebûna akademî:**

- Xurtkitina serxwebûna zanîngehan ji bandorên siyasî li gel peydakirina çarçoveyeke zagonî ya zelal ku azadîya akademisyenan di fêrkirin û lêkolînê de dabîn bike.[6]

**8. Xurtkirina hedarîya civakî û siyasî bi rêya fêrkirinê:**

**a) Birêxistinkirina diyalogên civakî:**

- Handana zanîngehan li ser birêxistinkirina panel û diyalogên civakî ku alîyên cihêreng ên civaka xwecihî dihewînin da ku levkirin û hevjiyana aştîyane were xurtkirin.

**b) Pêşkêşkirina piştgirîya derûnî û civakî ji bo xwendekaran:**

- pêwîst e bernameyên piştgirîya derûnî û civakî ji bo xwendekarên ku bi şer bi bandor bûne, werin pêşkêşkirin da ku xwendina xwe bidomînin û rêjeya dûrketina ji zanîngehan kêm bibe.

Lêkoler dibîne ku stratîcîa pêşinyarkirî xwe dispêre tekûzîya di navbera başkirina binesazîê û pêşxistina ekîpê akademî û xurtkirina lêkolîna zanistî û pêşxistina hevkarîya civakî û navneteweyî. Bi rêya pêkanîna vê stratîcîê zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dikarin bi roleke sereke di avakirina civakê û pêkanîna aramî û geşepêdana domdar li herêmê bilîze.

**Bira duyem:**

**Hevkarîyên akademî ên xwecihî û navneteweyî û pêşkêşkirina qewîtîyan ji bo avakirina hevkarîyên xurt di navbera zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê û zanîngehên navneteweyî de da ku asta fêrkirinê were başkirin û lêkolîna zanistî li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê were pêşxistin.**

Hevkarîyên akademî ên xwecihî û navneteweyî yek ji bingehên sereke yên xurtkirina başbûna fêrkirin û pêşxistina lêkolîna zanistî li zanîngehan e. Di çarçoveya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê zanîngeh rastî gelek astengîyên cihêreng tên ku pêwîstîya wan bi hevkarî û tekûzîya di navbera sazîyên akademî ên xwecihî

[6] محمود، محمد. "الحرية الأكاديمية واستقلال الجامعات في مصر (2011 – 2024م)." منتدى الدراسات المستقبلية، 2024، ص. 15.

û navneteweyî de heye da ku kelem û zehmetîyan derbas bikin û geşepêdana domdar pêk bînin. Mebest ji vê hevkarîyê ew e ku zanîn pev were guhertin, karînên lêkolînê werin xurtkirin û derfetên fêrbûnê ji bo xwendekar û mamosteyan werin peydakirin,

**Girîngîya hevkarîya akademî:**

Hevkarîya akademî alîkarîyê di xurtkirina başbûna fêrkirinê de dike; ew jî bi rêya pevguherîna branşên xwendinê û rêbazên fêrkirinê yên herî baş di navbera zanîngehên hevkar de. Her wiha ew derfetê dide mamosta û xwendekaran ku ezmûn û çandên fêrkirinê yên cihêreng binasin. Ev jî dihêle karîna akademî û kesayetî li ba wan xurt bibe. Her wiha ev hevkarî alîkarîyê di pêşxistina lêkolîna zanistî de dike; ew jî bi rêya xurtkirina hevkarîyê di projeyên lêkolîna hevbeş de; di encamê de lêkolînên xwedî kiwalîteyên bilind tên encamdan ku pêdivîyên civaka xwecihî û herêmî peyda dikin.

**Sûdmendîyên hevkarîya xwecihî û navneteweyî:**

1. Pevguherîna pisporîyan: Hevkarîya akademî derfetê dide ku pisporî di navbera zanîngehên xwecihî û navneteweyî de peyda bibe da ku alîkarîyê di başkirina fêrkirin û lêkolîna zanistî de bike.
2. Xurtkirina lêkolîna hevbeş: Hevkarî di projeyên lêkolîna hevbeş de, karîna zanîngehan a hilberîna lêkolînên baş û cihê de ku pêdivîyên civakê danîn dikin, xurt dike.
3. Derfetên fêrkirina cihêreng peyda dike: Bernameyên pevguherîna akademî derfetê dide xwendekar û mamosteyan ku di jîngehên fêrkirinê yên cihêreng de bixwînin û fêr bibin; ev jî asorîyên akademî û teknîkî li ba wan fereh dike.
4. Xurtkirina binesazîa akademî: Piştgirîya darayî û teknîkî ji hêla hevkarên navneteweyî, alîkarîyê di başkirina avahîyên akademî û pêşxistina ezmûngeh û navendên lêkolînê de dike.

Astengîyên li pêşberî avakirina hevkarîyan:

1. Cudahîyên perepêdanê: Dibe ku kêmbûna perepêdanê bibe kelem li pêşberî pêkanîna projeyên hevkarîya akademî û karîna wan a domdarîyê sînordar dike.

2. Cudahîyên çandî û fêrkirinê: Cudahîyên di navbera pergalên fêrkirinê û çandan de, dibe ku bibe astengî li pêşberî pêwendî û hevkarîya bikêr di navbera hevkaran de.
3. Bîrokratîya birêveberî: Rêkarên birêveberî yên aloz dibe ku bibin asteng li pêşberî muhirkirin û pêkanîna rêkeftinên hevkarîyê bi awayeî hêsan û bikêr.
4. Astengîyên ewlekarî û aramîyê: Dibe ku rewşên ewlekarîyê li hin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bandorê li karîn û pêkanîna hevkarîyên akademî bi awayekî baş bikin.[7]

**Qewîtî:**

**1. Xurtkirina hevkarîya xwecihî di navbera zanîngeh û sazîyên akademî de:**

- Pevguherîna pisporî û biranşên xwendinê: Zanîngehên xwecihî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dikarin hevkarîyê di navbera xwe de bikin da ku biranşên xwendinê bi pêş bixin û karînên mamosteyan xurt bikin.
- Pêşxistina navendên lêkolînê yên hevbeş: Gerek e navendên lêkolînê yên hevbeû werin avakirin da ku dozên xwecihî û herêmî bigirin dest; ev jî alîkarîyê di pêşkêşkirina çareserîyên piratîkî ji bo pirsgirêkên civakî û aborî de dike.

**2. Hevkarîya bi zanîngehên navneteweyî de:**

- Bernameyên pevguherîna akademî: Divê bernameyên pevguherîna xwendekar û mamosteyan li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê û zanîngehên navneteweyî de were handan da ku kiryarên fêrkirinê yên navneteweyî werin naskirin û derfetên pêşxistina teknîkî werin peydakirin.
- Rêkeftinên hevkarîya lêkolînî: Pêwîst e rêkeftin bi zanîngehên navneteweyî re werin muhirkirin da ku lêkolînên hevbeş werin perepêdan, nexasim ewên ku dozên girîng digirin dest, her wek mayîndebûn, fêrkirn û binesazîê.

**3. Bikaranîna teknelojîyê û xurtkirina hevkarîya akademî:**

- Fêrbûna ji dûr ve (Zoom û hwd): Ji ber ku di fêrkirinê de bikaranîna teknelojîyayê zêde bûye, mirov dikare van bernameyên fêrkirina ji dûr ve bi

[7] منظمة التعاون والتنمية الاقتصادية (OECD). (2020). الشراكات الأكاديمية ودورها في تعزيز البحث العلمي. باريس: OECD Publishing.

kar bîne da ku çarçoveya hevkarîya akademî bi zanîngehên nevdewletî re were berferehkirin da ku bername û perwerdeyên hevbeş pêşkêş bikin.[8]

**4. Dabînkirina perepêdan û piştgiriîya nevdewletî:**

- Hevkarîyên bi sazîyên perepêdanê yên navneteweyî re: Zanîngeh dikarin pêwendîyê bi rêxistinên perepêdana navneteweyî re bikin da ku piştgirîya lêkolînên zanitî û bernameyên pêşxistina akademî bi dest bixin.

- Beşdarîya di bernameyên navneteweyî de: Gerek e zanîngeh werin handan da ku beşdarî bernameyên navneteweyî yên mîna ``Îrasmos+9`` bibin. Ev yek derfeta hevkarî û hevkarîya navneteweyî xurt dike.

**5. Başkirina binesazîe akademî:**

- Pêşxistina ezmûngeh û navendên lêkolînê: Divê binesazîa teqîgeh û navendên lêkolînê were başkirin da ku karibin hevkarîya navneteweyî di biwarên lêkolînên zanistî de bihewîne.

- Sûdwergirtina ji bernameyên avakirina karînan: Zanîngeh dikarin sûdê ji bernameyên avakirina karînên navneteweyî wergirin da ku behreyên lêgerîn û birêveberîyê yên karmendên zanîngehan xurt bikin.

**6. Danpêdana akademî û bawernameyan a hevbeş:**

- Danpêdana bi bawernameyan (ji her du alîyan ve): Pêkanîna rêkeftinan bi zanîngehên navneteweyî û danpêdana her du alîyan bi bawernameyên hev, derfetên xwendekaran ên domandina xwendina xwe û karkirina li derve zêdetir dike.

- Bernameyên bawernameyên hevbeş: Avakirina bernameyên ku bawernameyên hevbeş (di navbera zanîngeha xwecihî û navneteweyî de) didin xwendekaran. Ev yek başbûna fêrkirinê baştir dike û derfetên derçûyan zêdetir dike.

[8] الأكاديمية العربية للعلوم والتكنولوجيا والنقل البحري. (2022). دور الشراكات الأكاديمية في تعزيز البحث العلمي. جدة: الأكاديمية العربية.

[9] Îrasmos+ bernameyeke perepêdana hevbeş a di navbera Yekîtîya Ewropî û dewletên şerî li hewîrdora dunyayê de ye. Armanca vê bernameyê ew e ku xwendina bilind, perwredeya teknîkî, fêrkirina dibistanê, fêrkirina nefermî, ciwan û werzîşê xurt bike.

**7. Piştgirîya afirandin û miqawiltîyê (entrepreneur):**

- Navendên miqailtîyê: Avakirina navendên hembêzkirina afrînerî û miqawiltîyê bi rêya hevkarîya bi zanîngehên navneteweyî û beşgehên cîhanî. Ev jî afrînerîyê li ba xwendekaran zêde dike û aborîya xwecihî xurt dike.
- Pêşbirkên akademî ên navneteweyî: Handana xwendekaran ji bo beşdarîya di pêşbirkên akademî û lêkolînî yên navneteweyî de, derfeta aktîvbûna akademî zêde dike û pîvanên lêkolînên cîhanî dide nasîn.

Lêkoler dibîne ku hevkarîyên akademî ên xwecihî û navneteweyî, Stratîcî yeke baş ji bo pêşxistina fêrkirin û lêkolîna zanistî li zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ye. Bi rêya pêkanîna qewîtîyên  navborî, zanîngehên herêmê dikarin başbûna fêrkirinê xurtir bikin, asoyên lêkolîna piratîkî berferehtir bikin, xwendekar û mamoste bêtir karibin behre û zanînên nû bi dest bixin da ku geşepêdana domdar  ji bo civaka xwecihî û herêmî baştir bibe. Veberhênana di van hevkarîyan de pabendîya zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ya bi serkeftina akademî û alîkarîya di çareserkirina astengîyên heyî û pêkanîna pêşerojeke baş ji bo xwendina bilind li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê nîşan dide.

**Bira duyem:**

**Encam û qewîtîyên vê lêkolînê:**

Bi rêya hevdîtina bi gelek kesan di zanîngehan de (çi mamoste çi xwendekarên her sê zanîngehên herêmê bin) lêkoler gihaşt hejmarek encam û qewîtî. Mirov dikare wan wisa puxte bike:

**Yekem: Encam:**

1. Rola zanîngehan di geşepêdana herêmî û xwecihî de: Lêkolînan diyar kir ku zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi roleke girîng di piştgirîya geşepêdana xwecihî û herêmî de dilîzin; ew jî bi rêya pêşkêşkirina xwendina bilind û derxistina mirovên serkefî lê pêwîstîya wê bi piştgirîyeke mezintir heye da ku rola xwe berferehtir bikin û pêdivîyên bazarên xwedihî û herêmî dabîn bikin.
2. Astengîyên binesazîê: Hat dîtin ku kêmasîyek di binesazîa akademî a pêwîst de heye; her wek ezmûngeh, pirtûkxane û cihên fêrkirinê yên nûjen. Ev jî bandorê li başbûna fêrkirin û lêkolîna zanistî dike.

3. Lawazîya hevkarîya navneteweyî: Encam amajeyê bi kêmbûna hevkarîyên akademî bi zanîngehên navneteweyî re dike. Ev jî derfetên hevkarîya akademî û lêkolînerî û pevguherîna xwendekar û mamosteyan kêm dike.
4. Bandora neyînî ya rewşa ewlehî: Zanîngeh astengîyan ji ber rewşên siyasî û ewlehî yên nearam li herêmê dikişîne; ev jî karîna wê ya hedarîya akademî û kişandina xwendekar û lêkolerên derveyîn bi ser xwe de, kêm dike.
5. Kêmbûna perepêdana ku ji bo lêkolîna zanistî hatîye terxandin: Kêmbûneke mezin di perepêdana ji bo lêkolînên zanistî de heye; ev jî bandorê bi awayekî neyînî li afirandin û pêkanîna lêkolînên baş ên ku dikarin alîkarîyê di çareserîya kêşeyên civakî de bikin, dike.
6. Kêmbûna ekîpên akademî û pispor: Zanîngeh ji ber kêmbûna mamosteyên pispor astengîyan dikişîne; ev jî bandorê li başbûna wanedayîn û lêkolîna zanistî dike.
7. Pêwîstîya bi nûjenkirina branşan: Lêkolînê dît ku pêwîstîya biranşan bi pêşxistin ê heye da ku bigihêjin guhertinê cîhanî û bazara kar a xwecihî û navneteweyî.
8. Çûna ber bi miqawiltîyê ve: Tevî ku hin destpêşxerî hene jî lê pêwîstîya zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi piştgirîyeke mezintir di biwarên afirandin û miqawiltîyê de heye da ku xwendekarên her sê zanîngehan li ser avakirina pirojeyên taybet bi xwe han bidin.

**Duyem: Qewîtî:**

1. xurtkirina hevkarîyên akademî ên navneteweyî û xwecihî: Divê zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê hewil bidin hevkarîyên xwe bi zanîngehên navneteweyî û sazîyên fêrkirinê yên din re berfereh bikin. Ew jî bi rêya rêkeftinên hevkarîya akademî da ku pevguherîna xwendekar û mamosteyan hêsan bibe. Her wiha gerek e hevkarîyên lêkolînî jî hebin.
2. Pêşxistina binesazîa akademî: Pêwîst e binesazîa zanîngehan were pêşxistin ; her wek amadekirina ezmûngehên zanistî yên nû, nûjenkirina pirtûkxaneyan û bikaranîna teknelojîyaya fêrkirina pêşketî ji bo hêsankirina lêkolîna zanistî.

3. Zêdekirina veberhênanê di lêkolîna zanistî de: Divê budceyeke mezintir ji bo piştgirîya lêkolîna zanistî li zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê were terxandin; çi bi rêya perepêdana Rêveberîya Xweser be yan jî bi rêya hevkarîyên bi beşa taybet û rêxistinên navneteweyî re be.
4. Nûjenkirina branşên fêrkirinê: Pêwîst e biranşên akademî bi awayekî werin nûjenkirin ku li gor bipêşketinên cîhanî û pêdivîyên guhêrbar ên bazara kar bin. Her wiha gerek e behreyên piratîkî û karekî, pêşxistina afrînerî û nirxên civakî û demokratîk jî werin xurtkirin.
5. Avakirina karînên mamosteyan: Divê bernameyên perwerdeya mamosteyan werin birêxistinkirin da ku pisporîya wan di wandedayîn û lêkolînê de werin xurtkirin û bi pêşketina akademî a cîhanî re bin.
6. Xurtkirina hevkarîyê bi niştecihên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re: Divê zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê kartêkerîya wan bi xelkên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re zêde bibe; ew jî bi rêya pêşkêşkirina şêwirmendî û perwerdeyan da ku geşepêdana civakî xurt bibe û rajeya pêdivîyên civakê were kirin.
7. Handana afrînerî û miqawiltîyê: Divê zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê hembêzine kar ava bikin da ku piştgirîya afrînerî û xwendekaran were kirin da ku xwendekar bêtir projeyên xwe bi pêş bixin. Her wiha divê alîkarîya darayî û teknîkî jî ji bo wan were pêşkêşkirin.
8. Pêkanîna danpêdana navneteweyî bi bawernameyan: Ji bo dabînkirina karîna xwendekaran a domandina xwendina xwe li derve yan jî li bazarên cîhanî, divê pîvanên xwendinê li zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê werin başkirin da ku danpêdana navneteweyî bi bawernameyên wan were kirin.
9. Bikaranîna teknelojîyayê di fêrkirinê de: Divê bikaranîna teknelojîyayê di fêrkirinê de were xurtkirin, di nav de xwendina ji dûr ve bi rêya enternetê da ku zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê karibin bigihêjin cemawereke berferehtir û pêvajoya fêrkirinê were başkirin.
10. Başkirina rewşên siyasî û ewlekarî: Ew jî bi rêya hevrêzîya bi alîyên têkildar re. divê zanîngehên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê hewil bidin rewşa ewlekarî û siyasî di çarçoveya xwe de baş bike da ku jîngeheke fêrkirinê ya hedar û balkêş were dabînkirin

## Jêder û çavkanî:


***Yekem: Jêderên erebî:***

- *https://www.right-to-education.org/ar/node/1316*
- *https://www.nescivildiplomacy.com/ar/2023/02/02//*
- منظمة التعاون والتنمية الاقتصادية (OECD). (2020). الشراكات الأكاديمية ودورها في تعزيز البحث العلمي. باريس: OECD Publishing.
- الأكاديمية العربية للعلوم والتكنولوجيا والنقل البحري. (2022). دور الشراكات الأكاديمية في تعزيز البحث العلمي. جدة: الأكاديمية العربية.
- إيراسموس+: هو برنامج تمويل مشترك بين الاتحاد ال أوروبي ودول الشريك في جميع أنحاء العالم. يهدف البرنامج إلى تعزيز التعليم العالي، وتدريب المهني، والتعليم المدرسي، والتعليم غير الرسمي، والشباب، والرياضة. تشمل المنح المقدمة من إيراسموس+ العديد من الفئات المستفيدة.
- [1] مكي، إ. (٢٠٢٣). التعليم العالي في العراق بعد ٢٠٠٣: تحديات مستمرة (ص. ٦). مركز الشرق ال أوسط، كلية لندن للاقتصاد والعلوم السياسية.
- المزين، سليمان حسين، والقدرة، حامد نعيم. "دور الجامعات الفلسطينية في ترسيخ ثقافة الحوار المجتمعي من وجهة نظر طلبتها وسبل تعزيزه." مجلة جامعة القدس المفتوحة للأبحاث والدراسات التربوية والنفسية، مجلد 5، عدد 18، 2017، الصفحات 211-226.
- الزهراني، خالد. "الشراكات الدولية للجامعات السعودية لتحقيق الاستدامة التعليمية." مجلة العلوم الإنسانية والاجتماعية التطبيقية، المجلد 3، العدد 5، 2021، ص. 112.
- النويهي، آية عبد الله أحمد. "دور الجامعات في تقدم البحث العلمي وأثره على المجتمع." المركز الديمقراطي العربي، 2014، ص. 1.
- محمود، محمد. "الحرية الأكاديمية واستقلال الجامعات في مصر (2011 – 2024م)." منتدى الدراسات المستقبلية، 2024، ص. 15.

***Duyem: Jêderên biyanî:***

- *Bryson, J. M. (2018). Strategic Planning for Public and Nonprofit Organizations: A Guide to Strengthening and Sustaining Organizational Achievement (5th ed.). John Wiley & Sons, p.7*
- *Collins, D. (2010). *Strategic Management: A Decision-Making Approach (7th ed.). McGraw-Hill Education, p.5*
- *Boddington, T. (2013). Higher Education Strategy: Towards a Global Framework for Innovation and Excellence. Routledge, p.12*
- *Mintzberg, H. (1994). The Rise and Fall of Strategic Planning Reconceiving Roles for Planning, Plans, and Planners. Free Press, p.25*
- *Anderson, A. (2013). Conflict, Education and Society in a Divided State: The Case of Northern Ireland. Routledge.*
- *Bryson, J. M. (2018). Strategic Planning for Public and Nonprofit Organizations: A Guide to Strengthening and Sustaining Organizational Achievement (5th ed.). John Wiley & Sons.*

# PERGALA DEWLETA NETEWEYÎ YA "TUNDREW" LI SÛRIYAYÊ

## BINKEFTIN Û BERDÊLEKE DEMOKRAT – (1 ji 2)

**Dilşad Murad**[1]

Sûriya ji gava serxwebûnê ve, an ku sala 1946an, tu aramîyeke siyasî nedîtiye. Vê yekê, bi xwe re tevlihevîyên civakî, ramanî û çandî ku berê li vî welatî tune bûn, derxistine. Sedema vê ya sereke ew bû ku; di pêvajoya avakirina sabara sûrî ya berî serxwebûnê de nehatine beşdakirin û piştî wê jî neketine di nava birêvbirina hevbeş de. Her wiha tevaya ferwerîyên sûrî; yan ji malzaroka xetên neteweyî yên yekdest vejîn bûne yan jî ji lêdanên eşkerî şax bûne. Vê yekê li ser naverokên makezagonên sûrî yên ku pirrengîya nijadî, tîreyî û çandî yên li welêt, derbas dikin, bandoreke nerênî kiriye. Her wiha yeknetewbûn rûnandiye û mafên netewe yan jî gelên ne ereb paşguh kirine. Di encama vê yekê de; dozên civakî, nijadî û çandî li sernserî temenê sabara sûrî ya niha, ji sala 1920an derketine pêş; mîna doza kurdî û ya suryanî... û hwd.

Her wiha navendîbûna rêveberîyê di destê pêkhate yan jî beşekê de, hiştiye ku siyasetên teror, zordetsî û çewisandina siyasî û civakî werin meşandin. Pê re jî, hiştiye ku xwespartina netewperestî û tîreyî çêbibe. Tişta ku li welêt li ser destê rêjîma Beisê (netewperest û tîreperest) ya di seranserî nîv sedsalê de, ku bi xwe re komkujî û zordarî di mafê sûrîyan de, ji hemû pêkhateyan, çespaneke têr e; ku çi qasî ev rêbaza netewperest an jî tîreyî ya yekdest pîs e û mafên pêkhateyan ji destên wan girtine.

### Dewleta Neteweyî Ya "Tundrew" Li Rojhilata Navîn

Di dîroka ramanên mirovî de "dewlet" têgeheke ku herî xwedî kêşe ye. Hevdemî ku dîtanezanên rojavayî wê weke pêdivîyekê ku pêşketina şaristanî û bajarvanîyê ew li pêş xistiye dibînin; hinek ramanên din hene, weke Anarşî

[1] Nivîskar û Rojnamevan. Serokê Edîtorîya Kovara Şermolayê

(nedesthilatdarî) û Ocalanîyê (Felsefeya Şaristanîya Demokrat), li dijî hebûna sabareke çêkirî li ser serê civakan derdikevin. Li gor wê; ew dewletê weke desthilateke li dijî azadîyên civakî û çandên xwecihî dibînin, nemaze gava komik derdikevin ser desthilatên dewletê ku peywirên siyasetên netewperstî yan jî olî yên tundrew in.

Têgîna "Dewleteya Neteweyî: di serdema nû de, bi taybetî di serdema piştî şoreşa Fransayê de, derketiye pêş. Pergala navdewletî -bi niwênerîya dewletên mêtingerîya ewropî- herêmên desthilatên xwe dabeşî dewletokên neteweyî kirin, xelkên hin neteweyan bi rêgeza "parçe bike, rê bigire" ji hev belav kiin, da ku sertewandina wan û tunekirina çi ronakbîrîyeke şaristanî ya gelemper li herêmê, hêsan bibin. Ji wan jî; neteweya ereb e ku ew dabeşî 22 dewletan kiriye. Her wiha hinek neteweyin din di navbera pergalên neteweyî de belav kirin, weke neteweya kurd ku di navbera çar dewletên neteweyî yên Rojhilata Navîn de belav kiriye. Ev yek bi armanca belavkirina tovên fitneyê di navbera gelan de û avakirina rewşeke nearamîyê ya demdirêj, pêk anîn.

Tundrewîya neteweyî; bilindkirina netewe, gel an jî nijadekê di ser neteweyeke din re ye. Her wiha xebitîna ji bo tunekirin û pişaftina wê di nava xwe de, ku jê re têgîna "şofînîzm" tê gotin. Berztirîn dîtaneyên şofînîzmê yên di serdema nûjen de "nazîya almanî, faşîzma îtalî û toranîya tirkî" ye.

Li kêleka kokbûna dîrokî ya hişmendî û kirinên netewperestî yên tundrew li welatên Rojhilata Navîn, gelek dîtanezanên netewperest ên erebî ya sade (tundrewî û dûrxistina neteweyan û civakên resen) di sedsala bîstan de derketin. Piranîya wan jî li dibistanên mizgîndanî yên rojavayî xwendine yan jî bi ramanên nazî û faşîzmê bandor bûne. Derketina partîya Beisa Erebî ya Sosyalîst di sala 1974an de ku li ser destê nijadperestên mîna Zekî El-Ersûzî û Mîşêl Efleq û kesin din li pêş ketiye, berztirîn berhemên vê hişmendîyê û dîtaneyên netewperst ên tundrew bû.

Li gor nêrînekê di tişta ku li welatên Rojhilata Navîn ji ber peywirên pergala dewleta neteweyî "tundrew" de pêk hatine; em ê sosret û tevlîhevîyên mezin bibînin, mîna pêkanîna komkujîyan û qirkirinên nijadî û çandî, şerên neteweyî û mezhebî, rewşên aborî û jiyanî yên xirab, çewisandina azadîyam, tevizîna siyasî û civakî û binpêkirina mafên mirovan…

## Damezirandina Sabara Sûrî

Sûriya; navek e ku ji alîyê dîroknasan, her wiha romanan ve, li herêma rojhilatê deryaya Navîn (bi taybetî herêmên Şam, Hums, Hema, Libnan û derdora wê) hatiye kirin. Ev nav, di nîveka duyem a sedsala nozdehem de, bi taybetî sala 1865an, careke din hat vejandin. An ku; gava dergeha bilind "Imperatorîya Osmanî" biryar da ku wilayeta Şamê tev li wilayeta Seydayê bike, ku bi dest xwe re wilayeteke mezin bi navê "Sûriya" ava bike û Şam jî bû paytexta wilayeta nû. Her wiha Heleb û derdora wê jî wilayeteke xwedî kesayeteke taybet da avakirin. Êdî; herêma Cizîrê jî, piranîya wê ser bi wilayeta "Diyarbekir"ê ve bû. Herêma Hewzê Firatê "Dêra Zorê" û derdora wê ji derveyî wilayeta Sûriyayê bûn.

Di dema ragihandina "Mîrnişîna Sûrî ya Erebî" de ku li ser destê Melek Feysel ku piştî serkeftina Şoreşa Erebî ya Mezin sala 1918-1920an pêk hat, wilayetên Şam û Helebê di nava xwe dihewand; ew jî piştî ku osmanîyên tirk jê vekişiyan. Mîrnişîna Sûrî li ber êrîşên hêzên fransizî yên ku li gorî peymanên navdewletî ku herêm di navbera dewletên li jêr mêtingerîya fransizî û brîtanî de, an ku peymana Saykis Pîko 1916 û peymana San Rîno 1920, êdî hilweşiya.

Siberoja herêmên Cizîrê û Hewza Firatê "Rojhilatê Firatê" ji bo derbasbûna wê di nava sabara pêkhatî de "Sûriya" bi rêya danûstandinên nexşekirina sînorên tirkî-sûrî di salên 1921-1930î de, di navbera tirkan û fransizîyên "ku mêtingerên xaka Sûriyayê" ne, li Enqereyê, hat diyarkirin. Her du alî di encamê de gelek peymanên nexşekirina sînoran danîn. Li gor wê; "Peymana Enqereyê ya Yekem" 20ê cotmeha 1921ê di navbera diplomatê fransizî "Hênrî Franklawn Boyon" û wezîrê karê derve yên tirkî "Yûsiv Kemal" hat lidarxistin. Her wiha peymana "Eqere ya Duyem" 30ê gulana 1926an di navbera şanderê bala yê fransizî li Sûriyayê (Hênrî Dî Jovînêl) û ferwerîya tirkî de, hat lidarxistin. Êdî; nexşekirina sînoran li gor pêvekeke din di 22ê pûşbera 1929an de ya li gor peymana Enqereyê ya Duyem hat temamkirin û piştre di 3yê gulana 1930î de raporeke fermî ya peymana dawîn a nexşekirina sînoran ji Yekîtîya Neteweyan re hat şandin.

Li ser erdê; hewldanên Fransayê û desthilatên Şamê ji sala 1930î heyanî sala 1943yan berdewam bûn, heyanî ku deverên Cizîrê û Hewzê Firatê bi temamî têkelî nava sabara sûrî bûn. Di destpêkê de; piştî ku herêm bo dewletokên piçûk hat dabeşkirin (Şam, Heleb, Çiyayê Elewîyan û Çiyayê Durzîyan), bû ser bi

dewleta Helebê ve. Piştre ev dewletok ji nû bûn yek û hêdî hêdî bi navê dewleta "Sûriya"yê hat nasîn ku di nava xwe de gelek pêkhateyên nijadî û neteweyî dihewîne, weke "ereb, kurd, suryan, ermen, çerkes, tirmken, aşûr û kildan" her wiha di nava xwe de rengrengîyeke olî û mezhebî jî dihewîne, weke "sina, şîa, elewî, durzî, ismaîlî, xiristiyanên katolîk û ertodoks û êzdî…".

## Pergala Navdewletî û Rola Wê Di Sûriyayê De

Fransa li keleka Ingeltrayê, di bicihanîn û arastekirina siyasetên pergala navdewletî ya desthilatdar de, di nîveka sedsala bîstan de, roleke navendî lîst, ku piştre Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Yekîtîya Sovyêtê "Rûsya" hatin. Lewre; tevaya siyasetên ku Fransa û Ingeltrayê di wê demê de, li Rojhilata Navîn pêk anîn, ji alîyê mêjîyê arasteker ê pergala cîhanî "Hêzên mezin ên pergala kapîtalîzmê" pêk hatine, ku armanca pergala kapîtalîzmê çêkirina fitne û kînê di navbera gelan de û bihevxistina wan, talankirin û dizîna şiyan û derfetên neteweyan û wêrankirina aborîyên gelên Rojhilata Navîn ku êdî di encamê de nema bikare roesanseke şaristanî ya çalak li herêmê pêk were. Heyanî radeyekê di planên xwe de bi ser ketin. Êdî; hemû qirkirinên nijadî yê di mafê ermen, suryan, aşûrî, kildan û kurdan li herêmê de, her wiha şerê navxweyî yê Libnanê û şerê îranî-iraqî… her wiha gelek babetên din, çespanên vê yekê ne.

Fransayê; di dema hebûna xwe ya li Sûriyayê de -weke her hemû desthilateke dagirker- der barê her netewe, ol û mezhebekê de siyaseteke taybet da meşandin. Parçekirina wê ji welêt re bo dewletokên piçûk "pêvajoya jihevxistina Sûriyayê û jinûvesazkirina wê" di pileya yekem de, armanca wê çêkirina parçebûn, hevrikî û nakokîyên neteweyî, tîreyî û heyanî herêmî bû, an ku ne ji bo xatirê ewlekirin an jî pêkanîna xwestekên gelên van herêman bû. Vê yekê; piştre bi xwe re bandoreke mezin di jiyana siyasî, civakî, aborî û çandî de hişt. Ev bû sedema ku hevrikîya tîreyî ya li ser kursîyê desthilatê derxist ku êdî hişt beşin derkevin, ku xwedî bangeşeyên neteweyî yên tundrew in. Nemaze; tevaya makezagonên sûrî di nava xwe de mafên wekhev ji tevaya gelan re yên ku li welêt hene û ne jî taybetmendîya hinek çandan, nehewandin. Tişta ku di dehsalên dawîyê de rû dayî, cihê xwe li jêr sîwana hevrikîya ku berê gelek herêmên sûrî daye wêrankirineke plankirî û bi destên xwecihî, digire. Vê yekê

di binyadsazîya sabara sûrî de lawazî û hijevketin çêkiriye û bandor li hemû sektorên têkildarî jiyana welatîyên sûrî kiriye.

Di biwarên rêveberî û aborî de; desthilatên dagirkerîya Fransayê navenda biryarê ya sazîyên rêveberî, rajeguzarî û aborî yên sûrî xist destê şêwirmendên fransizî. Lewre; sûrîyên "teknokrat" nikarîbû xwe li pêş bixin û ezmûnên xwe yên bazirganî baş bikin. Ji ber vê yekê gava fransizî sala 1946an ji Sûriyayê derketin, sazîyên xwecihî piştî serxwebûnê di biwarên rêveberî, binyadsazî û xebata peywerî de, lawaz man. Jê bêtir; gendelî belav bû. Her wiha sazîyên darayî yên navendî heyanî çend salan piştî serxwebûnê jî, girêdayî Fransayê man û dirava "firing" a fransî jî bi dehên salan li Sûriyayê dihat meşandin. Bi wateyeke din; Fransa ji Sûriyayê derneket; heyanî piştrast nebû ku hemû movikên wê yên siyasî û aborî li gorî ki dixwaze têne birêvebirin. An ku; Sûriyayeke lawaz, gendel û bi hêzeke jihevketî".

Mijareke din a ku divê were amajepêkirin ew e; ku qadên masonîyetê li welatên erebî di nîveka sedsala nozdehem de vebûn û li Sûriyayê jî piştî derbasbûna fransizîyan xurt bû. Ev yek heyanî radeyekê xurt bû; ku bjardeyin siyasî û civakî, ji ber hêza wê ya veşartî û ji ber çavnebarîya ji bo bidestxistian pêşmafî, pere û payeyan, tev lê bûn. Bi vî awayî; rola pergala navdewletî ya serdest di belavkirina tora xwe ya piralî "Masonî" li piranîya deverên Sûriyayê û xweberdana di nava civakî xwecihî de, pir bi zelalî diyar bû. Mebesta wê ji vê yekê ew bû ku; bijareyeke siyasî, ramanî û çandî ya gendel, lawaz û bi siyasetên wê re peyrew û sertewandî be, her wiha nikarîbe ku raman û projeyên ronakbîrî li herêmê li pêş bixe, bide avakirin. Êdî; tu vebijêrkên van ferwerên rizamend tune bûn; ji bilî ku bidin pey serdar û peredarên xwe yên -bi her halî- ji çi raman an jî projeyeke ronakbîrî û yekbûyî di navbera gelên herêmê de, ne razî ne. Da ku bi vê yekê, çi nêzîkbûneke erênî di navbera gelên herêmê de têk bibin.

Em ji bîr nekin ku vê pergala serdest, tenê bi xweberdana di nava civakên xwecihî de ya bi rêya qadên masonîyetê, têr nebû, lê belê dibistan û zanîngeh li gelek welatên erebî dane avakirin û akademîsyen li gor raman, siyaset û îdolojîya xwe, jê der diçin. Hêjayî gotinê ye ku; piranîya pêşengên ronakbîrîya erebî "ji Sûriya û Libnanê" di destpêka sedsala bîsatan de, ji zanînegên ewropî der çûne û bi ramanên dîtanezanên rojavayî yên di siyaset û raman de, bandor bûne.

## Xetên Siyasî Yên Netewperst Ên Tundrew Li Sûriyayê

Ji destpêka damezirandina sabara sûrî ve ta niha, ramanên netewîyeta yekalî li ser piranîya partî û tevgerên siyasî bandor kiriye. Sedema vê yekê jî vedigere wê yekê ku; dîtanezan û serekên tevger û partîyên erebî bi ramanên tundrew ên dîtanezanên netewperstîyê yên Ewropayê bandor bûne, mîna nazîya almanî û faşîzma îtalî. Her wiha handana mêtingerîya rojavayî ya ji bo geşedana ramana netewperestîya erebî ya tundrew û bikaranîna wê di çewisandin û paşguhkirina mafên kêmneteweyan de, mîna kurd, aşûr û suryan.

Hinek ramanwerên sûrî û tevgerên wan ên siyasî di tezên xwe de, neteweya erebî gelekî mezin kir. Her wiha hinek komên siyasî jî di tezên xwe yên niştimanî yên sûrî de, heman tişt kir. Ev hemû jî li ser hesabê mafên netewe û gelên din ên ku li welêt dijîn. Jê bêtir; hebûna wan bi temamî paşguh kir û tu ked ji bo lêgerîna li rastîya van neteweyan û danîna çareserîyan ji dozên wan ên dadmend re, nedaye. Lê belê; "kurd" bi tawanên dûrî rastîyê yên mîna "veqetîner, gelparêz, Israîla duyem… û hwd." tawanbar kir. Li ser vê bingehê danûstanina bi wan re, weke welatîyên pileya duyem û sêyem hat kirin û rewşeke paşguhkirinê û çewisandina plankirî ya siyasî, rêveberî, civakî, çandî û aborî, li ser wan hat sepandin. Bi tevî ku; gelê kurd di rizgarkirina herêmê ji dagirkerîya tirkî ya osmanî de, her wiha di têkoşîna niştimanî ya li dijî dagirkerîya fransî de ku li piranîya deverên welêt ku lê hebûn "taxên kurdan ên li Şamê, herêmen Cizîrê, Kobanî û Heleb û gundewarê wê" rû daye, roleke wan a xurt heye.

Satih El-Huserî, Zekî Ersûzî û ji bilî wan ên mîna Qestentîn Zerîq û Mihemed Izza Derûze, ji bo avakirina dîtaneya neteweyî ya erebî ku gelek mezinbûn di tezên xwe de çêkir, xebitîn. Ev yek ji alîyê gelek partî û tevgerên erebî yên xwedî meylên neteweyî, ji wan jî "Partîya Beisê ya Erebî ya Sosyalîst" ku ferwerîya xwe li Sûriyayê (1964-2024) û li Iraqê (1964-2003) da meşandin, hat bidestgirtin.

Satih El-Huserî di partîya Itihad û Tereqî ya tirkî ya tundrew de, ku ji alîyê Masonîyê ve hatiye avakirin û arastekirin, endamekî çalak bû. Piştî hatina itihadîyan li ser ferwerîya dewleta osmanî, ew weke serpereştê sektora perwerdehîyê hat erkdarkirin. Erka wî jî tirkkirina pergala perwerdehîyê ya dewleta osmanî bû. Di navbera şev û rojekê de, an ku piştî hilweşîna dewleta osmanî û serkeftina Şerîf Hisên di rizgarkirina Girava Erebî û Sûriyayê ji destê

osmanîyan de, El-Huserî ji berpirsê tirkkirina perwerdehîyê di dewleta osmanî de, veguherî û bû dîtanezanê neteweya erebî û vexwendarê yekîtîya erebî. Li gor wê; "Melek Fêsel" di danîna ferwerîya xwe li ser bingeha dîtaneya neteweya erebî de, xwe spart wî. Her wiha ew weke serpereştê erebkirina pergala perwerdehîyê ya li Sûriya û Iraqê, bi rêya erkdarkirina wî li ser wezareta zanîn û fêrkirinê, hat erkdarkirin.

Dîtaneya Satih El-Huserî di bageşeya xwe ya neteweyî ya erebî de, xwe dispart dîtanezanên neteweyî yên almanî, mîna "Yohan Fîxte, Van Dên Brûk, Martin Haydgir û Osvald Şpîngler". Êdî li ser El-Huserî, di dîtaneya wî de, ku li ser jiyana siyasî û çandî ya erebî li Iraq û Sûriyayê xwedî bandor bû, di warê destgirtina dîtaneya wî de ji alîyê hinek xet û tevgerên siyasî ve, mezinbûn rû dide. Heyanî radeya ku Mîşêl Efleq, ku damezirênerekî berz ê Partîya Beisê ya Erebî ya Sosyalîst e, di damezirandina partîya Beisê ya erebî de, xwe spasrt vê dîtaneyê.

Lê belê Zekî El-Ersûzî yê ku li ser qonaxên girêdana wargeha wî "Liwaya Iskenderûnê" bi Tirkiyayê ve, ku ew neçarî koçberîya ber bi hundirê Sûriyayê ve kir, govan bû; wî jî banga yekîtîya neteweyî ya erebî kir. Êdî; wî jî teza xwe der barê neteweya erebî, li bin bandora ramanên neteweyî yên dîtanezanên neteweyî yên Eropayê, nemaze yên alman û fransizî, di çaxa xwendina xwe ya li zanîngeha Sorbonê ya fransî de, danî. Tê de cihêrengîya neteweyên din ên li kêleka ereban li gelek welatên erebî dijîn, tune dîtin. Lewre; wî kildan û aşûr, bi rêya behaneyên vala û sosret, weke ereb didîtin.

"Gelo ma gelên ku di serdemên kevn de rahiştibûn alaya şaristanîyê, ne ji koka erebwarîyê bûn? Navên firewanan, her wiha yên kildan û aşûran ji navên erebî hatine veguherandin. An ku; Firewan ji şaxê (firiê sulale), kildan ji (Benû Xilde) û Aşûr jî ji (Benû Sewr) hatine… û hwd.

Zekî El-Ersûzî: "Netewya Erebî.. danasîn, name û pirsfgirêkên wê", 1958.

**Yekîtîya Xebata Neteweyî**

Zekî El-Ersûzî damezirênerekî Yekîtîya Xebata Neteweyî di sala 1933yan de bû, ku banga serwerî û serxwebûna erebî yê qutebir û yekîtîya erebî ya gelemperî kir, ku durişmeya "Erebwarî berî her tiştî" bilind kir. Yekîtîyê hewl da bi "Koma Niştimanî" re bikeve nava pêşbazîyê. Êdî bi partîya komunîst û partîya Sûrî ya Neteweyî ya Civakî re, kete nava hevrikîyê û ji alîyê padîşahê iraqî Fêsel ve hat destekkirin ku xeteke erebî ya alîgir jê re ava bike. Bi vê yekê rê amade dikir, da

ku xewna xwe ya avakirina padîşahîya erebî ya yekbûyî li jêr serwerîya xwe ava bike. Lê belê Yekîtî piştî mirina Melek Fêsel di îlona 1933yan de û mirina serekekî wê yê berz Ebdulrezaq El-Dendeşî di bûyerke trafîkê de sala 1935an, bi lez hilweşîya û piştre Koma Niştimanî sala 1936an xwe gihand ser ferwerîya Sûriyayê. Piştî vê yekê, lawazîya binyada rêxistinî ya yekîtîyê eşkere bû û yekîtî jî li beramberî paye û arandinên ku jê re hatin pêşkêşkirin, hilweşiya. Bi tevî vê yekê jî; gelek endamên wê yên ku di ramanên neteweyî yên tundrew têr bûbûn, xwe berdane nava partî û komên siyasî yên sûrî, mîna Koma Niştimanî ya ku piştî serxwebûnê dabeşî her du partîyan bû, "Niştimanî" û "Gel" û piştre jî Partîya Beisê. Êdî; giyanê mezinkirinê di nava meydanan de û di nava tevgerên siyasî yên erebî[2] de, belav bû.

Yekîtîyê danpêdana ku nijad û çandên pirreng li welatên erebî hene, red kir. Êdî; tekezî li ser nasnameya erebî tenê ku tekane ya welatê ereban e û li ser zimanê erebî weke zimanekî fermî tê de, kir.[3]

Klûba Mesna Bin Harise El-Şêbanî (navê srekekî ye ku wî sasanîyên faris di şerê Qadisîyê de têk birin) ku ji alîyê Melek Fêsel ve li Iraqê sala 1935an dihat destekkirin, xwedî bandorên ramanî û rêxistinî li ser yekîtîya xebata neteweyî li Sûriyayê ye. Berztirîn damezirênerê klûba El-Mesna "Samî Şewket" ku weke rêveberê perwerdehîyê li Iraqê sala 1838an hat erkdarkirin e. Êdî; bi balyozê almanî yê Iraqê re "Frêtz Groba" re li hev kir ku rêxistineke ciwanan a leşkerî ya tundrew bi navê "El-Fituwa" mînayî "Ciwanên Hilter" bide avakirin. Êdî ev yek, piştre li ser komikên mînayî wê di nava Partîya Beisa Erebî ya Iraqî de jî, bandor kir.

[2] Ji kesên ku ji Yekîtîya Neteweyan piştî gihandina Koma Niştimanî li ser ferwerîyê sala 1936an veqetiyane: Sebrî El-Eselî (xwe xwe li şûna Şamê da bijartin û bi rûniştekekê li ser lîsteyên Koma Niştimanî bi ser ket û bû wezîrê karûbarên hundirîn û dadmendîyê di salên çilî de. Di dema serxwebûnê de bû sekreterê partîya Niştimanî û bêtirî carekê serokê wezaretê di salên pêncîyî de. Di serdema Yekîtîya Sûrî-Misirî de bû cîgirê Cemal Ebdul-Nasir), Ednan El-Etasî (weke wezîrekî erkdarkirî li Tirkiyayê hat danîn, cihê xwe di nava wezareta xebatên giştî de destpêka serxwebûnê girt û ji damezriênerên partîya Gel e), Ferîd Zênedîn (weke sekreterê wezareta karên derveyîn, cîgirê sûrî di Neteweyên Yekbûyî û balyozê sûrî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkatê di salên pêncîyî de hat erkdarkirin. Her wiha serkêşîya rêxistina "El-Wehdewî El-Nasirî" li Şamê di dema jihevqetînê de cihê xwe girt), Dr. Reşîd El-Cabî (weke serokê gerînendetîya tenduristîyê li Şamê di ferwerîya Cemîl Mordem Begê Yekem de cihê xwe girt). Xalib El-Ezem (rêxistinek bi navê "El-Şebab El-Hemewî" da avakirin). Celal El-Seyid (ji Dêrza Zorê ye, damezirênerekî partîya Beisa Erebî ye). Ehmed El-Şerebatî (ji Yekîtîyê hat qewatiandin, çi ku alîgirê Koma Niştimanî bû. Bû wezîrê zanînan sala 1945an û wezîrê parastinê di destpêk ferwerîya piştî serxwebûnê de)..

[3] Partîyên siyasî yên sûrî yên veşartî û eşkere, Haşim Osman, Riyad El-Reyis a pirtûkan û weşangerî. Beyrût\Libnan 2001.

**Partîya Gel (Şeib):**

Di sala 1948an de piştî hilweşîna Hevgirtina Niştumanî û parçebûna wê li ser du alîyên rikberî hev (Partîya Gel a ku ji rûspîyên Heleb û Humsê pêk dihat û Partîya Niştumanî ya ku ji rûspîyên Şamê pêk dihat), hat damezirandin. Hin ji damezrînerên wê yên navdar ev bûn: Ruşdî Kîxya, Nazim Qudsî, Marûf el-Dewalîbî, Ebdilwehab Hemûd, Mistefa û Reşad Bermeda. Malbata Etasî pişta vê partîyê digirt.

Di navbera salên 1949-1958an de vê partîyê koma herî mezin di Encumena Cîgiran de girt û bi roleke mezin di avakirina hikûmeta sûrî ya wê demê de lîst; ew jî bi rêya hevpeymana wê bi Partîya Bas û Ixwanilmuslimîn re. Di navbera salên 1958-1961ê de di serdema Komara Erebî ya Yekbûyî de, ev partî weke partîyên din neçar ma xwe ji hev bixe lê piştî sala 1961ê careke din vegerîya desthilatê û serokê wê ``Nazim el-Qudsî`` ji bo serokatîya Sûrîyayê hat hilbijartin; ew jî piştî ku partî di hilbijartinên Encumena Cîgiran de (1961) bi ser ket. Di sala 1963yan de di encama derbeya Basê ya leşkerî de, ev partî bi dawî bû.

Ji alîyê ramanî ve, partî girêdayî şepêla neteweyî ya erebî ya tundrew bû. Di serdema wê de madeyên destûrê yên ku welat bi rengê neteweyî yê yekreng nîgar kirin, hatin darişt in. Vê partîyê mafên neteweyên din ên ne ereb tune kirin. Di serdema wê de biryarên nijadperest ên li dijî kurdan derketin. Di encama wan biryar û siyasetên nijadperest de, trajedîya kurdên bênasname li Sûrîyayê derket.

**Parîya Basê ya Erebî ya Iştirakî (sosyalîst):**

Piştî jihevketina Hevgirtina Karê Neteweyî (عصبة العمل القومي) Zekî el-Ersûzî di sala 1939an de Partîya Neteweyî ya Erebî li ser kavilê vê hevgirtinê ava kir. Lê tenê vê partîyê mehekê dom kir. Di sala piştre, Zekî projeya damezirandina partîyeke nû bi navê Partîya Bas a Erebî pêşkêş kir. Xwendekarên ku ji Iskenderonayê koç kiribûn, kakila partîya wî bûn. Lê wî nikarîbû bingeheke gelêrî ji bo partîya xwe ava bike û wê berfereh bike. Ji alîyekî din ve ew rastî rikberîyeke dijwar ji hêla Mîşêl Efleq ve hat. Mîşêl li gel hevalê xwe Selahidîn Bîtar Tevgera Vejandina Erebî damezirand (1940).

Efleq û Bîtar bi hev re li Zanîngeha Sorbon a Fransî xwend û bi ramanên neteweperestên elmanî bandor bûn (weke Ersûzî û Huserî). Piştî pevçûneke

ramanî bi Ersûzî re, Efleq zora wî bir û ew ji çarçoveya siyasî ya sûrî rakir û navê Tevgera Vejîna Erebî kir Besa Erebî (1943). Ji ber wê jî her tim têkilîya di navbera Efleq û Ersûzî de her tim nexweş bû. Ersûzî Efleq tewanbar kir ku wî navê partîya wê dizîye. Dawî jî paşmayên koma Ersûzî (yê herî navdar di nav wan de Wehîb el-Xanim bû) tev li koma Efleq-Bîtar bû û di civîna 1947an de navê hevgirtina wan bû Partîya Bas a Erebî.

Civînê destûra partîyê ya ku tije tundrewîya neteweyî bû, pesend kir. Wê eşkere tekez kir ku ew dixwaz desthilatê bi zorê desteser bike, neteweya erebî di jiyana giştî de belav bike, cihêrengîya nijadî û çandî red bike û hemûyan di çarçoveya erebîyetê de bipişêve. Di madeya /8/ a destûrê de wisa hatîye: ``Zimanê fermî yê dewletê û zimanê welatîyan ê ku di nivîs û perwerdeyê de danpêdan pê tê kirin, zimanê erebî ye``. Madeya /15/: ``Hevgirtin a tekane ye di dewletê de ku hemahengîyê di navbera welatîyan de dike û wan di yek çarçoveyê de dihelîne. Ew şerê hemû nijadperestîyên mezhebî, tîreyî, êlî, nijadî û herêmî dike.`` Madeya /45/: ``Kirasê erebîtîyê li hemû dîmenên jiyanê yên ramanî, aborî, siyasî, avahî û hunerî dike da ku neteweyê bi dîroka wê ya pîroz ve girê bide û wê han bide ku pêşerojeke baştir û pîroztir biafirîne.``[4]

***``Bas heya astekê mîratgira Hevgirtina Karê Neteweyî ye. Ew kakila rêxistinên Ersûzî û Efleq e…em nijadhezên hezkerên nazîbûnê bûn û me pirtûk û jêderên ramanên wê dixwendin, nexaim pirtûka Nîtşêh (wisa Zeradeşt gotîye), Fîxte (Hin gotar ji bo Neteweya Demokratîk) û Tişmepirlîn (Sazbûna Sedsala 19em) û Dareh (Iraq). Em yekem kes bûn ku me xwest em ``Kifahî`` (têkoşîna min) wergerînin. Kesê ku di wê serdemê de li Şamê dijîya, dizane çima me berê xwe dabû nazîbûnê. Ew hêzeke wisa bû ku tola xwe hiltanî. Jixwe kesê binkeftî ji kesê serkeftî hez dike lê em mezhebeke din bûn. Dibe ku kesê di rêgezên Partîya Neteweyî ya Erebî de kûr nebûbe, wina bide. Ev rêgez bûn rêgezên Partîya Bas a Erebî.``***

***Samî Cindî[5]: Bas, Dar el-Nehar- Beyrût 1969***

[4] Destûra Partîya Bas a Erebî ya Iştirakî.

[5] Samî el-Cindî yek ji basîyên kevin e, ew ismaîlî ye ji Selemîyê ye. Piştî derbeya Basê di 8ê adara 1963yan de bû Wezîrê Ragihandinê, paşê bû nûnerê Sûrîya li Fransayê lê paşê vegerîya Sûrîya û li wir ma heya ku hat sirgonkirin. Di pirtûka xwe ya bi navê Basê de behsa dîroka partîyê heya derketa pirtûkê (1969) dike.

Di sala 1952yan de Partîya Bas a Erebî bi serwerîya Efleq-Bîtar û Erebî Iştirakî bi serwerîya Ekrem el-Horanî (ku di sala 1950 de hat damezirandin, navenda wê li Hemayê bû û xwedî hêzdarîyekê di artêşê de bû) bûn yek û bi hev re Partîya Bas a Erebî ya Iştirakî damezirandin. Jixwe tê zanîn ku Partîya Basê berî ku bigihêje desthilatê piştî derbeya 1963yan, dixwest ramanên xwe yên tundrew pêk bîne. Wezaret û cihên ku Patîya Basê di wê qonaxê de wergirtin, hestîyar bûn û xwedî rolekê di guhertina bingeha civakê de bûn[6]. Her wekî wergirtina Mîşêl Efleq ji Wezareta Mearifan (navê berê yê wezareta Perwerde û Hînkirinê) (1949). Bi rêya wan cihên ku wergirtin, endamên basê milet li dijî kurdan han dida. Wan derewên mîna derbasbûna kurdan a bi dizîka li Cizîrê û metirsîya wan li ser Sûrîya, dikirin. Yek ji wan endamên Basê, evserê saloxger Mihemed Teleb Hilal bû ku di destpêka salên şêstî rêveberîya Ewlekarîya Siyasî li Hesekê wergirt. Wî nivîsek ji bo partîya xwe pêşkêş kir ku tê de bernameyeke pilankirî ya çewsandina gelê kurd li Sûrîyayê û çawanîya jinavbirina doza wan, xizankirina wan û jihevxistina wan hebû.

Piştî ku Basê hikmê Sûrîyayê bi dest xist, siyaseta xwe ya çewsandina kurdan ji hemû alîyan ve domand. Di encamê de hikûmeta Infîsalê di destpêka salên 60 de beşeke mezin a kurdan ji nasnameya sûrî bêpar kirin û tu mafên wan ên sivîlane nehiştin. Rêjîma Bas-Esed rêkarên erebkirinê zêde kirin, nehişt kurd karibin zevî û xanûberên xwe li ser navê xwe deynin û projeya kemera erebî di dawîya salên 60 û destpêka salên 70 dest pê kir. Di sala 1968an de Rêveberîya Qutrî ya Partîya Basê (piştî tevgera 23yê sibatê) komîteyek bi navê ``Kemera Erebî`` damezirand û serkirdeyê qutrî û neteweyî yê partîya Basê ``Ebdela Ehmer`` kir serokê wê.

***``Dema Partîya Basê hikum li Iraq û Sûrîya desteser kir, kêşeya kurdî afirand. Piştî 1963yan min dît ku basîyên iraqî êrîşî Kurdistanê kir û şer dest pê kir. Partîya Basê ya sûrî di wê demê de alîkarîya wan kir. Kêşeya kurdî li Sûrîyayê di sala 1962yan de di encama ``serjimartinê`` de dest pê kir. Di encamê de***

[6] Ekrem el-Horanî ji ber ku serokê Partîya Basê ya Erebî ya Iştirakî bû, girêbestek bi Edîb el-Şîşeklî re girê da û li gor wê bû wezîrê berevanîyê bi sedan kesên basî derbasî Fakulteya Cengê kir. Vê yekê bingekeke mezin a evserên basî ava kir û hişt karibin beşeke mezin a artêşa sûr bixin bin kontrola xwe û bibin cihê gef û desteserîyê li hember hikûmetên ku paşê hatin.
Jêder: Partîya Bas a Sûrî dîrokeke dagirtî derbeyên leşkerî û reşkuştin e. El-Tahir Ibrahîm, Malpera Navenda Çandê ya Lêkolîn û Belgekirinê/Libnan (Gotar).

***beşeke kurdan ji belgeyên welatîbûnê hatin mehrûmkirin. Jixwe tê zanîn ku kesê belgeyên welatîbûnê pê re tune be, mafên wî yên sivîlane jî tune ne. Di sala 1968an de (piştî tevgera 23yê sibatê) komîteyek bi navê ``Kemera Erebî`` damezirand û serkirdeyê qutrî û neteweyî yê partîya Basê ``Ebdela Ehmer`` kir serokê wê. Gerek e piştî binkeftina hezîranê (1967) kemereke ewlekarîyê li ser sînorê Colanê were avakirin da ku rê li ber Israîlê were girtin, lê em mat man dema me dît kemer li bakurê Sûrîyayê hat avakirin.***

***Çi wateya kemera erebî ye? Tê wateya guhertina navê gundên kurdî yên li ser sînor bi navine erebî. Ev yek jî tê kêşeyekê bi xwe re bîne. Di encamê de navên mîna Qehtanîye, Yarubîye û ji bilî wan derketin holê. Her wiha hin cotkarên kurd ji bo hundir hatin veguhestin û hin cotkarên ereb ên Reqayê li şûna wan hatin bicihkirin. Ev yek ne bi dilê wan ereban bû lê hatin neçarkirin. Gelek pere ji bo pêkanîna vê projeyê hatin xerçkirin.***

***Li gor min, armanca vê kemera erebî, peydakirina fitneyekê di navbera kurd û ereban de ku rêjîm sûdê jê wergire û fitneyekê di navbera kurd û Tirkîya de û kurd û erebên Iraqê de jî çêke. Jixwe ev yek pêk hat. Tenê armanca wê gurkirina kêşeyê bû. Vê projeyê barê kurdan giran kir û êş û azarên wan zêdetir kirin…``***

***Esed Mistefa: Hevdîtinek bi Kenala Erebîye re, bernameya Bîrdanka Siyasî, 2013[7].***

Di demekê de ku nakokî di navbera endamên bilind ên Partîya Basê de hebûn (ku wê bi derbeyeke leşkerî di 8ê adara 1963yan de gihaşt desthilatê), hevpeymana evseran (Selah Cideyid, Mihemed Umran, Hafiz el-Esed û Selîm Hatûm) ku endamên rêvebrîya qutrî ya Partîya Bas a sûrî bûn, karîbûn di sibata 1966an de damezrînerên partîyê (Efleq û Bîtar) ji nav bibin (ew her ku serwerên neteweyî yên Basê bûn). Di sala 1970yî de Hafiz el-Esed karîbû bi rêya derbeyeke leşkerî û piştî dûrxistina Mihemed Umran û Selah Cideyid, desthilatê desteser bike. Hafiz bi rêya madeya heştem a destûra 1973yan bihêle Partî bibe serwera welat û desthilata wê were xurtkirin. Vê yekê derfet da wî ku dewlet û civaka sûrî bi rê ve bibe. Her wiha Hafiz Zekî el-Ersûzî kir bavê giyanî yê partîyê û bi vî awayî qedir û qîmet lê vegerand. Wate, Hafiz nerînên wî yên tundrew û

[7] Esed Mistefa (wezîrê Çandinîyê yê sûrî di serdema Hafiz el-Esed de di navbera salên 1992- 2000) di Erebîye TV de di bernameya Bîrdanka Siyasî, xeleka çarem, 28ê îlonê 2013 (malpera ferîmî ya kenalê www.alarabiya.net)

neteweperest di desthilatê de bi kar anîn û bi rêya projeya nijadperest a bi navê Kemera Erebî, ramanên Ersûzî bi cih anîn. Her wiha wî hemû siyasetên çewsandinê li hember pêkhateyên neteweyî yên Sûrîyayê bi kar anîn.

Siyaseta neteweyî ya Partîya Basê xwe sipart têgeha ``urûbetê``. Wê angaşt kir ku ev têgeh bi qasî ku tê wateya şaristanî-mirovî, nayê wateya neteweyî-nijadî. Li gor vê siyasetê gerek e hemû hêmanên nijadî yên li welatê ereban (di nav de Sûrîya) di nav çarçoveya vê têgehê de werin helandin.

Ev siyaseta neteweyî ya yekreng di serdema Beşar de jî domand (jixwe wî piştî mirina bavî xwe di sala 2000an de desthilata Sûrîyayê wergirt). Tevî hin helwestên wî yên erênî yên girêdayî pêkhateya kurd li Sûrîyayê (her wekî daxuyanîyên wî yên ku piştî berxwedana gelêrî ya kurdî di avdara 2004an de dan ku li ser resenîya kurdan di Sûrîyayê de tekez kir. Her wiha wî nasnameya sûrî da wan kurdan ku weke kesine biyanî li Sûrîyayê dihatin dîtin) lê wî danpêdan bi mafên kurdan ên neteweyî, çandî, civakî û aborî nekir. Wî kurd paşguh kirin û nehişt herêmên xwe bi rê ve bibin an jî beşdarî sazîyên sûrî yên fermî bibin. Her wiha projeya Kemera Erebî domand û nehişt kurd karibin zevî û xanûberên xwe li ser navê xwe deynin. Wî çand û zimanê kurdî qedexe kirin û gelek siyasetên din li dijî kurdan meşandin.

Piştî berferehbûna şoreşa gelêrî ya sûrî ku di avdara 2011an de dest pê kir, kaxeza dawî ya Basê ya ku malbata Esed ji bo parastina desthilata xwe ya zordar bi kar dianî, weşîya. Vê şoreşê qasîya qirêjîya rêxistina Basê di belavkirina gendelî, bikaranîn, zordarî û çewsandinê de eşkere kir. Di encamê de Beşar ençar ma ji nû ve li Partîya Basê binihêre loma madeya ku dibêje partîya Basê serwera gel û civakê di destûrê de ye, betal kir. Danpêdan bi pirrengîya siyasî ya destûrî kir (destûra 2012), beşek ji avahîsazîya wê ya bilind û endamên birêvebirina wêguhert û xwe li hember nerîna giştî ya sûrî û cîhanî wisa da diyarkirin ku ew hewil dide Partîya Basê sererast bike. Lê di heman demê de tekez kir ku Bas dê weke lêvegereke ramanî ji bo siyasetên dewleta Sûrî bimîne. Lê ev hewildanên wî neçûn serî çimkî ew ne ewqasî cidî bû ku îdyolojîya neteweyî ya tundrew a Basê biguhêre. Ramana urûbetê weke perdeyeke îdyolojîk ma da ku neteweyên ne ereb ên li Sûrîyayê werin erebkirin. Wî jî angaşt kir ku cihêrengîya neteweyî û çandî ji bo xurtkirina têgeha urûbetê gelekî girîng e.

***``Di heman çarçoveyê de nakokîyek di navbera urûbet û pêkhateyên din ên neteweyî li herêmê de çêkirin. Ew dibîne ku ereb nijadek in û pêkhateyên din jî nijad in, îcar her kes weke hev e. ev tişt metirsîdar e çimkî ramana urûbetê di nijadan de sînordar dike lê di rastîyê de urûbet ne wisa ye. Urûbeta ku em her tim behsa wê dikin, urûbeta şaristanî ya giştî ye ku xwe dispêre cihêrengîya nijadî û olî. Ev jî tê wê wateyê ku urûbeta şaristanî tê wateya yekbûna pêkhateyan ne helandina wan. Ew tê wateya parastina her pêkhateyekê ji nasnameya xwe re di civaka me de. Çiqasî ev cihêregî di civaka sûrî de zêde bibe, urûbet bêtir dewlemend dibe û her ku ev cihêrengî belî bibe, ewqasî urûbet jî xurt û belî dibe…``***

***Beşar el-Esed: Civîna fereh a Komîteya Navendî ya Partîya Basê ya Erebî ya Iştirakî. 4ê gulana 2024.***

Dawî jî, piştî ketina rêjîma Beşar di kanûna pêşîn 2024 de, Partîya Basê û partîyên Enîya Niştumanî ya Pêverû (ya alîgira rêjîmê) û hemû rêxistin û sazîyên girêdayî wê ji hev ketin û êdî nema di bin tu navî de çêdibe ku ji nû ve ev partî werin avakirin.

Li gel tiştên navborî, di dîroka Sûrîya ya nû de gelek hêz û tevgerên siyasî yên din ên xwedî şêweyekî neteweyî û olî yên tundrew derketin holê. Tev jî bi roleke neyînî di xurtkirina tundrewîyê di civakên xwecihî yên sûrî de lîstin.

## EZMÛNÊN NÛJEN ÊN CÎHANÎ YÊN JI BO TÊKOŞÎNA LI DIJÎ DIYARDEYA QRIÊJÎYÊ Û ASTA GENGAZÎYA PÊKANÎNA WÊ DI WARÊ XWECIHÎ DE

**Amadekarî: Endezyara çandinîyê Îman Xelîl**

**Armanca vê lêkolînê:**

**1.** Sûdgirtina ji çareserîyên cîhanî yên pêkhatî: Venerîna li ser nûjentirîn stratejî û teknîkên ku çalakbûna xwe di li welatên cihêreng tekez kirine, ku alîkarîyê didin hilbijartina çareserîyên ji jîngeha xwecihî re guncav.

**2.** Dahurandina asta gengazîya pêkanîna wê: Hinek çarserî dibe ku di warê cîhanî de pir baş bin, lê belê pêdivîya wan bi hinek sererastkirina heye, heyanî ku li gor mercên jîngehî, civakî û aborî yên herêmê bin.

**3.** Başkirina pêngavên hînkirinê: Dikarin sûdê ji ezmûnên serkeftî bigirin, da ku pêngavên bandorker û xwedî dengvedan saz bikin, nemaze bi rêya destgirtina rêbazên zelal û rastîn.

**4.** Destekdayîna siyaset û stratejîyan: Encamên lêkolînê dikarin alîkarîyê bidin alîyên têkiildar ku biryarin hê bêtir baş û çalak di warê pêşxistina siyaseta têkoşîna li dijî qirêjîyê, bistînin.

**5.** Girêdayîna di navbera stratejîyên cîhanî û pêdivîyên xwecihî de: Têgihiştina têkilîya di navbera rûbirûbûyînên jîngehî yên herêmê û tişta ku di warê cîhanî de bi ser ketiye de, delîveyê ji bo guncavbûna çarserîyan vedike ku bi awayekî bêtir kirdar û rastî pêk tê.

### Beşa Yekem

### Pêşgotin:

Di heman demê de; ku jîngeh landika yekem û ya dawî ya jiyana mirov û çavkanîya ku jê binyadên hebûn û berdewamîya şaristanîya digire ye, mirov jî - bi handana pêşketinê û pşbazîya serdestîya teknîkî- êdî bi rêbazeke ku sînirên

gevsengîyê derbas dike, fişarê li ser samanên suriştî dike, ku di encamê de diyardeyin nîgeran û ya destpêkê jî qirêjîya jîngehî bi hejû cureyên xwe ye, derketine pêş.

Êdî; qirêjî nema bûye tenê ziyanek an jî encameke duyemîn a xebatên mirovî ye, lê belê bûye gefeke binyadî û heyanî ewlekarîya tenduristî, xwarinî û jîngehî ya milyarên mirovan digihêje. Her wiha hişyarîya sînordarkirina bingehên geşepêdana domdar dide; gava bi rêbazin kokî û gelemper neyê çarekirin.

Di roja me ya îro de; em di serdemekê de dijîn ku tê de rûbirûbûyînên qirêjîyê mîna bablîsokeke gerdûnî mezin dibin. Êdî; ba tijî qirêjî bûye, av bi avrêjîya kîmyewî ji hev ketiye, xak jî dewlemendîya xwe ji ber bikaranînên bêserûber ên tevkujeran winda dike û heyanî qerebalex jî, êdî bûye qriêjîyeke bi çavan nayê dîtin, lê jiyanê lawaz dike. di nava vî dîmenê nîgeran de, pêdivîyeke mezin pê çêbûye ku siyasetên jîngehî li ser asta cîhanê, di ber çavan re werin derbaskirin û li nimûneyên ku werin kolandin, ku bi rêbazên hem xwe dispêrin zanist û teknîkê ji alîyekî ve û ji alîyê din ve jî xwe dispêrin dadmendîya jîngehî û civakî, bi ser keftine.

Di van dehsalên dawîyê de; gelek ezmûnên cîhanî yên baş di mijara têkoşîna li dijî qirêjîyê de derketin pêş; çi ku li ser asta zagonsazîyên jîngehî, çi bi rêya teknîkên kesk an jî xurtkirina zanîna jîngehî û handana beşdarbûna civakên xwecihî. Li gor wê; hinek dewletan rêya veguhêzîya wizeyî ya ber bi çavkanîyên paqij ve rê girt, hinekan pergalên pêşketî yên birêvebirina gilêşê girt dest û hinekan jî jîrîya çêkirî ji bo çavdêrîkirina başbûna av û hewayê bi kar anî. Her wiha hinek bajaran jî berê xwe veguherîna têgihên aborî ber bi nimûneyên gilover û domdar ve.

Bi tevî serkeftina berçav a hinek ezmûnan jî, lê belê pirsa cewher ev e: Gelo ev nimûne dikarin di çarçoveyin cihêreng de werin dubarekirin? Ji bo jîngeheke xwecihî -wke rewşa herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê- ku tê de lawazîya sazûmanî û kêmbûna saman heyem, her wiha barekî giran ê pevçûnan heye, dê rewş çawa be? Di nava rûbirûbûyinin wiha de, gegaz e ku ezmûnên cîhanî veguherin delîveyin xilasîya jîngehî ya xwecihî, yan jî divê ji nava heman jîngehê werin sazkirin ku ji derve, bêyî ku ji rasteqînîya xwe dûr bikeve, sûdê wergirin?

Ev lêkolîn ne tenê ezmûnên serkeftî digire dest; lê belê hewl dide ku li qaseya gucavbûna wê ji bo pêkanîna wê di çarçoveyeke xwecihî de, ku bi

taybetmendîyênx we yên jîngehî, civakî û siyasî tê nasîn, venêre. Her wiha dixebite ku nêrîneke rexnegirî û çalak ji bo awayê veguhastina zanîna jîngehî ji dewletên cîhana pêşketî bo jînegehên herî hilweşiyayî bêyî ku bikevin dafa kopîkirin an jî maymayîbûnê, pêşkêş bike. An ku; bi rêya guncavbûna zana û rasteqîn a ku pêdivîyên civaka xwecihî di ber çavan re derbas dike û parêzîya jîngehî ya ji hundir ve xurt dike.

Li gor vê rêgezê; girîngîya vê lêkolînê derdikeve pêş, ku armanca wê dahurandina ezmûnên cîhanî yên di warê têkoşîna li dijî qirêjîyê de û asta guncavbûna wê ji bo pêkanîna di çarçoveya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê de, ye. Girîngîya lêkolînê ne tenê ji bo alîyê wê yê dîtaneyî tenê ye, lê belê heyanî asta kirdarî jî digihêje; ku çareserîyin dikarin werin pêkanîn û xwe dispêrin pisporîyên cîhanî û li gor derfetên xwecihî û rûbirûbûyînên rasteqînî, pêşkêş dike.

Em dikarin girîngîya lêkolînkirina ezmûnên cîhanî asta pêkanîna wan di warê xwecihî de, bi rêya van xalên li jêrê destnîşan bikin:

**1.** Sudgirtina ji pisporîyên berê û dûrketina ji şaştîyên berê:

Lêkolînkirina ezmunên berê yên têkoşîna li dijî qirêjîyê, derfetê ji me re vedike ku em sûdê ji stratejîyên serkeftî bigirin. Bi dest xwe re; dem û keda ji bo lêkolînkirina çareserîyin nû ku dibe ne çalak bîn jî, ji me re dabîn dike. Êdî bi rêya dahurandina siyasetên dewletên pêşketî yên ji bo rêgirtina li ber qirêjîyê, em dikarin rêbazên herî guncav ji rewşa xwecihî re, destnîsan bikin. Pê re jî şaştîyên ku hinek dewlet di dema pêkanîna bernameyên xwe yên jîngehî de ketinê, jê dûr bikevin.

**2.** Xurtkirina afirandinê bi rêya sûdgirtina ji nimûneyên serkeftî:

Ezmûnên cîhanî danegeheke mezin a çareserîyên afirîner ji bo cureyên cihêreng ên qirêjîyan, peyda dike; mîna teknîkên jinûveçêkirinê yên pêşketî, pergalên wizeya paqij û çareserîyên jîrîya çêkirî yên çavdêrîkirin û dahurandina qirêjîyan. Ev afirînerî dikarin bibin jêdera sirûşê ya ji bo pêşxistina çareserîyin xwecihî yên ku taybetmendîyên jîngeha xwecih di ber çavan re derbas dikin û sûdê ji delîveyên heyî bigirin.

**3.** Pêkanîna temamkirinê di navbera çareserîyên cîhanî û pêdivîyên xwecihî:

Ne hemû stratejî li her deverê dikare pêk were; ji ber ku dirûvê qirêjîyê û rêbazên têkoşîna li dijî wê, li gor arîgerên jîngehî, aborî û civakî yên her welatekî, ji hev cuda ne. Lewre; dahurandina asta pêkanîna çareserîyên cîhanî di çarçoveya xwecihî de, pêdivîya wê bi berçavxistina alîyên mîna binesazîyê, budceya terxankirî û asta amadebûna civakê ji wergirtina çareserîyên domdar re, heye. Mînak; teknîkên jinûveçêkirina gilêşên li dewletên pîşesaz, dibe ku li herêmên ku lê kargehên pêşketî tune ne, nikarîbe pêk were, lê belê dikare bi rêbazin hêsantir û çalaktir, pêk were.

**4.** Xurtkirina hevkarîya naveteweyî û veguhastina zanînê:

Bi rêya lêkolînkirina ezmûnên cîhanî, em dikarin hevkarîya di navbera dewlet û alîyên çalak ên di warê jîngehê de, xurt bikin. Êdî; rê vedibe ku zanîn werin veguhastin û pisporîyên der barê baştirîn çareserî bi hev weringuhartin. Ev hevkarisiyasetên jîngehî yên herî çalak li pêş dixe, ku dewletên werar dikarin ji piştevanîya dewletên pêşketî di biwarên mîna teknilojîya jîngehî û zagonsazîyan, sûde wergirin.

**5.** Başkirina çalakbûna siyasetên xwecihî:

Xwespartina siyasetên xwecihî yên xwe dispêrin ezmûnên cîhanî, başbûna stratejîyên jîngehî xurt dike û delîveyên biserkeftina wan zêde dike. Mînak; dewletên ku lê astên bilind ên qirêjîya hewayê heye, dikarin sûdê ji siyasetên dewletên ku di kêmkirina derketîyên gazên qirêj de bi ser keftine, sûdê wergirin. Ew jî bi rêya başkirina pergalên çûnûhatinê, bikaranîna wizeya paqij an jî sepandina bendên hişk li ser pîşesazîyên qirêjker.

**<u>Armancên lêkolînê:</u>**

- Dahurandina berztirîn ezmûnên cîhanî yên nûjen ên ji bo rêgirtina li ber qirêjîya jîngehî.
- Lêkolînkirina rewşa jîngehî ya heyî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û desnîşankirina cure û sedemên qirêjîyên berbelav.
- Nirxandina asta guncavbûna ezmûnên cîhanî ji bo pêkanîna wan di çarçoveyeke xwecihî de.
- Pêşkêşkirina qewîtîyin zanistî yên dikarin werin pêk werin; ku xwe dispêrin ezmûnên hevrûkirî û bi armanca xurtkirina domdarîya jîngehî li herêmê.

**Pênaseyên giştî:**

- Qirêjîya jîngehî (Environmental Pollution):

Guhertina ziyandar a ku di taybetmendîyên fîzyolojî, kîmyewî û biyolojî yên jîngehê de (ba, av û ax) de çêdibe ye, ku ji ber derbasbûna heyberin qirêj an jî wizeyeke ziyandar di nava wê de, çêdibe û bi xwe re ziyanê di hevsengîya jîngehî de çêdike û bi awayekî nerênî li ser tenduristîya mirov û giyandarên din bandorê dike.

**(Bernameya Neteweyên Yekbûyî ya Jîngehê 2021)**

- Geşepêdana domdar (Sustainable Development):

Geşepêdana ku pêdivîyên dema niha pêk tîne, bêyî ku bandorê li nifşên bê bike ku pêdivîyên xwe bi cih bînin. Ew jî bi rêya hevsengîya di navbera geşbûna aborî, parastina jîngehê û pêkanîna dadmendîya civakî de.

**(Rapora komîteya Brutland – Neteweyên Yekbûyî 1987)**

- Aborîya giloverî (Circular Economy)

Nimûneyeke aborî ye ku armanca wê kêmkirina tiştên windayî û qirêjkeran e; ew jî bi rêya jinûvebikaranîn, jinûveçêkirin, çaksazî û sazkirina berhem û proseyan. Ew jî bi rêbazeke ku dikare saman heyanî demeke dirêj di nava xûleke hilberînê ya girtî de, biparêze.

**(Ajansa Ewropî ya Jîngehê 2022)**

- Jîrîya çêkirî ya jîngehî (Environmental AI)

Bikaranîna teknîkên jîrîya çêkirî ye; mîna fêrbûna makîneyê, dahurandina daneyên mezin ên ji bo çavdêrîkirina qirêjîyê, pêşbînîya guherînên jîngehî û başkirina mezaxtina samanên suriştî.

**(Wang et al. 2020)**

- Xwedîderketina jîngehî ya xwecihî (Local Environmental Respone)

Komeke siyaset û rêkaran e; ku alîyên xwecihî ji bo rûbirûbûyîna li dijî pirsgirêkên jîngehî di çarçoveya xwe ya erdnîgarî, aborî û civakî ya taybet de, distîne; çi eger ev rêkar rêxistinî yan teknîki yan jî civakî bin.

- Siyasetên jîngehî (Environmental Policies)

Plan û zagonsazîyên ku ferwerî yan jî desteyên naveteweyî datînîn in; ku armanca wan birêxsitinkirina samanên surişţî, kontrolkirina qirêjkeran, pêkanîna hevsengîyê di navbera çalakîyên aborî de û parastina jîngehê ye.

**(Rêxistina Hevkarîya Aborî û Geşepêdanê OECD, 2020)**

**Beşê Duwem**

***Beşê Duyem: Di Rûberîya Qirêjîyê De Pêşkêşkirina Ezmûnên Cîhanî Yên Nûjen***

Di serdemên borî de guherînên mezin di zanistîya jîngehî de ya ji alîyê gelek dewletan ve hatin dîtin, vê jî bandoreke çalak li pilan û kiryarên bergitîya qirêjîyê kir, êdî xuya kir ku stratîcîyên peyçûn li gor rewşa aborî, sîyasî û erdnîgarîya her dewletekê cûda ne, lê piranîya van ezmûnan di erêkirina serûberîyên zanistî yên mayînde de, hevtekûzî di navbera yasadayîn û teknolocîyê û beşdarîya civakî de; hecvbeş bûn.

1:2 <u>Ezmûna Ewrûpî: Çarçûva yasadayîna hevtekûz û aborîya jîngehî</u>

Dewletên Yekîtîya Ewrupî di erêkirina sîyasetên jîngehî yên pêşketî de, yek ji pêşengên cîhanî ne. Jixw Yekîtîyê, Rêkeftina Kesk a Ewrûpî bi rêxist ku armanca wê ew bû ku di sala 2050 de bigihêjin serbixweya karbonî. Ev çarçûve ji sîyasetên hevtekûz kêmkirina belavkirîyan, paşkirina rêvebirina bermayîkan û piştgîrîya wizeya dondar.

Li Almanîyayê ezmûna aborîya bazinî yek ji berztirîn ezmûnên serkeftî ye ku bermayîkên malan bi şêweyekî baldar ji hev cûda dikin û beşekî mezin jê vedughêzin wizeya kehrebe û kelupelên ku ji nû ve tê bikaranîn. Li Holanda karnameyeke niştimanî hate danîn da ku di sala 2050 de bighên sifir (0) bermayîk, ew jî bi rêya nûsazkirina berhem û handana pêşeyên jinûvebikaranînê.

Di serdemên borî de gelek dewletên pêşketî guherînên mezin di sîyasetên xwe yên jîngehî de kirin, ew jî li gor nerînên giştî û bi lihevkirineke di navber yasadayînên zeb û dijwar û  handerên aborî de.

Jixwe li Almanîya jî stratîcîya "Wizeya nûjen" (Energiewende) nimûneyeke pêşenge ji bo veguhestina ji wizeya berdîneyî ber bi jêderên nûjen ve ku para ba û wizeya rokê di têkela kehrebeyê debilind bû ku ji kêmî % 10 di sala 2000 de bêtirî %40 di sala 2022 de, ew jî bi saya piştgîrîya ferwerî ya hişmend, ew jî

bi girêbendên piştgirîya nirxê (Feed-in Tariffs) û mispgerîyên demdirêj ji veberhênanan re.

2:2 <u>Dewletên Skendenavî: Hevtekûzîya sîyasetan, perwerde û beşdarîya komelayetî</u>

Siwêd û Norwêy ji dewletên serkeftî ne yên ku bi şêweyekî berbiçav di dorpêçkirina astên qirêjîyê de, ew jî bi saya tevdana di navber yasadayînên zeb û hişyarkirina civakî de.

Li Siwêdê %99 ji bermayîkan têne jinûvebikaranîn û ji destpêka salên notî de, bace li ser belavkirîyan sepandin, wê hişt ku pîşe bi veguherîna hêdhêdî ber bi jêderên wizeyeke paqij biçe.

Her wiha perwerdeya jîngehî derbasî dibistanan tê kirin ku dihêle çanda mayînde ji zaroktî ve were çespandin.

Norwêy jî bi şêwazekî hinbiz di veguhestina kehrebeyê de veber anî ku rêjeya erebeyên kehrebeyê yên tomarkirî salane % 70 ji hejmara erebeyên nûjen derbas dike, ew jî bi saya handerên baceyî û jîngehî, binesazîya guncav û helwestên bêpere ji erebeyên kehrebeyê re.

3:2 <u>Japonya: Teknolocîya di rajeya jîngehê de</u>

Japonyayê sûd ji astengîyên ku rûberî wê ya piştî cenga cîhanî ya Duyem hatine dît ku ew jî bû şêwazeke pêşeng di afrandina jîngehî de.

Pilana 3Rs(Reduce, Reuse, Recycle: 3B(Kêm-Bikaranîn, dubara-Bikaranîn, jinûve-Bikaranîn) ji bo rêvebirina jîngehî ya Japonyayê ye ku bi şêweyekî zeb li ser astên kesan û kargehan tê bikaranîn.

Bajarên Japonyayê karîbûn ji veguherîna cihên bermayîkan bikin rûberine kesk û seyrangehên bajartîyê, her wiha gelek fîrmayên Japonyayê teknîkên cûdakirina bermayîkan û çarkirina wan bi rêyên baldar bi pêş xistin û bikaranîna nêt û bîrbûna çêkirî, alavên çavdêrîya başbûna ba û avê afirandin.

4:2 <u>ji bo jinavbirina qirêjîyê rola afrandin û bîrbûna çêkirî</u>

Bi pêşketina teknolocîya ji bo rûbirûbûna qirêjîyê bêtir palpişt li ser çareyên hejmarî têne kirin, ku gelek bajarên bîrbir pergalên hestkarîyê ji bo şopandina qirêjîya av û hewayî, ew jî bi şêweyekî gav bi gav, êdî dihêle ku biryarên yekser werin standin.

Wek nimûne, li Çînê bernameyên bîrbir ku girêdanekê di navber bikarhêneran û toreyên jinûvebikaranîna gerandina bi pêş xistin, wê jî hişt ku bermayîkan ku ji jinûvebilaranînê guncav in, werin komkirin. Li Singefûra jî da ku pêşbînîyê li ser jêderên qirêjîyê bikin û tîmên saxbîrîyê ber bi herêmên gengaz ve bişînin, bîrbûna çêkirî tê bikaranîn.

Her wiha xewarizmîyên fêrbûna jixweber ji bo başkirina sazkirina rawestgehên çarekirinê, kêmkirina bikaranîna wizeya tê de û dahûrandina agahîyên peykên çêker ji bo şopandina Qirêjîya avî yan çandinîyê

**Beşê Sêyem: Dahûrandina Rewşa Jîngehî Li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê**

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê astengîyên jîngehî yên zêdetir hene, beşeke mezin jê vedigere dehsalên ji piştguhkirina geşepêdanê, pevçûnên çekdarî û paşketina rajeyên sereke, ev jî bi şêweyekî nerênî bandor li rewşa jîngehê vegerîya û hişt ku hemû şêweyên qirêjîyê di bajar û gundan de peyda bibin. Êdî em ê di vê beşê de hewil bidin ku dahûrandineke bêalî ji berztirîn şêweyên qirêjîyê re di herêmê de pêşkêş bikin, ew jî tevî ronîkirina karîgerên bibandor û kedên heyî ji bo rûbirûya wê.

3.1: <u>Cûreyên qirêjîya balavkirî</u>:

3. 1. 1: Qirêjîya ba:

Qirêjîya ba di bajar û bajarokên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de, ji pirsgirêkên jîngehî yên herî pir e, bi taybetî di herêmên ku çalakbûneke pîşesazî û tevgereke hatûçûnê ya hinbiz tê de hebe. Jixwe ardîşên kehrebeyê yên ku bi sotemeniyeke nebaş dixebitin, qseyên mezin ji gazên biziyan belav dikin, wek kurkûtduoksîd û oksîda azotê ku sedemên nexweşîyên henaseyî yên demdirêj; bi taybetî di nav zarok û temenmezinan de.

3. 1. 2: Qirêjîya avê:

Herêm têkçûneke dijwar di cûreya avê de lê peyda dibe, çi li ser asta ava vexwarinê yan jî ava avdanê, ew jî vedigere gelek sedeman, hin jê jî ev in: Dûbarekirina qutbûna avê, lawazbûna toreyên karêzê û bikaranîna bîrên qirêj an yên ne di bin çavdêrîyê de ne. Her wiha valakirina nebirêkûpêk ji bermayîkên ron û pêşesazîyê re, bû sedema Qirêjîya çeman û herikînên avî, wek çemên Belîx û Cerahê.

3. 1. 3: Qirêjîya axê:

Bikaranîna pir û nebirêkûpêk a kêzikkuj û gubreyên kîmyayî, hişt ku berhemdarîya axê lawaz bibe û qirêjîyên metirsîdar kom bibin, bi taybetî li herêmên wek Reqa û Hesekê yên ku bi şêweyekî bingehîn xwe dispêrin çalakîyên çandinîyê. Her wiha avêtina nebirêkûpêk ji bermayîkan – bi taybetî bermayîkên bijîjkî – Qirêjîya axê pirtir dike û bandorê li ser çakîya berhemên çandinîyê dike.

3. 1. 4: Qirêjîya Dengî:

Di salên borî de rêjeya qirêjîya dengî gelek zêde bû, ew jî ji encama belavbûna mezin a ardîşên kehrebeyê û tunebûna çavdêrîyê li ser dengên denggiran di bazarû boneyên giştî de, êdî vê jî hişt ku bandoreke nerênî li ser tenduristîya derûnî, baldarî û vehesîna giştî ya niştecîyan re bike, bi taybetî di herêmên dagirtî de.

3. 2: Karêgerên ku bandorê li qirêjîyê dikin:

3.2.1: Guherînên avhewayî:

Li herêmê ji salan ve kêbûneke berçav di rêjeya baran û zêdebûna pileyên germahîyê de peyda bû, êdî vê hişt ku axê zuha bibe û rûberên kesk kêm bibin, êdî jîngeha xwecihî ji çi qirêjîyeke din, lewaz be.

3.2.2: Çalakîya pêşesazî û çandinîyê yên nebirêkûpêk:

Tunebûna pergalên çavdêrîya jîngehî li ser çalakîyên pêşezaî û çandinîyê, hişt ku ev çalakî bibin jêdereke sereke ji qirêjîyê re, êdî kargehên biçûk wek guvajgehên zêtûnan û karxaneyên pêşezaîyê, piranîya wan bê pergalên çarkirina bermayan in. Her wiha zindîkujên çandinîyê bi şêweyekî bêrêkûpêk bêyî şîretên zanistî û çavdêrîya tenduristîyê; tên bikaranîn

3.2.3: Rewşa civakî û aborî:

rêjeya bêkarîyê bi şêweyekî ne yekser bandorê li rewşa jîngehîyê dike ku gelek ji niştecîyan êzing û sotemenîyên nebaş, ji xwe re dikin jêdera wizeyê, her wiha lawazbûna binsazîyê, ji bo komkirina bermayîkan û bi rêyên ewle avêtina wan, dibe asteng.

3. 3: Xebatên xwecihî di rûbarîya qirêjîyê de

Tevî lawazbûna derfetan jî, di salên borî de hin destpêşxerî û xebatên sînordar ên ji bo parastina jîngehê hatine kirin.

Hin jê ev in.

- Pêngavên hişyarî ya dibistanî û civakî ku rêxistinên xwecihîyên nefermî pêk tînin.
- Pirojeyên biçûk ji bo paqijkirina çem û kolananan û çandina daran li hin herêman.
- Destpêşxerîyên kesane ji bo rawestandina bikaranîna lekê an jî jinûvebikaranîna hin bermayîkan.
- Hewildana encûmenên xwecihî li hin bajaran ji bo rêxistinkirina pêngavênkomkirina qirêjê yan dîyarkirina cihên bermayîkan.

Lê ev ked dimînin kedine kesane û bêyî çarçûveyeke giştgî ya sazîbûnê, lewre bandora wê di demên dûr de sînordar in.

**Beşê Çarem: Asta Derfeta Pêkanîna Ezmûnên Cîhanî Li Herêmêm Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê**

Dahûrandina ezmûnên navneteweyî yên serkeftî li dij qirêjîyê, derfeteke dewlemende ji wergirtina waneyên guncav pêşkêş dike û nirxandina pêkanîna wan di jîngehên xwecihî de, ew jî berçavgirtina warên aborî, civakî û sîyasî.

Armanca vê beşê ew e ku rewşa jîngehî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi tiştên ku li hin dewletên din pêkhatine hevrû dike û astengî û derfetên ji bo pejrandina çareserîyên mayinde di nehiştina qirêjîyê de, destnîşan bike.

4.1: Hevrûkirinek di navber jîngeh û aborîyê de:

4. 1. 1: Çarçûveya navneteweyî:

Hin dewletan wek Siwêd, Almanîya û Japonya, destkeftên mezin di warê daxistina rêjeya qirêjîyê de pêk anîn, ew jî bi saya peydabûna hêmanên sereke, wek:

- Hebûna vîneke sîyasî bi hêz û berdewam.
- Zagûnsazî û yasadayînên jîngehî yên zeb û çalak.

- Veberhênanên mezin di binesazîya jîngehî û teknolocîya kesk de.
- Têgihîştin û hişyarbûna jîngehî ya bilind li cem welatîyan.
- Hevkarîya di navber ferwerî û civaka sivîl û beşa taybet de.

4. 1. 2: Çarçûve xwecihî:

Li beramberî wê, herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ev tişt hene:

- Binesazîyeke lawaz û ji şer û piştguhkirinê ziyan xaweiye.
- Lawazbûna jêderên diravî yên ji veberhênanên di jîngehê de berdest in.
- Tunebûna zagûnên jîngehî yên çalak û çawanîya çavdêrî û lêpirsînê.
- Kêbûna astên têgihiştina jîngehî di nav welatîyan de.
- Jîngeheke sîyasî ya nearam û perçekirineke karîgêrî.

Tevî van cûdahîyan jî, lê warên sînordar heye yên ku pêkane wek hin nimûneyên navneteweyî werin kirin, ew jî piştî ku bi rewşa xwecihî re were guncavkirin.

**4:2 – Astengîyên Pêşbînkirî li Beramberî Pêkanîna Çareyên Cîhanî**

- **Lawazîya Perdanê û Piştgitîya Sazker:**

Jixwe jêderên darayî yên kêm, ji kelemên herî giring ên li beramberî pêkanîna teknolocya jîngehî an jî sazkirina hin pergalên hevtekûz ji bo birêvebirina avêtek û avê ye.

- **Nebûna Zagonên Jîngehî:**

Jixwe nebûna zagonên sepîner an jî navgînên çavdêrîyê yên serbixwe, dihêle ku pêkanîna kiryarên xweparastinê an spandina sizayan li ser qirêjkeran; zor be.

- **Binesazîya Lawaz**:

Ezmûnên wek jinûvebikaranîn an destkarîya li avê, binesazîyekê dixwaze ku niha li piranîya deverên herêmê peyda nabe.

- **Bîrbûna Civakî ya Kêm**:

Bê guman kêmbûna çanda jîngehî li cem jimareke baş ji welatîyan, xwesteka wan a hevkarîya pêşxerîyên guhertinê sînordar dike, ew jî tevî ku di asta teknîkî de bi bandor bin jî.

- **Jîngeha RAmyarî û Ewlehî ya Lawaz**:

Nakokîyên hundirîn û pirbûna alîyên birêveber, bi awayeke nerênî bandorê li ser pêkanîna çi pilaneke jîngehî ya hevgirtî û hedan, dike.

**4- 3**: **Pêkanîya Pejrandina Hin Nimûneyên Afrîner ên Xwecehî**:

Tevî astengîyan jî, lê derfên rastî hene ku hin nimûneyên serkeftî werin pêkanîn, lê dive li gor derfetên xwecehî bin.

**4- 3-1: Aborîya Zîvirok a Erzan**:

Di çarçûveya hin pêşxerîyên civakî yên hêsan (wek çêkirina gubreya lebatî ji pêmayên xwarinê an jî li ser asta xwecehî jinûvebikaranîna lastîkê), jinûvebikaranîna avêtekan were handan.

**4- 3-2: Çareyên Ku Xwezayê Bingeh Digire:**

Wek darçandina qiraxên çeman an avakirina bexçeyên jîngehî ku xwe dispêre ava gewr, ew jî çareyên bibandor û erzan in.

**4- 3-3: Perwerdeya Jîngehî ya Civakî**:

Em dikarin nimûneyên hişyarîya serkeftî li dibistan û navendên çandê belav bikin, ew jî bikaranîna amûrên hêsan û li gor çandê û bi hevkarîya rêxistinên civaka sivîl.

**4- 3-4: Xurtkirina Nanavendî ya Birêvebirina Jêderan:**

Wek nimûneyên Skendînavî, bi rêya pergalên çavdêrîyê û zagonên xwecehî yên nerm, em dikarin encûmenên xwecehî li ser birêvebirina jêderên jîngehî perwerde bikin.

**4- 3-5: Ji Teknîkên Jêderên bêsînor Sûdwergirtin:**

Wek bikaranîna pêkanînên xwecehî ji bo çavdêrkirina avêtgehan an jî nexşeyeke hevkar a qirêjîyê; we jî bêyî ku pêdivî bi avahîyên binesazî yên mezin hebe.

Hêjayî gotinê ye ku pêkanîna ezmûnên cîhanî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêkan e, lê pêwîst e ku nimûneyên guncav werin bijartin ku gav bi gav bi beşdarîya civakî were destpêkirin û pêkanîna astekê baş ji aramîya karîgêrîyê, ew jî tevî piştgirîya alîyên navneteweyî û rêxistinên jîngehî.

**Beşa Pêncem**: **Qewêtî û encamgirtin**:

Ev lêkolîn bi pêşkêşkirina komeke qewêtîyên ku xwe dispêrin lêkolînkirina ezmûnên cîhanî yên dij qirêjîyê û hevrûkirina wê bi rastbînîya jîngehî ya li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, bi dawî dibe.

**5-1: Qewîtî:**

**5-1-1: <u>Li Ser Asta Sazkerî û Karîgêrîyê</u>:**

- Amadekirina stratîcîyeke jîngehî ya hemûtî li ser asta herêmê ku nerîneke demdirêj û armancine qonaxî yên tên pîvandin; bihewîne.
- Sazkirina zagonên jîngehî yên xwecehî ku kiryarên qirêjîyê qedexe dikin û bingehên çavdêrî û lêpirsînê datînin, ew jî bi beşdarbûna hosteyên jîngeh û zagonê.
- Xurtkirina rola encûmenên xwecehî li ser çavdêrêya jêngehî, ew jî bi rêya avakirina karînên wê û peydakirina amûrên pêwîst ji bo li ser avêtek û jêderên qirêjîyê çavdêrî were kirin.

**5-1-2: <u>Li Ser Asta Hostetî û Alavî</u>**:

- Ji bo jinûvebikaranîn an destkarîya seretayî ji avêtekan re ku amûrên û teknîkên erzan tên bikaranîn, destpêkirina pirojeyên afrîner ên biçûk.
- Sûdgirtina ji teknolocîya bêsînor, wek pêkanînên jîngehî ji bo çavdêrkirina li qirêjîyê an gilîkirina li binpêkirinên jîngehî.
- Handana li ser çandinîya jîngehî bi rêya hişyarîya ji bo bikaranîna biewlehî ji zindîguj û gubreyê û pêşkêşkirina piştgirîya teknîkî ji bo berdêlên lebatî.

**5-1-3: <u>Li Ser Asta Perwerde û Civakê</u>:**

- Tevlîkirina çanda jîngehî di rêbazên xwendinê de û xurtkirina çalakîyên komên dibistanan ên têkildarî jîngehê.
- Destpêkirina pêngavên hişyarîyê yên gelerî yên gerrek ku hemû beşên civakê armanc digirin, ew jî bi rêya ragihandina xwecehî û navgînên pewendîya civakî.

- Piştgirîkirina pêşxerîyên ciwan û civakê yên ku di warê wize, darçandin û jinûvebikaranînê dixebitin, ew jî bi rêya danên biçûk an jî beşdarbûnên bi rêxistinên nefermî.

**5-1-4: <u>Li Ser Asta Navneteweyî</u>:**

- Bi armanca veguhestina zanînê û pêkêşkirina alîkarîya hostetî û dareyî, avakirina beşdarbûnên bi rêxistinên navneteweyî yê ku di xebata jîngehî de hosye ne.
- Sûdgirtina ji nimûneyên kesk ên cîhanî ku piştgirîya herêmên şer û guherîna avhewayî dikin, ew jî li gor pilanên diyar û bibelge.

**5-2: <u>Encamgirtin</u>:**

- Di rewşa tunebûna pilanên jîngehî yên hemûtî de, qirêjîya jîngehî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, metirsiyeke pirtirbûyî li ser tenduristîya giştî, çandinî û jêderên xwezayî çêdike.
- Ezmûnên cîhanî diyar dikin ku dibe qirêjî ta asteke mezin were kêmkirin, ew jî dema ku vîneke ramyarî, avanîyeke zagonî û civakeke bîrwer hebin.
- Pêkanîna van ezmûnan gengaz e, bi taybet çareyên erzan û pêşxerîyên civakî.
- Serkeftina çi stratîcîyeke jîngehî li herêmê, bi hevtekûkirina xebatên di navbera rayedarên xwecehî û civaka sivîl û beşdarên navneteweyî, girêdayî ye.
- Perwerdekirina jîngehî û derfetdayîna ji encûmenên xwecehî re, xala destpêkirina pêvajoyeke bibandor ji bo avakirina bîrbûn û bersivdayîneke jîngehî ya domdar e.

**Beşa Şeşem**:

**<u>Çanda Civakî ya Têkilkirina Bi Jîngehê re Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê</u>.**

Bê guman çanda civakî, karîgereke sereke ye ku bandorê li pêkanîna pilanên jîngehî dike ku bawerî û kevneşopî roleke sereke di sazkirina reftarên kesan ên beramberî jîngehê de, dilîze. Êdî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ku alozîyên ramyarî û aborî bi lawazîya binsazîyê re digihên hev; nîşaneyên taybet ên

çandeke jîngehî û civakeke xwecehî ku li dij qirêjîyê bi rêbazên kevin derdikevin pêş ku di reftarê xwe yê jîngehî de, xwe dispêre zanebûnên pêşmayî û carnan jî xwe dispêre pêşxerîyên kesetî.

Ev beş tekezîyê li ser dahûrandina cewherê çanda jîngehî li vê herêmê, girêdana wê bi arîşeya qirêjîyê û asta wekhevî an dijberîya wê bi alîyên cîhanî yên nû yên li dij qirêjîyê; dike.

**Yekem: Taybetîyên Giştî Yên Çanda Civakî Ya Jîngehî Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê**

Çanda jîngehî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, xwedî hin taybetîyên sereke ne:

1- Şêweya gundewarî û çandinî ya kevin: Ew jî ku xak jêdera sereke ya jiyanê ye, ji xwe welatî rêbazên kevin di çandinîyê de bi kar tînin ku bi piranî teknîkên hevalê jîngehê peyde nabin.

2- Lawazîya bîrwerîya jîngehî ya sazker: Ew jî ji ber tunebûna bernameyên fêrkirinê yên fermî an jî pêngavên hişyarîyê yên hemûtî ku pirsgirêkên qirêjî û metirsîyên jîngehî digirin dest.

3- Pêşayî ya pêdivîyên jiyanî yên rojane ye: Welatî ji nerîneke qezenckirinê ya yekser bi jîngehê re didin û distînin ku parastina jîngehê li beramberî jarî, kêmbûna jêderên sereke û bêaramîyê, ne pêşayî ye.

**Duyem: Xuyangên Reftarê Jîngehî ya Civakî ya Girêdayî Qirêjîyê**:

1- <u>Avêtina ketûberî ya avêtekan</u>:

Avêtek li cihine vekirî têne şewitandin an jî di çem û herikînên avê de têne avêtin ku av, hewa û axê qirêj dibin.

Jixwe çawanîyeke bibandor a başqekirin an jinûvebikaranîn tune ye, her wiha rola rêxistinkirinê ya sazîyên xwecehî tune ye.

2- <u>Bikaranîna jêderên wizeya qirêj</u>:

Jixwe ji ber kêmbûna kehrebeyê û bilindbûna nirxên sûtemenîyê, welatî xwe şewitandina lek an çerxan an tepan , ew jî qirêjîyeke metirsîdar ji ji hewayê re çêdike.

Êdî berdêlên wizeyeke paqij a liberdest û bernameyên ku bikarnerên wan handan bikin; tune ne.

3- Çandinîya ku heyberên kîmyayî bi kar tîne:

Bêyî çavdêrî an zanîneke zanistî, gubreya kîmyayî û zindkuj tên bikaranîn, ew jî dibe sedema qirêjîya ava binerd û paşketina axa çandinîyê.

**Sêyem: Bandora Çanda Civakî Li Ser Xebatên Li Dij Qirêjîyê**:

Tevî ku hin pêşxerîyên civakî yên darçandinî an paqijkirina taxan heye jî, lê ji ber nebûna çandeke jîngehî ya zanistî û birêkûpêk, dihê ku:

1- Lawazîya bersivdayîna bernameyên jîngehî yên ku rêxistinên civaka sivîl an desteyên xwecehî pêk tînin.

2- Astengîya pêkanîna ezmûnên cîhanî yên nû yên li dij qirêjîyê, ew jî ji ber cûdahîya di navbera zanebûna zanistî û raftarê xwecehî de.

3- Sînordarîya hevkarîya civakî bi pilanên jîngehî re, ew jî bi sedema ku welatî bawer dikin ku jîngeh ne pêşaya wan ya jiyanî ye.

**Çarem: Mînakên Li Ser Pêşxerîyên Çandî Yên Xwecehî Yên Erênî**:

Tevî astengîyan jî, hin kirdarîyên erênî hene ku dibe li ser were avakirin:

- Jinûvebikaranîna heyberan di pîşeyên destî an di pîşeyên malê de.
- Pêngavên paqijîyê yên xwebexş li hin bajaran, wek Reqa û Qamişloyê.
- Komxebatên zarokan ên ku rêxistinên xwecehî kirine, ew jî ji bo fêrî jinûvebikaranîna jîngehî bibin.
- Bi mebesteke aborî an zanîneke zikmakî, li hin gundan xwe dispêrin gubreyên lebatî.

Ev pêşxerî didin xuyakirin ku zemîneke civakî ya dibe pêş bikeve heye, ew jî dema ku bi pilanên zana ku di navbera rastbînîya xwecehî û hostetîya cîhanî girê dide; werin piştgirîkirin.

**Pêncem: Hevrûkirina Bi Ezmûnên Cîhanî re**:

Dema ku em vê çandê bi tişta ku li dewletên wek Alemanya, Japonya û Siwêdê tên bikaranîn, em dibînin ku:

| Xal | Dewletên Pêşketî | Herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê |
|---|---|---|
| **Pegala Jinûvebikaranînê** | Pêşketî û zagonî sepandî ye | Wek ku tune ye |
| **Pêngavên Hişyarîyê** | Birêkûpêk e û ji zarokatîyê de dest pê dike. | Sînordar û demdemî ye |
| **Wizeya Paqij** | Pir tê Bikaranîn | Nayê peydakirin |
| **Reftarê Civakî** | Bi çandeke jîngehî ya bilind tê piştgirtin | Li gor pêdivîyên jiyanî ye |

Êdî pêdivî bi çespandina ezmûnên cîhanî yên nû heye, ew jî bi awayekî ku li gor jîngeha çandî, civakî û aborî ya xwecehî be; ne ku jibergirtna nimûneyên amadekirî be.

**Şeşem- Qewîtîyên zanistî ji bo xurtkirina çanda jîngehî û girtina rê li ber qirêjîyê:**

1. Têgihiştina jîngehî bi pêdivîyên mirovan ên rojane ve were girêdan; her wekî şîrovekirina têkilîya di navbera çop û nexweşîyên belavbûyî de.

2. Derbaskirina têgihên jîngehî bi awayekî kirdarî di nav biranşên xwendinê û çalakîyên dibistanê de.

3. Handana beşdarîya civakî di bernameyên paqijî û ji nû ve bikaranîna çopê; ew jî bi rêya handerên madî û manewî.

4. Avakirina hevkarîyê di navbera şaredarî û rêxistinên naveteweyî de da ku berdêlên enerjîyê yên paqij ku lêçûnên wê hindik in, werin peydakirin.

5. Bikaranîna malperên civakî yên xwecihî (her wekî gotarbêj, mamosta û kesên bibandor) di pêngavên agahdarkirinê yên bikêr û bisûd.

Mirov bêyî rewşa siyasî, civakî û aborî ya ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dijîn, nikare li çanda civakî ya ku danûstandinê bi jîngehê re dike, binihêre, çimkî ev çand hejmarek reftarên neyînî diyar dike ku di encama

pêwîstî û xizanîyê de û hejmarek reftarên erênî yên kevneşopî ku dikarin bibin bingeha guhertina pêşerojî, derketine holê. Ji ber wê jî pêkanîna pêşketinê di girtina rê li ber qirêjîyê li van herêman, hewcedarî fêmkirineke kûr a çanda xwecihî û tekûzîyke rastîn di navbera çareserîyên cîhanî û pêdivîyên civakên xwecihî de ye.

**Beşa Heftem**

**Qirêjîya ba (sedem, bandor û çareserî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê):**

Qirêjîya ba yek ji şêweyên qirêjîya jîngehî yên metirsîdar e, çimkî bandoreke wê ya yekser li ser tendurisîya mirovan, qelsbûna qelpaxa riwekî û zêdebûna nederketina germê heye. Ji ber bipêşketina pîşeyî ya nebirêkûpêk, bikaranîna zêde ya ardûyên sûtemenî û lawazîya siyaseta jîngehî li dewletên nepêşketî û cihên şer û nakokîyê, ev diyarde di salên borî de zêde bûye. Di vê derbarê de li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê sedema vê diyardeyê ev faktorên han in: şewtandina bêserûber a çopê, xwesipartina li sûtemenîyên ku kiwalîteya wan ne baş e û zêdebûna çalakîyên çandinîyê yên nebirêxistinkirî.

**Yekem- Sedemên qirêjîya ba:**

1. Şewtandina çopê li derve: Ji ber ku stasyonên çareserkirinê tune ne, bi rêya şewtandinê çop tê tunekirin, di encamê de gazên bijehir ên mîna dyoksîn û formaldîhayd çêdibin û belav dibin.

2. Alvên veguhestinê yên kevin û jihevketî: Ew gelek ardû xerç dikin û rêjeyên bilind ên yekem oksîda kerbûnê ji wan tê der.

3. Bikaranîna ardîşan: Ji ber qutbûna kehrebeya domdar, malbat û dikan xwe dispêrin ardîşên ku li ser mazot û benzînê dixebitin, di encamê de ba qirê dibe.

4. Çalakîyên pîşeyî û çandinî yên nebirêxistinkirî: Her wekî şewtandina paşmayên dexlûdanan, bikaranîna derman û peynên kîmawî û pîşesazîyên biçûk ên ku komir an jî madeyên betrolê bêyî parzûnan bi kar tînin.

**Duyem- Encamên qirêjîya ba:**

Ji alîyê tunduristî ve: Rewşên rebû, kulbûna pişikê û nexweşyên bêndanê zêde dibin, nexasim di nav zaro û temenmezinan de.

Ji alîyê jîngehî ve: Baranên tirşî dibare û cihêrengîya byolojî kêm dibe.

Ji aîyê aborî ve: Hilberîna çandinîyê kêm dibe, hin nexweşî belav dibin ku lêçûna çareserîya wan pir bilind e.

**Sêyem- Siyaset û rêkarên cîhanî ji bo çareserkirina qirêjîya ba:**

1. Bikaranîna enerjîya paqij: Her wekî enerjîya rojê û siwareyên kehrebeyî.

2. Zagonên dijwar li hember jêderên derketina qirêjîyê: Ew jî bi rêya zagonên jîngehî yên dijwar û çavdêrîya dorveger a kargehan.

3. Sîstemên veguhestê yên giştî: Ji bo kêmkirina bikaranîna siwareyên taybet.

4. Çandina daran li bajaran: Ji bo başkirina ba li bajaran.

**Çarem- Pêşinyar û çareserîyên guncav ji bo Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê:**

1. Bi rêya piştgirîya hikûmetî û ya navxweyî, projeyên biçûk ên enerjîya rojê ji bo malbatan werin destpêkirin.

2. Tora veguhesta giştî ji nû ve were aktîvkirin da ku bikaranîna siwareyên taybet kêm bibe.

3. Rawestandina şewtandina çopê û li şûna wê çop ji nû ve werin bikaranîn û peyna xwezayî were bikaranîn.

4. Kemerên kesk li dor bajar û gundan werin çandin.

5. Gaza malê bi nirxekî arzan were peydakirin û pişta wê were girtin.

6. Milet were handan da ku li şûna êzing û bilastîkan, sobeyên gaz û kehrebeyê bi kar bînin.

7. Hêdî hêdî bernameyek ji bo şopandina gazên bijehir were destpêkirin û siwareyên bi kêrî jîngehê tên û yên nayên ji hev werin cudakirin, bi kêmanî li ser asta komîn an şareserîyan ev proje dest pê bikin.

8. Li şûna ardûya ku tê bikaranîn, hin cûreyên ku qirêjîya wan kêmtir e, werin bikaranîn, her wekî benzîn û gazê).

9. Veguhestina giştî yan jî ya hevbeş were handan û bikaranîna siwareyên taybet li bajaran were kêmkirin.

10. Parzûya bi navê ``Catalytic Converter) were bikaranîn, nemaze ji bo siwareyên ku li sazîyên fermî û yên xizmetguzarîyên tên bikaranîn.

**Ji bo ardîşên kehrebeyê:**

- Gerek e xwedîyên ardîşan neçar bibin da ku filterên dû daynin da ku dûyê qirêj kêm bibe.

- Gerek e welatî û xwedîyên dikanan werin handan da ku berê xwe bidin enerjîya rojê; ew jî bi rêya piştgîyeke ne giştî (lojistîk an perepêdan) ji bo projeyên takekesî yan jî komî.

- Seetên pêxistina ardîşan li taxan werin birêxistinkirin da ku dûyên qirêj û bijehir werin kêmkirin.

**Ji bo xak û tozê:**

- Gerek e projeyên çandina daran li bajar û dergehên sereke werin destpêkirin, her wekî çandina darên ku xwe li ber zuhayîyê digirin (Kîna, selv, akasya, dara sîwan) werin çandin da ku xak were xurtkirin.

- Gerek e rêyên hundirîn ên neqîrkirî werin başkirin da ku toza di encama çûn û hatinê de derdikeve, were kêmkirin.

- Gerek e qelpaxeke axî li ser deverên tên avakirin ên neçalak were sepandin an jî bi rêya hevkarîya bi şaredarîyan re, deverên kolayî û bitoz werin nixumandin.

**Beşa Heştem:**

**Girêdana ``girtina rê li ber qirêjîyê`` bi veberhênan û bazirganîyê ve- ber bi nimûneyeke jîngehî ya geşpêdayî ve:**

Divê ne tenê mirov xwe bispêrin perepêdana hikûmet û rêxistinên naveteweyî ji bo çareserkirina kêşeya qirêjîyê lê belê gerek e beşa taybet û veberhênanan xwecihî û biyanî jî beşdarî avakirina sîstemeke geşepêdanî ya hevala jîngehê werin kirin. Di vê beşê de em bidin diyarkirin bê çawa em dikarin astengîyên

jîngehî bixin derfetên veberhênanê ku pê re kar, qezecên madî û parastina jîngehê werin peydakirin.

**Yekem- Derfetên veberhênanê di biwarê girtina rê li ber qirêjîyê:**

1. Vekirina kargehên biçûk ên ji nû ve bikaranîna bilastîk û kanzayan. Ev yek derfetên kar peyda dike û qirêjîyê kêm dike.

2. Projeyên enerjîya roj û ba: Ev projene xwecihî ne da ku kehrebeyê bi nirxekî arzantir û domdar peyda bikin.

3. Zêdekirina çandinîya byolojî bêyî bikaranîna madeyên kîmawî û firotina berhemên çandinîyê di bin navê ``berhemên hevalên jîngehê`` de.

4. Navendên çareserkirina çopên bijîşkî û pîşesazî bi rêya hevkarîya di navbera şaredarî û beşên taybet de.

5. Geştîyarîya jîngehî (Eco-Tourism) ku jîngeha gundewarî û xwezayê ji bo kişandina geştîyaran bi kar tîne û herêmên dûrî bajaran werin geşkirin

**Duyem- Hin nimûneyên naveteweyî yên serkeftî yên ku veberhênan bi jîngehê ve girêdane:**

Hindistan: Pişta projeyên biçûk ên hilberandina enerjîya rojê li gundan girt û bi hezarên karan ji bo karkeran peyda kir.

Elmanîya: Xwe sipartîye sîstema ``nirx li hember kerbonê``. Her ku beşgeh dûyên xwe yên bijehir û qirêj kêm dikin, wan xelat dike.

Mexrib: Bajarê ``Nûr`` ê enerjîya rojê weke projeyeke veberhênanê ya jîngehî ya mezin ava kir.

**Sêyem- Hin qewîtîyên kirdarî:**

1. Gerek e hin siyasetên handanî ji bo veberhênerên beşên jîngehî werin danîn; her wekî nestandina bacan û dana qerzên biçûk ji bo wan.

2. Gerek e desteyeke hikûmî yan xwecihî ji bo jîngeh û veberhênana kesk were damezirandin.

3. Gerek e pîvanên jîngehî ji bo dana rêdanan ji bo projeyên bazirganî û pîşesazî werin danîn.

4. Gerek e fêrkirina pîşeyî bi pêdivîyên bazara kar di aborîya kesk de were girêdan.

5. Gerek e destpêşxerîyên ciwanan di biwarê afrînerîyên jîngehî de werin handan.

Çênabe ku stratejîya bikêr a girtina rê li ber qirêjîyê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê di çarçoveya xebatên hikûmetê yan jî piştgirîya rêxistinên mirovî de bimîne lê belê gerek e li ser bingeheke hevbeş were avakirin ku veberhênan, bazirganî û civaka sivîl jî bihewîne. Ev yek dê derî li hember nimûneyeke hevgirtî veke ku geşepêdana aborî û domdar û jîngehî bihewîne.

**Puxte:**

Ev lêkolîn alîkarîyeke zanistî ye da ku tecrubeyên cîhanî yên serkeftî bi awayekî kûrtir werin fêmkirin û rêbazên sûdwergirtina xwecihî ji van tecrubeyan werin diyarkirin.

Di demekê de ku hin nimûne di dema niha de zehmet e werin pêkanîn, avêtine gavan bi awayekî hêdî hêdî, guncavbûna xwecihî û vîna civakî dikarin rêyeke rastî li hember jîngeheke baştir û domtir li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê vekin.

## Jêder:


- البنك الدولي. (2019). برنامج إدارة التلوّث والصحة البيئية: تقرير التقدم. تم الاسترجاع من

https://www.worldbank.org/

- برنامج الأمم المتحدة للبيئة. (2021). التصالح مع الطبيعة: مخطط علمي لمعالجة أزمات المناخ والتنوع البيولوجي والتلوّث. تم الاسترجاع من

https://www.unep.org/resources

- (2020). تقرير التنمية المستدامة. كامبريدج: مطبعة جامعة كامبريدج.
- (2020). الحوكمة البيئية في الدول الهشة: حالة سوريا. مجلة الشرق الأوسط، 74(4) 521–540.
- مركز الاستهلاك والإنتاج المستدام في البحر المتوسط. (2022). خطة العمل الإقليمية للتنمية المستدامة في دول البحر المتوسط وتقدم تنفيذها. برنامج الأمم المتحدة للبيئة – خطة عمل البحر المتوسط.
- برنامج الأمم المتحدة للبيئة (UNEP). (2022). Environmental Governance in Syria: Challenges and Opportunities
- اليونسكو. (2021). Traditional Knowledge and Sustainable Practices in the Levant.
- منظمة الصحة العالمية (WHO). (2023). Ambient Air Pollution and Health in Conflict Zones.
- الجمعية البيئية السورية. (2020). تقرير عن النفايات في الريف السوري: الواقع والمأمول
- منظمة التعاون الاقتصادي والتنمية. (2020). توقعات السياسات البيئية. باريس: منشورات منظمة التعاون والتنمية الاقتصادية.

https://www.oecd.org/environment

- وانغ، ي.، هونغ، ي.، وتشانغ، ش. (2020). تطبيق الذكاء الاصطناعي في إدارة التلوّث البيئي. مجلة الإنتاج الأنظف- 252- 119720.
- الوكالة الأوروبية للبيئة. (2022). الاقتصاد الدائري في أوروبا: تطوير قاعدة المعرفة. تم الاسترجاع من

https://www.eea.europa.eu/